

NÜDEM

No 23 1997



Kovara Huneri, Edebi ü Çandı

SAL 1

YEQSEMB

HEJMAR 1

15 GULAN 1932

HAWAR

Qomela Qirdî * REVUE KURDE

HAWAR DERDIKEVE!

Dî dèmeke kurt de wê hemû hejmaren HAWARê bi awayekî ji çayan
re bas, bi çapeke pedagojik, bi kaxezên spelî, bi cildeke mina
pirtûkeke piroz û bi form û ebada Nûdemê di nava Weşanê Nûdemê
de derkeve.

Ev cilda HAWARê ku ji 57 hejmaran pêk hatiye û li dor 1000 rûpelî ye,
rûpelekî gîring yê diroka ziman û edebiyata me ye. Bêî xwendin û zanîna
HAWARê, wê her tûm kêmasiyek di zanîna te ya ziman û cedebiyata kurdî
de hebe; lewma xwe ji xwendina HAWARê bêpar mehêle!

Pistî derketina HAWARê em ê li Stockholm, Uppsala, Kopenhagen,
Oslo, Bruksel, Paris, Köln, Hamburg û hin bajarên din turneyên civînan
çêbikin û HAWARê bigihînin desten xwendevanen kurd.

Tu ji vê mizgîniyê bigihîne hevalê/hevala xwe û li benda derketina
HAWARê be!

SAL 11

HEJMER 57

YEKSEMB

15 TEBAX 1943

HAWAR

KOVARA KURDI * REVUE KURDE

ANNÉE 11

NUMERO 57

DIMANCHE

15 AOUT 1943

NÜDEM

Kovara huneri, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

Firat Cewerî



Hejmar 23, sal 6

Payîz: 1997



Şerdên abonetiyê (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya 280 Sek

Ewrûpa 80 DM

Amerika, Australia,

Kanada: 50 \$

Institution 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê: Serhad Bapîr

Çapa bergê:

Jakobsbergs Tryckeri AB



Pergala bergê û rûpelan:

Nüdem



Adres: NÜDEM

Termov. 52 2tr.

176 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

- | | |
|-----|--|
| 4 | Nameyên xwendevanan ♦ FIRAT CEWERÎ |
| 6 | Yılmaz Güney ♦ MAHMÛD BAKSÎ |
| 12 | Şilrek ji ♦ ROJEN BARNAS |
| 13 | Ez rebena te me ♦ DR. CUWAN BATÛ |
| 19 | Ma tu dikarî kitêbekê bixwînî? ♦ |
| | ARTUR LUNDKVIST Werger: ZINARÊ XAMO |
| 30 | Pascal û Descartes ♦ FAWAZ HUSÊN |
| 35 | Ji bo Evdalê Zeynikê ♦ VEYSEL ÇAMILIBEL |
| 36 | Ronî mina evinê... ♦ MEHMED UZUN |
| 50 | Kurd di weşanên Poloni de ♦ |
| | MARIA PARADOWSKA Werger: SIDQÎ HIRORÎ |
| 58 | Gula Mehabadê ♦ ADIL DURAN |
| 59 | Cesaret ♦ SÜLEYMAN DEMİR |
| 67 | Hunera xwendinê ♦ OLOF LAGERCRANTZ Werger: F. CEWERÎ |
| 70 | Tayek nane ♦ FATİH EL-MUDDARIS Werger: SERDAR ROŞAN |
| 76 | Çend şîr ji ♦ XEBAT ARIF |
| 79 | Edebiyat û jîngeha wê ♦ |
| | BORIS EJCHENBUM Werger: M. DEHSIWAR |
| 82 | Hevpeyvin bi Kendal re ♦ Nüdem |
| 89 | Hewl, beş: 2 ♦ XEMGİN TEMÊ |
| 95 | Xebata sivil ♦ ŞEREFXAN CİZİRÎ |
| 100 | Devjenkek bi Melayê Cizîri re ♦ LALEŞ QASO |
| 103 | Hêsankirina alfabeyê ♦ CELADET ÇELİKER |
| 114 | Bersiva Çeliker ♦ ARIF ZÈREVAN |
| 116 | Hevpeyvin bi A. Aras re ♦ MUSTAFA ALADAG |
| 126 | Çend şîr ji ♦ FERİT EDGÜ Werger: ABİDİN AZAD |
| 128 | Wendakirina şevekê ♦ ŞAHİNË BEKİRË SOREKLÎ |
| 132 | Du şîr ji ♦ SABAH KARA |
| 134 | Çend şîr ji ♦ FERHAD SHAKELY |
| 138 | Hunera Serhad Bapîr ♦ KOSTAS LAXAS |
| 141 | Bi Serhad Bapîr re hevpeyvin ♦ Nüdem |

Nameyên xwendevanan



FIRAT CEWERÎ

Her nameyek ruhek e. Ew kopyayeke wilo ji dil ya dengê hezkiran e, ku rubêñ hisdar wê mina xezîneke evînê ya herî bi qîmet dibin.

Honoré de Balzac

Xwendevanê delal, ger were bîra we, me di destpêka weşana kovara Nûdemê de gotibû ku em ê carinan cih bidin nameyên xwendevanan. Lê me soza xwe bi cih neanî û me heta niha kêm nameyên xwendevanan weşandine. Ji ber pîrbûna nameyên we û ji ber nebûna cih, em heta niha di aliyê weşandina nameyan de bêdeng mane. Lê me bi alîkarî û piştgiriya nameyên we, dengê xwe bilind kiriye; xweşî û dilsoziya naveroka nameyên we di berdewarîya xebata me de roleke mezin û berbiçav listiye. Gotinêñ we yêñ xweş dilê me şâ kiriye, pêşniyazên we em xistine ser riyek rasttir. Me hertim guh daye nameyên we, me gotinêñ we ji xwe re cidî girtine. Ji her derê, ji her kategoriyê, ji her temenî ji me re name têñ. Hin name ji girtîgehêñ Tirkîyeyê têñ; ji girtiyêñ xurt, bi bawerî û bi hêvî... Nameyên ku ji girtîgehan têñ ji dil in, gotinêñ neqane û xemilandî ne; ji nava rêzên wan evîn û hêvî difûre. Em bi wan nameyan re dijîn, em bi gardiyanan re pev diçin, em dikevin grevîn birçibûnan, em di hundur de bi girtiyan re volta davêjin, planêñ pêşerojê û jiyanek xweş çedikin. Hin name ji Wanê têñ, hin ji Mûşê, hin ji Diyarbekirê, hin ji Mêrdînê, hin ji Batmanê... Nameyên

wan germ in, bêhna welêt, bêhna xwezayê, bêhna têkoşin û berxwedanê ji nameyên wan tê. Em carinan bi nameyên wan re ditirsin, hêrs dibil, ji ber leşker û polisan baz didin; carinan em dibil zarok, em hemêza xwe tije kevir dikan û bi gir didin dû cemseyên leşker û polisan. Em carinan dibil dayik, hêşiran li ser kezebêñ xwe dibarînin, carinan em li ser tabûtên keç û xorêtê berzewac dilisînin. Hin name ji me re ji xwendevanêñ unîversiteyan têñ, em ji wan fêri termînolojiyêñ siyasi û felsefi dibil, em di quncikêñ unîversiteyan de bi germî minaqeşe dikan. Hin name ji rewşenbiran têñ, em ji tecrubeyêñ wan dibil xweditecrube, em bi pêşniyazêñ wan asoya xwe ya fîkrê firehitir dikan. Hin name ji xwendevanêñ binxetê têñ, ew me dixin dîlana stêrkêñ li ezmanê welêt yê sayî û me li ber bayê hênik hêdî hêdî dihejînin... Ü em di nameyên kurdêñ koçber de bi hîsa bêrikirina welêt dihelin.

Nameyên we hêvî, evîn û baweriyê didin me.

Herçiqas me heta niha nameyên we neweşandibin jî, bawer bikin, ji bo liserlingan-mayîna me, ji bo temendirêjiya Nûdemê, nameyên we yên dilsoz kiriye ku xwendevanêñ kurd bibin xwediyyê kovareke berdewam û pirtûkxaneya kurdi bibe xwediyyê bi dehan pirtûkêñ kurdi. Ü bi alîkariya nameyên we, çirûskêñ hêviyên veşartî ji me ve xuya dibil, daxwaza pak ya ji hemû xerabî û kirêtiyan şuştî, dibe sloganâ me. Em bi alîkariya we, dengê sloganâ daxwaza gihîştina armancê û serfiraziyê bilinditir dikan. Daxwaz, ziman û edebiyata kurdi ye, armanc, gihîştina wê ye; daxwaza gihîştina armancê, ji bo me serfiraziyek e; serfiraziya hisî, mirovî û rûmetê ye.

Loma, em gelekî qîmetê didin nameyên we. Hûn jî me bê name nehêlin, ji me re binivîsin, ji kurdîya xwe metîrsin, bila cesareta nivîsandina zarê kurdi li ba we bigihîje qonaxa herî bilind ya cesaretê. Di gelek nameyan de cewherêñ gelekî mezin hene; zimanekî xurt, fantaziyeke bêsînor heye. Hêviya me ew e ku xwediyyêñ nameyên wilo û xwediyyêñ her celeb name, xwe mîna xwediyyêñ Nûdemê bibînin; çawa serfiraziya Nûdemê dibe serfiraziya wan, divê, ew li ber kêmâniyêñ Nûdemê jî bikevin. Ji ber ku, xwendevanêñ kurd hêjayî kovar û pirtûkêñ bi kalîte ne. Divê, hûn, xwendevanêñ dilonan, qîma xwe bi Nûdemekê qels û bêkêr neynin, hûn Nûdemekê dewlemed, bi pîvanêñ kovarvaniya navneteweyî ji me bixwazin. Hûn nivîsêñ bi kalîte ji me bixwazin, zimanekî xweş û rewan ji me bixwazin, babetê balkêş bixwazin. Ji bo Nûdemekê wi-lo, çavêñ me li riya nameyên bêtir, pêşniyazêñ zêdetir û piştgiriyeke xurttir e.

Ji bîr mekin, Nûdem ya we ye jî!... ↗

Yılmaz Güney: "Bifikirin, neteweyek nikare bi zimanê xwe bipeyive"

Hevpeyvîn: **MAHMÛD BAKSÎ**



Mahmûd Baksî ev hevpeyvîna ha berî mirina Yılmaz Güney bi kurtedemekê bi Yılmaz Güney re çêkîribû. Taybetiya vê hevpeyvînê ew e ku kurdbûna Yılmaz Güney derdikeve hólê. Ne bi tenê ew jî, di vê hevpeyvînê de nérîna Yılmaz Güney ya li ser pêşeroja kurd û Kurdistanê jî vekirî tê dîtin. Ji ber girîngiya hevpeyvînê û bi hinceta bîranîna sêzdehsaliya wefata Yılmaz Güney, Mahmûd Baksî ev hevpeyvîn bi tirkî gîhande me. Em jî kurdiya wê pêşkêşî we dikin.

M. Baksî: Tu dikarı xwe bi kurtî bidî naskirin?

Y. Güney: Navê min yê rastî Yılmaz Pütürün e. Bavê min zazayekî ji gündê Siwêregê ye. Diya min jî kurdeke Mûşê ji eşîra Cibrana ye. Ez di dema seferberiyê de, ji van herdu mirovên ku celî bûbûn, hatime dinyayê.

Di dema zarokî û xortaniya min de li mala me bi zazakî û kurmancî dihate peyivandin. Lê di warê neteweyî de zanebûneke min ya siyasi tunebû. Her ku zanebûna min ya siyasi ges bû, min bêtir rastiya xwe û ya welarê xwe nas kir. Dibistana ku ez diçûmê, ji me re digotin: "Hûn tirk in". Em li gorî îdeolojiya dewletê ya resmî dihatin perwerdekirin. Min di sala 1955'an de li Edenê lise xelas kir. Hingî ez ji

bo çirokeke xwe di bin çav de bûm. Polîsan her tim ez taqîb dikirim. Wan digotin, ku min di çiroka xwe de propogandaya komünîzmê kiriye.

Ez di sala 1960'ı de hatim girtin. Pişti bi du salan ez hatim berdan. Wê demê min di filmên lêxistin, bi heyecan û bi karekterên populîst de dileyist.

Pişti sala 1970'ê, yanî pişti ku ez ji eskeriyê vege riyam, min hin guhertin di xwe de kirin. Diviya bû min guhertin bikirana. Ji ber ku min eskeriya xwe li Mûşê kiribû, ez dîsan bi gelê kurd re bûbûm yek, min derd û kulên wan ji nêzîk ve nas kir, loma jî vê yeka han tesîreke ecêb li min kir.

Wek tê zanîn, ez di sala 1972'an de her di girtîgehê de bûm.

– *Li ser hev tu çend salan girtî ma?*

– Ez li ser hev donzdeh salan raza me.

– *Pişti ku tu hatî berdan, te filmên girîng mîna Arkadaş û Endîse çêkirin. Tu di derhega vê demê de dikarî çi bîbêjî?*

– Ez bi “efû”yê ji girtîgeha Selîmiyeyê hatime berdan. Sal 1974 bû... Min di serê xwe de şes çirok çêkiribûn. Yek ji çirokên min di derheqa jiyana rewşenbîrekî de bû, rewşenbîrekî ku sinifa xwe guhertibû û ji xwe re jiyana burjûvazî pejirandibû.

– *Çirok yên te bûn?*

– Erê, hemû çirok yên min bûn. Di filmê Endîse de esil min xwest ez jiyana kur-dên belengaz, yên gundî ku ji bo pemboçinîyê hatibûn Edenê, bînim ziman. Lîstikvanên min hemû kurd bûn. Lê dû re, wekî tê zanîn komployek li serê min çêkirin. Kuştina hakimekî xistin stûyê min. Ji ber wê yekê 19 sal ceze dane min.

– *Te filmê Yol çawan çêkir?*

– Min senaryoya wê li girtîgehê nivîsand. Min xwest ez bi heftekî panorama-yeke Tirkîyeyê û Kurdistanê xêz bikim. Çêkirina vî filmî ji yên din cûda bû. Ez ji serpêhatiyên rast bi rê ketim. Di aliyê finansekirina film de, min û şirketa Kaktus ya film ya swîsrî finanse kir. Tu bêjî nebêjî di vê xebatê de gelek zehmetî derketin pêşıya me. Lê yek ji van jî ne zehmetiyên ku mirov nikarîbû zora wan bibira bûn. Pir mirov dikarin wilo bifîkirin: Di bin sazûmaneke leşkerî ya faşîst de, mirov çawan dikare filmekî wilo çêbike? Pişti ku filmekî wilo çêbibe, tê wê maneyê ku li Tirkîyeyê hindik be jî azadî heye. Lê ez dikarim vê bibêjim, li Tirkîyeyê ji bin ve azadî tuneye.

– *Naveroka film?*

– Wek tê zanîn, filmê Yol behsa mirovên ku ji girtîgeha nîvvekirî diçine ûzinê, dike. Di vî filmî de sê hevalên kurd bi navê Mehmed Salih, Seyid Elî û Emer hene. Di vir de, Emer di zulmdariya li ser gelê kurd de roleke mezin dilîze. Seyid Elî ji di jiyana gundiyyêن kurd yên di karekteriya feodalî de, di rewşa jinan û di rewşa malbatê de roleke mezin dilîze. Mehmed Salih ji kêm zêde wilo ye.

Me bi filmê Yol, dîmena mirovên Tirkîyeyê û Kurdistanê û rewşa civakî raxiste ber çavan. Me rastî anî zimên. Lê pir kes li hemberî vê derketin. Nemaze di filmê Yol de, ji ber ku me navê Kurdistanê anîbû ziman, pir kes ji me hêrs bûbûn, nemaze hin kesen şoven dikira biteqiyana. Wan mohra xayintiyê ji li me xistin. Ji xwe ez her tim ji aliye bûrjûvazî de “xayîn” hatime flankirin. Ez ji vê yekê bi qasî misqalekî li ber xwe nakekîm û ez pê aciz ji nabim. Ger gelê min navê xayintiyê li dû min bixista wê çaxê ez ê gelekî li ber xwe biketama. Lê îro ez dibînim ku xelkê min li min xwedî derdikeye, xelkê min ez hemêz kirime. Ji xwe wê bûrjûvazî êrişan bîne ser min. Bi ya min ev ji tiştekî normal e.

– *Film dixwaze di derheqa gelê kurd de çi bibêje û çi nişan bide?*

– Ev filmê han beşek ji dîroka gelê kurd ya jibîrbûyî zelal dike. Ji ber ku hebûna gelê kurd hatiye înkarkirin, ziman û çanda wî hatiye qedexekirin. Di filmê Yol de, ya herî berbiçav me hebûna Kurdistanâ bindest raxiste ber çavan. Ji xwe tu niyeta me ya ku em ji xelkê kurd re bêjin: “Binêr, tu tê pelçiqandin, tu bindest î” tuneye. Ew ji xwe bindest e, ew vê yeka han her roj dibîne û dijî.

– *Weke hunermendekî kurd li sîrgûnê, tu dikarî bi çi awayî ji têkoşîna gelê kurd re bibî piştgir û alîkar?*

– Hem di warê hunermendî de, hem ji di warê siyasi de mirov dikare pir tiştan bike. Rastiya ku gelê kurd tê de dijî dikare bête raxistin. Mirov dikare berxwedan û têkoşîna gelê kurd bi gelên din bide naskirin. Lê ev ji dem jê re divê. Yê min baweriya min bi pêşerojê heye.

– *Gelo tu qet li çêkirina filmêni kurdî difikiri?*

– Ez li filmekî ku hem bikaribe dîroka têkoşîna gelê kurd bide, hem ji bikaribe wê têkoşînê bide fêhmkirin, fikirîme. Ez ê filmekî wilo çêbikim. Lê mixabin, hem haziriya filmekî wilo, hem ji çêkirina wî wê derneke dirêj bikişîne. Lê bi serketina xwe bawer im. Adeteke min heye, heyâ ez dest bi tiştekî nekim, ez zêde li ser napeyivim.



– Ez dixwazim bi taybetî li ser metodeke te ya balkêş ku di derheqa jinan de ye, pirsêkê bikim. Jineke listikvan, hema hema bê ku bipeyive dikare filmekî bibe seri. Gelo tu dikarî di vê derheqê de tişteki bibêji?

– Sînema di esasê xwe de hereket e. Di tiyatroyê de mirov bêtir bi diyalogan pirsê berpêş dike. Lê di sînemayê de bêtir hereket, nêrin û wêne girîng in. Ev jî taybîyeke teknîka sînemayê ye. Ger mirov di sînemayê de rû xweş bi kar bîne, mirov dikare rûpelek diyalog bi wêneyekî bide.

– *Lê tipêñ jinêñ bindest?*

– Ew li ber çavan in. Ji ber ku bi taybetî li Kurdistanê rewşa jinan gelekî vekirî ye. Jin li Kurdistanê di bin du zulman de ne. Ev stemkarî hem feodalî ne, hem jî neserbixwebûna jinê ya aborî ye. Azadiya jinan bi azadiya neteweya wan ve û bi azadiya sinifa wan ve girêdayî ye.

– *Gava te bi filmê Yol xelata Cannes ya yekemîn girt, te xwe bi weşana dînyayê wek rejisorek û hunermendekî kurd da naskirin. Ci bû ya ku tu ajot ser vê? Sebeb ci bû?*

– Divê mirov koka xwe ya neteweyî înkâr neke, divê mirov lê xwedî derkeve. Ger ez ne kurd bûma jî, ez ê dîsan dijî zilma li ser gelê kurd rawestiyama. Min ê ew yeka han ji xwe re berpirsiyariyek bizanîba. Ger tenê mirov bi vî aliyê meselê jî lê binihêre, mirov ê bibîne ku bi rastî gelê kurd di bin zor û zilmeke dijwar de ye. Bi-fikirin, neteweyek nikare bi zimanê xwe bipeyive, bi zimanê xwe bistirê... Ji bo her berxwedanên biçûk, cezayêن gelek mezîn têr dayin. Wek mînak, niha di girtîge-hêne Tirkîyeyê de bi bîst hezaran têkoşerên kurd, bi bîs hezaran demokrat û şoresh-gerên kurd radizên. Lê li Tirkîyeyê demokrasî bi pirsa kurdî ve girêdayî ye. Divê gelekî vekirî li ser vê pirsa han bête peyivandin. Ji ber ku cûntaya 12'ê ilonê ne bi tenê ji bo rawestandina têkoşîna şoresher û demokratên tirkan, herweha ji bo ku ew neteweya kurd hê bêtir bipelçiqînin, hê bêtir di bin destê xwe de bihêlin, hatin seri.

– *Gelek hunermendênu ku bi eslê xwe kurd in -nemaze ew hunermendênu ku di nav-neteweyî de hatine naskirin- ji bo karyer û menfeeta xwe kurdîtiya xwe înkâr dikan. Lê te neda ser riya wan, çima?*

– Yê min ez kurd im û ez kurdbûyina xwe jî li her derê dibêjim. Jê wê de jî ji bo ku mirov bi rewşa miletê kurd, bi stemkariya li ser kurdan bizanibe, ne hewce ye ku mirov pirrzan be, an jî falvekir be. Ev rastiyekê gelekî vekirî ye. Weke hemû ge-

lên dinyayê, wê gelê kurd ji têkoşîna xwe ya neteweyî bide û rizgariya neteweyî ji mafê wî ye. Yanî wê her gel qedera xwe bi xwe tayin bike. Ya ku ez herî baweriya xwe pê tînim, gelê min bi xwe ye.

– *Li Kurdistanê hisyarbûneke bêdeng, agirekî gurr yê berxwedanê heye. Tu pêse-roja vî agirê gurr yê hisyarbûn û berxwedanê çawan dibîni?*

– Gava ez li ser pirsa Kurdistanê radiwestim, ez ne bi tenê pirsa Kurdistana kolonî ya beşê Tirkiyeyê digirim dest. Ez perçeyê Tirkiyeyê bi yên din re yek digirim. Li gorî nêrîna min di şoreşa rohilata navîn de, Kurdistan xaleke girîng e; ew dikare ji vê şoreşê re bibe bingeh. Ji ber stemkariya neteweyî û sinifi, ku li ser gelê Kurdistanê dibe, dikare di şoreşa pêşerojê ya rohilata navîn de bibe agirê herî gurr. Ez dikarim vê bibêjim; di eslê xwe de tu gel bi qeyd û merbendêni di ling û stûyên xwe de ne razî ye. Û nemaze gelê kurd... Gelê kurd, ku bi rastî ewqasî qîmer dide şeref û rûmetê, qet bi van zincirêni di stû-yê xwe de ne razî ye. Pirsa herî girîng zanebûn e. Divê zanebûna siyasi û neteweyî bigihîje her cih û quncikêni Kurdistanê. Ji ber ku îdeolojiya serdest hebûna neteweya kurd înakar dike.

– *Tu Kurdistaneneke çawan dixwazî?*

– Ez Kurdistaneneke yekgirtî, serbixwe û demokratîk dixwazim. Kurdistaneneke ku hedefa wê sosyalîzm be.

– *Tu bawer dikî ku wê Kurdistaneneke wilo çêbibe?*

– Erê, ez ji sedî sed bawer dikim ku wê Kurdistaneneke wilo ava bibe. □



Wer' em herin Mala-Badê

Wer' em herne Mala-Badê li bestê
Besta li hafa çem e
Çem şîpane diherike, bi lez tê
B'xurin û lemelem e
Ezê b'te re bigihîjim mebestê
Aza bim j'derd û xem e

Wer' em herne Mala-Badê, bi pir e
Lenger di nava avê
Zeman nase bi lez tê û dibhure
Jiyê me jî di navê
Roj bilind bû li rojava dizvire
Dighure berê tavê

Wer' em herne Mala-Badê, xweş war e
Warê Badê Dostik e
Bi teht û ferş, bi navrast û bi dar e
Kersaxa çem ristik e
Wer' em herne hê l'me nebye êvar e
Dest bi dest li nik te.

ROJEN BARNAS

Ez rebena te me

Dr. CUWAN BATÜ

T'u, pisîka sorbelek, pîrt bi qirrêj û gemar; kêç û şej, çîma bela xwe ji van mişref; rez û pez û dewara ye... Tu caran şîr, mast û goşt ji ber deriyê wî kêm nabe! Tu çîma welê hov û neqencî; bê insaftî ku tu berê xwe ji wan xweşîyan diguherî û bi van mişkên reben û bêwec (zeif) ve mijûl dibî? Ma tu fedî nakî ku çavêن xwe ber-didî lingokên wan yên mîna çiqilê dara behîvê- welê zirav û zeifok... Rast e, ku xwudanê te, te xwedî dike ji bo zarokên malê û herweha jî ji bo van belengazên mişkan, lê belê va ye tu bixwe dibînî ku tiştek ji te kêm nîne heyâ ku tu pêwistî wan rebenokan bibî. Ci tiştekî xweş hebe para te tê de ye û roj bi roj jî qelew dibî. Gelo ma ji bo ci tu dev ji van bêmeferên mişkan bernadî?

Erê, pisîka hov, kuştek û çavşor! Tu ji sibehê heyâ êvarî li ber qulkoka wan dissekinî û li benda "xwejibîrkirina" wayî, da ku ew derkevin û tu bi pencêن xwe yên gemar bi qirrika wan bigirî û kulafkên xwe di kezeba wan de bikî xwarê...

Erê, ez bi te xweş dizanîm, pisîka bê insaf û bê wijdan!

Lê belê, mişka di qulkoka di ber tifîkê (ocaxê) de! Tu çîma welê bê hiş û jar î? Tu dibî reben û bê mefer di lepêن vê çavşorê de! Tu dibî lehîstoka wê û ew bi te dilehizê... Ji ber ku va ye ji bê mejî û xwejibîrkirina te, tu ji qulê derketî û ketî nava kulafkên wê!... Ne te berdide- serbest û azad biçî qulkoka xwe û ne jî te dikuje da ku tu ji vê bindestî û neçariyê xelas bibî...

Bêguman tu xweş pê dizanî ku ew neyarê te yê binê çeng e! Û ew di domahîka vê "lehîstokê"- ya mîna kabûsê- wê bixwaze te bikuje û bêxe ber dinanêن xwe yên tûj - mîna sîxan, û biperçiqîne û di paşiyê de wê te daqurîne! Tu bi vê daxwaza wî xweş dizanî...

Ma wê welê bi dayik û kalebavê te nekir? Ma qêrr û hawar-hawarên bavê te ji bîra te çûne? Hê kûze-kûza pîredayika te li ber guhê te ye... Lê tu di bin van êş û eleman de ji xwe re weha diponijî:

"Hema vê carê ji ber lepêñ wî bifelitim, bi Xwedê tû caran ez xwe nadim dest! Bavê wî jî rab e destê wî ji min nagirê!". Lê belê, va ye wî tu avêti wê çolê - weke nîvmiriyan... Wî serê xwe daniye ser her dû lepêñ pêş, çavêñ xwe noqandiye - weke "hay ji te nebe"; laşê te bi gilîza devê wî şilo-pilo bûye... Va ye rîyek ji te re peyda bûye; dem ev dem e, roj ev roj e ku tu weke berika tifingê "bifîrî" û xwe bigihêni devê qolê...

Na! Mixabin çenabe, vê carê ji tu nikarî! Ji ber ku wî va ye carek din kulaflkêñ xwe di laşê te de bir û anî û carek din tu bêwec û zêfok kirî; qedemêñ te ji kar dañî... Wî tu êxistî devê xwe û ji xwe re weha ponijî: "Gelo ma ez wê daqurênim, yan na?", lê wî vê carê ji bo daqurandina te çax zû dît û tu avêti wê erdê - mîna kelaşê-ke bê rîh û can ...

Tevek derên te ji kulaflkêñ wî diare; janeke zor daye dilê te; dilê te dixelete; serê te dişê; hinavêñ te li hev dikevin û lingêñ te bi karûbarêñ xwe ranabin...

Lê, erê, lê dîsa jî mejiyê te weke berê û hê bêhtir dixebeit; dilê te mîna saetê lêdi-xe û ji xwe jî hêviya te ji ev her dû man e!

Ew li te dinêre û ji xwe re weha dibêjê: "Bi Xwedê tû xêr û berxêr di te de nemye. Ya qenc ew e ku te daqurênim, bes, bi rastî jî dilê min niha naçe te; zikê min têr e..." .

Pisîka çavşor dîsa çavêñ xwe dinoqîne û berdewama razana xwe ya "sere-sere" dike...

Rebenê mişkê! Tu newêri çavêñ xwe vekî- da ku bizanî ka ew ci dike; li ku ye; li te dinêre yan na; hişyar e yan jî razaye! Bes, tu dil û mejiyê xwe dikî yek û wê rîyâku mîna birûskê qutbikî- ku xwe bigihêni xanîkokê xwe- tînî ber çavê xwe... Rastî jî ew rî li te ne gelekî dûr dixweye! Dilê te bi lezahî lêdixe; mixê te (mejiyê te) hin bi hin bersiva dilê te dide û tu xweş pê dizanî ku çaxê ponijandina te ji binî nemye!! Divê di navbera saniyan de bîryara kuştin yan jî saxmayîna xwe bidî û va ye te ew bîryar jî wergirt û weke bazing (teyrê nêçirê) tu "firî" û te xwe gihande derê qule! Pisîka kuştek, mîna beledî xwe li pey te avêt, lêpêñ wî giha-negiha dûvê te, lê belê bê fêde ye. Ji ber ku va ye te xwe êxist bext û torê qula reş û tarî; kûr û bêbinî ... Tu xelasbûyi. Xanîkokê te kûr e û reş e; tarî, bêbinî, germ û nerm e; gelekî jî bi hemet e. Ew piştgir û hêviya parastin û jiyanâ te ye!...

Pisîka sorbelek! Tu îro pirr dilbikûl ... Te feleka xwe şâşkiriye... dinya li serê te

digere, çavêن te tû deran nabîne. Ji hêrsa xwaziya te di ber te de naçe xwarê...

Tu dîsa ji xwe re weha diponijî:

»Ez bi sedên caran poşman im!! Hawar e! Ezê çîma xeletiyek welê kerîfî bikim?? Ez sonda mezin dixwim ku vê heyfê li te ne hêlim!«

Heseno- minalê malê- salek û çend mehiye... ew bi kotevê rîve diçê ... xwedî kîrasê gulgulî û bi qirrêj e.. Bê derpê, bê sol û bê gore ye... serê wî bi meqesê hawirdorkî hatiye quisandin- xetên sipî li şûna wê quisandinê xweş lê dixweyin. Viçika wî, ji her du konkên pozê wî diherikê. Kenışta çavên wî hişk û zer e... der û dorana de- vê wî ji xwarinê, gemaşiyê gemar bûye... kirâsê wî jî, ji xwarin xwarinê, bixwe de ri- jandina wê û şîrînahiyê reş û tarî bûye...ji gemariyê çend gûlên ku li pesîra kirâsê wî hebûne, winda bûne... zendikên wî yêñ rast û çepê ji paqikkirina viçikê bûye we- ke depeke hişk û req...lingêñ wî terikî, reş û qirrêj in...

Pisîka bê mejî, va ye Heseno tu bê kar dîtî! Pisîka bê wijdan!, çawa ku pêşîyan gotine ku »Her dînsîzeñ îmansîzeñ xwe heye!« û welê jî ev Hesenokê bê merêz ji bo te »îmansîzeñ« e.

Heseno bi eyarê te girt, tu li ber singa xwe ve hilda- çermê laşê te di destê wî de mîna kîseke pembuyê giha hev. Te xwe di destê wî de »mirand« da ku ew dev ji te berde, te gelekê nêşîne. Bes, ew te bernade. Laşê te diêse û tu ji ber jana laşê xwe dengekî belengazî, bêwecî ji xwe tînî... Lê, bi serê te ev jî bê fêde ye... Ji ber ku çaxê dilê wî bixwaze wê ew te berdê- ne dilê te bixwaze... Li aliyê din jî di mejiyê te de ew nêçîra ku te ji xemşarî ji destê xwe berdayî tê û diçê... Tu ji hêrsa dikî xwe bixwî. Û ji xwe re weha dibêjî: «Hema bi Xwedê ez dikarim gezekî welê şidayî li te bidim ku careke din tu welê bi serbestî nekarî bi min bilehîzî!». Lê Pisîka serî bi Heseno re kerî belayê tu nikarî gezan li wî bidî! Ji ber ku tu ji dayika wî ditîrsî! Tu xweş pê dizanî ku wê ew heyfa wê geza te bi dehêن caran ji kevilê te derêxe...

Heseno dibêje terp û te li erdê dixe; bi lingê xwe pêl ser û zikê te dike, piştre des- tê xwe dixê qirrika te- nefesa te teng dibê, lê tu hinekê xwe digirî... gelo ma heya kengî tu ê bikarî xwe welê bêdeng bigirî? Qey deqîqekê, piştre? Lê tu ji nişkê ve kulafkên xwe bi ser destkokên wî de digerênî û bi hêdîkayî di wan destêñ nazik û qirrêj de dikî xwar- wan hinekê dixerpişînî. Qêreke dijwar ji Heseno tê û ew te ber- dide. Vêre-vêre dayika wî pê ve digihê û pahînekê li te dixe- dilê te dibe hinareke tirş... Tu zû xwe ji wê navê dûrî dikî...

Miška birîndar...xwedî xem û xeyal! Va ye tu gihayî xanîkok û zarokên xwe yêñ çermesorik. Nûze-nûza wan ji keyf û birçîbûnê tê. Ji ber ku va ye ew careke din gihane xudanê xwe -dayika birîndar, bê hiş û bê mejî... Vêga dilê te hê bêhtir lêdi-

xê; nefesa te zû diçe û tê. Hinekî welê dimînî... can bi ser te de tê, tevek derên te dijene... tu xwe di ber çêlikêñ xwe de dirêj dikî û ew ji nemerdiyê nakin zû devêñ xwe digihînin guhanêñ te yên ku dilopekî şîr di wan de ji tirsê nemaye... Bi vî awa-yî demeke dirêj derbas dibe... tu ji hişê xwe dikevî û welê »bêcan» dimînî...

Mışka belengaz! Rewşa te iro hinekî ji do û pêr baştı e. Laşê te ne weke berê dijene. Vêga tu hinekî li rewşa xwe dinêri û keyfa te tê ku te ew kabûsiya mirinê derbas kiriye! Û ji xwe re weha dibêjî: »EZ sond dixwim ku ez tu caran ji vê qulê dernekevim!« Ji ber ku ji te re ev der xweş û baş e; parasger e... hemet e... Ma gelo çi bi te maye ku tu serê xwe bêxî belayê, bibî xwarin ji bo dijmin? Bala xwe didî çêlikêñ xwe- dibîni ku ew hê çermesorkin. Hê nikarin nanê şewitî û hişk ji bin selikê bidizin...; hê negihane ku biçin şîrê di sitilê de bileqînin ... ew hê pêwistî te ne...

Tu çend rojan xwe û wan bi nanê hişk û hola ku te bi dizî kişandî qukkokê pê diqedînin. Lê mixabin, ev nanê ha tu şîrî bi te re çenake ku çêlikêñ te têr bike. Divê hinek mastê di bin tebeqê de bileqînî, tam bikî; hinek gwîz û hejîran ji kewarê bi-kirrêni û bixwî da ku bikarî guhanêñ ji bo van çêlikêñ reben, çavnûbişkûri tişî şîr bikî... Lê, hê tırsa wî neyarê kuştek di ber çav û dilê te de ye... Û dîsa ji xwe re diponijî:

»Bi çi awayî mabe, divê ez ji vê qulê derkevim! Bes e ev koletî û bindestî!! Çima ewqas xweşî bi wî bimînin? Ma qey mafê min ji di nav van xwarin-vexvarinan de nîne? Çima welê ye? Gelo qey ez »kurê jinbabê me?« Ci tişte wî ji yê min bêhtir e? Çima ew bi serbestî destê xwe di nava odê de dihejîne, diçe û tê? Na!! Ez qet vê newekheviyê qebûl nakim!! Yan wê ez ji weke wî bim- bi serbest û bi azad ji xweşî- yên vê malê feyde bikim- mastê di bin tebeqê de; gwîz û hejîren di kowarê de; tû- yika ser mastê di bin selikê de; nanê di teşte de tam bikim; yan ji ez ji binî vê yekê qebûl nakim. Bi Xwedê ezê dinyayê xerab bikim!!!... Bes e ev bindestî! Çima çêlikêñ xwe hertim welê çermesorik bihêlim? Divê ew pirr bixwin û vexwin da ku ew ji bi »firrê« bikevin!....

Mışka nezan, bê mejî û ne xwedî soza xwe! Va ye, careke din te ew zorbûn û rewşa mirinahiya ku tu ketibûyê ji bîr kir! Va ye, careke din tu li karûbarêñ xwe yên berê divegerî- mîna bavûkalân! Ma te hê derseke xwe ji wan rewşen kabûsiyê negirtiye? Ma tu pê nizanî ku tu ê bibî weke »kêzê-mêzê hemu li wê rêzê!«. Lê, ci-qaşî ez ji te re bêjim tu guhê xwe nadî min! Wê tu weke xwe bikî. Guhê te ji bo van gotinêñ min xetimîne. Va ye bi salan û pê ve ye tu vî karî bi vî awayî dikî, lê te hê tiştek bi ser tiştekî ve neaniye! Hertim tu xwedî kuştek, neyar û zordesî. Hertim kevilê te dibe goşt bo wî! Ma hê te aqilekî xwe weke mirovan ji xwe re negirti-

ye? Ma hê tu pê nizanî ku vê rêya ku te pê girtî tu caran nagihê serî? Ma tu çima li rêyeke din nagerî? Bes, illeh »eynî tas û eynî hemam el!« Hema carekê yan tasê bi-guhere; yan jî hemamê û ger nebû- herduka!

Erê, mişka serhişk, bi sedên caran qeda bi vê serhişkiya te bikeve! Gelo ma tu zanî va ye ew neyarê berî çend rojan ku weke gokê bi te dilehîst hatiye »heyfa« xwe!... Ma tu dîsa pê nizanî ku wê xwe li ber xanîkokê te careke din çekiriye?! Tim hiş û mixê xwe berdaye ser te û derê qulê... Ew xweş bi te dizanê û te dinase! Dizane ku tê serê xwe li pêşberî vê bindestî û belengaziyê hildî. Ew xweş pê dizane ku tê weke berê- ka te çawa kiriye- wê welê, eynî welê serê xwe raki. Nexwe tirsek di dilê wî de nîne ku wê ew te winda bike. İro neqede, sibe; sibe neqede dusibe- wê ew illeh rojekê bi qerpika te bigire! Vêga wê xwe ji dorana xwe qutkiriye- ne dengê lehîstoka zarokên ji derive li ber tenûrê dikê û ne jî dengê lingên dewarên ku tên koxê dike. Tevek daxwaza wî tuyî! Ew bi te ve hatiye girêdan! Dinanên xwe ji bo te tûj dike!! Ew careke din kêmasyîn xwe tîne bîra xwe, ji hêrsa dike xwe bixwe- çîma wî tu ji nehişyari berdayî. Wî nefes, dil û mejiyê xwe kiriye yek- tevek bo te bûne yek û ji bo te dixebeitin! Ew li hêviya xeletiya te ne... li hêviya ducarkirina karûbarên te, yên bavûkalên te ku te pêgirtiye, ye...

Mişka xîzan! Li aliyeğî neyarê te di ber qulê, di çeperê de ye û li aliyeğî din jî çâlikên çermesorik, birçî, tazî û belengaz serê te gêj dikan...

Rebenê mişkê! Ma tu nizanî ku goşte te ew kevilê te yê bê duhn û bi pirç weke keremeşkekî dehsalî ye û herweha ew lingokên te yên zeifok- lê tevek ji bo wî goştê biraştiye; ew ji bo wî mast û şîrê di bin selikê de xweştir e!...

Tu careke din li şûn xwe ve li çêlîkên xwe dinêri: Çavêن wan hê nebişkûrîne- kirrên dikevê kezeba te û careke din bi awayekî kîlhatî diponijî; li rêçîka ji qulê heyâ kewara dexlê dihesibînî û dibêjî: »Bila deh gaz bin!«. Guhê xwe didî ser der û doranên qulê- tu deng, pêjin jê nayê. Tu ji xwe re dibêjî: »Bawer bike ku tû kes iro li vê malê nîne! Ma heyâ kengê wê ew xwe li ber xanîkokê min veşêre? Kanî ew hedara wî ya welê dirê? Bêguman, wî hêviya xwe ji min qut kiriye. Bi felitandina (xelasbûna) min, kî zane belkî dilêşê lê xistiye û nema vî karê ha berdewarm dike! Pişti vê jî, va ye ez vê rê pirr kin dibinim û bi çavnoqandinê re ezê xwe bigihînim binê kewarê... Maxane te got hema karûbarên wî bûme ez! Na, na! Tu kes heyâ niha nemaye li van derdoran! Na, ci bi wî ketiye ku serê xwe bi min bişîne?«

Mişka jar! Bi vî awayî, te bixwe bi destê xwe izin ji xwe re derêxist ku tu careke din xwe bavêjî nava êgir...

Li çêlîkên xwe dinêri- nûze-nûza wan ji birçîbûnê serê te birin...Ew hê bêhtir te

didehfinin ku tu zû xwe bigihêni binê kewarê! Tu cara paşiyê ji xwe re diponijî: « Bi Xwedê, serî-binî canekî min heye ew ji carekê tê dayin û carekê ji tê standin! Ger ew rojekê bê standin hema bila fro ew roj bixwe be! Ez hew karim vî halê kûçiktahi bikişînim. Hema bêje ez her roj dimirim! Min ev saxîtiya bi rezaleti navê! Bi Xwedê ezê biçim bin kewarê rêya xwe li hejîr û gwîzan bêxim û li aliyê din ji ez wî mastê di bin selikê de welê paqîj nahêlim; ji xwe, bi ezameta Xwedê kim, ezê wî şîrê di bin tebekê de bibim binî!

Mışka reben ya çavtar! Tu va ye, çavên xwe dinoqînî, nefesa xwe digirî, lingên xwe yên pêşiyê diêni ba yên paşiyê û bi tevek qeweta xwe ve xwe li derê qulê di-xî.... Vêre-vêre ... Erê, pêre-pêre, janek dikeve dilê te; çavên te tarî dixin; qirika te, tê girtin; nefesa te, tê qutkirin.... çend dilopên xwînê di pozê te re diherike, tê xwarê... çaxê te namîne ku li wan çêlikên xwe yên çermesorik û çavnûbişkuri biponijî... □

Ji te, yanî yê ku dike vê nîvîsê bixwîne dipirsim: Ma tu dikanî kitêbekê bixwînî?

ARTUR LUNDKVIST

Dibe ku nuha tu bi tinazî dikenî û di dilê xwe de dibêjî: Helbet ez dikanim! Ev ne hunerek e! Her kes dikane kitêbekê bixwîne! Lê ji xwe meriv pirr guh nadê, ji ber ku ewê kara xwendina kitêban çi be ku?

Hegr bersîva te ev e, ev ji nîşan dide ku di esasê xwe de tu nikanî kitêbekê bixwînî. Lê bi iştîmaleke mezin tu dikanî xwe fêr bikî, helbet gava tu bixwazi. Û dû re tu'ye bibînî ku pirsa te, ma ewê feydeya kitêbxwendinê çibe, bi xwe bersîva xwe daye.

Bêguman tu ne nexwenda yî. Yanî bi gotineke din tu dikanî bixwînî. Lê ev û xwendina kitêbekê ne yek tişt e. Ev ji tê wê manê ku divê meriv bala xwe li ser tiştê dixwîne baş kesîf bike, tiştê li ser rûpelan fêm bike û kanibe bide pê têkiliyeke dûr û dirêj û jê feydeyekê bigre.

Heger mesele bi tenê kitêbeke macarayê be divê tu problem tunebe.

Lê gava mesele kitêbeke bi qîmet be û ji ber vê ji hîn dîqetxwez be, wê gavê mesele hewqasî ne hêsa ye. A wê çaxê berî her tiştî divê meriv qabiliyeta xwe bi pêş xe ku kanibe bixwîne, fêm bike, têkeve hundur wê û pê re bijî.

Divê qabiliyeteke meriv ya pirr xusûsî hebe ji bo ku meriv dîrekta xwe bigihîne wan kitêbên herî baş û ji xwe re feydeyekê ji wan bigre. Di normalê de divê meriv gav bi gav here; ji tiştê hêsan dest pê bike.

Divê tu baş bizanibî ku meziyeta kitêbxwendinê jîxweber bi meriv re peyda na-be. Ev yek antramanê dixwaze. Lê ev antraman ne şert e ku bibe zordayneke dîrekta. Dikane bi hawakî balnekêş, hêdî hêdî bibe; di dema xwendina kitêbên ku li gor te ew bi heyecan in û iñteresant in.

Li gel vê ji hin iñsan hene ku tu carî nikanin xwe fêrî xwendinê bikin. Bi gotineke here basit ji bo vê yekê ew ji wan organan bê par in. Ew nikanin ji van organan

yenê derxin pêş. Di techîzatên wan de kêmasiyek heye. Meriv li ber wan dikeve. Ew tiştekî esası wenda dikan.

Bî xwendina kitêbekê ci bî destê te dikeve ?

Ew kitêbên ku ez li vir qala wan dikim ji wan re lîteretûra edebî tê gotin, yanî roman, çîrok, şîr û babetên taswîrê yên din. Tiştên ez li ser van kitêban dibêjim, hetanî derecakê ji bo hin kitêbên din jî derbas dibin: Wek, kitêbên li ser mewzuyeke xas, nivîsên faktayî û kitêbên dersê. Kesê ku kanibe kitêbên edebî bixwîne îmkaneke wî ya pirr mezin heye ku ji kitêbên ku zanînên mezin ji wan têr bi dest xistin jî bikaniye feydeyê bigre.

Di nav gelê Swêdî de bi piranî li hember kitêbên edebî bêbaweriyeke berfireh heye. Bêbaweriyeke ku ne kêm caran wek nefretê xwe nişan dide.

- Roman! Şîir! Ma ev jî tiştên ji bo însanekî mezin e? Vana bes fantazî û çîrok in. Li gel vê jî heger di xwendina tiştên wiha de feydeyek hebe ew jî lihevşâkirin û hederkirina wextê ye.

Kesên wiha dibêjin bi rastî nizanîn ci dibêjin. Li ser zewq û kîf ciye, dîtineke wan a pirr teng heye. Ew nizanîn ku ew wexta meriv dide xwendina kitêbeke hêja wexta meriv ya herî baş e. Di esasê xwe de rast e kitêb wek xwarinê, wek kincan û wek xanîyê ku meriv tê de disitire ne hewcedariyeke ku divê meriv muheqeq bi ci bîne. Lê pirr şukur ku gelek însan di mustewayeke wiha de dijîn ku hemû qewet û wexta xwe tenê ji bo berdewamiya jiyana xwe serf nakin. A wê wextê kitêb ciyekî dixwazin! Ew hewcedariyêن kulturi yên herî muhîm in.

Li gel hemû tişti, gava meriv bixwaze bigihîje qeneetekê êdî jin ji mîran bêtir dixwînin. Heger rewş wiha be meriv dikane bibêje ku paşdemayina mîran meriv ditirsîne. Ev yek ji bo hin mîran şeleke pirr ne xerîb e, li gor wan bi rengekî, Xwedîgiravî xwendina kitêban ne karê mîra ye. Yekcarna ev meyîl dikane hewqasî ji rê derkeve ku tu carî nexwendina kitêbekê bibe sebebê xwepesinandinê. Li gor wan ji ber vê yekê jî ew însanîn rastgo ne. Yanî ew li aşîmanan nafirin. Ew bi herdu nigêن xwe jî bi hawakî saxlem li se ruyê dunyê ne.

Lê di esasê xwe de têgihiştineke bi vî rengî him karîkatoriya mîraniyê ye û him jî ya rastiyê ye.

Heger du însan di hemû warêñ din de wek hev techîzkirî bin yê kitêban dixwîne ewê bi gelek hawî ji yê naxwîne hîn xurttir be. Ü yê dixwîne rastiyeyeke temamî, di nav dunyake piralî de dijî. Perspektîveke wî ya fireh, îmkaneke wî ya mezin heye,



www.ScienceCom

ku kanibe têkeve nav kûrayiya tiştên ne muhîm û sathî û nufîzî naveroka rastiyê bike. Di der heqê xwe de zanîneke wî ya mezin heye û bi rehetî nabe dora(qurba-na) parastina fikrên çewt û hisên demî.

Edebiyat bi taybetî di feydeya pêşxistina ferdî de ye. Ev feyde ne feydeyeke tavilê û ya praktilîkî ye. Lî ji bo demeke dirêj, bi maneyeke kûr, divê ew wek feydeyeke pîralî ya herî baş bête hesibandin. Ew dunya me fireh dike, çavên me vedike, hisên me disû, hesas dike. Muhakemekirin û dîtina me, hisên me, qabiliyeta me ya krî-tîkkirinê û fantaziyên me bi pêş dixe. Di der heqê me bi xwe û rastiya ku em tê de dijîn fikreke zelaltır dide me.

Di e'ynî wextê de ji me re kîfîxşiyê jî hazir dike, kîfîxşîyeke bi maneya herî xweş, me dewlemend dike, ew ji me re kaniya hêz û nuhbûnê ye, alîkariya me dike ku em hîn baştir, hîn intensiftir bijîn.

Tu kitêbeke baş çawa hildibijêri ?

Lî hilbijartina kitêbên baş zor e, bi taybetî yên li gor meriv. Divê bi hawakî meriv spesialistê edebiyatê be ku kanibe vê hilbijartinê bi ısabet bike. Spesialistiyeke bi vî rengî, kî dibe bila bibe, ew kesê ku interesa wî ji kitêban re hebe û hinek jî tecrûbe-ya xwendinê, şansê wî heye ku di vî warî de bi ser keve. Yanî kitêbnasiyeke ku kanibe bersîva hewcedariya meriv bi xwe jî bide.

Gelekî zahmettir e gava meriv bixwaze di warê kitêbhilbijartinê de alîkariya kesen din bike. Gelek caran hatiye serê min, însan têr dibêjin:

- Ez tiştî çawan bixwînim? Ma hûn nikanin kitêbeke baş bidin min! Ji bo min piir zor e ku bikanibim di nav hewqas kitêb de yeka baş hilbijêrim.

Kesê viya dibêje mexseda wî ya esasî ne ewe ku kitêbeke bi taybetî ez diecibînim, ya jî bi rengekî gelemerî kitêbeke baş e, na, mexseda wî ewe ku kitêbek ku bi taybetî ew dibêje baş e. Ü başî jî wek xwendevanekî edebiyatê girêdayî rewşa wî ye. Girêdayî pêşketina mustewa wî ye, wî berê ci xwendîye, îddia û daxwazîn wî ci ne û qabiliyeta wî ya hezimkirinê di ci dereceyê de ye. Divê ez vana gişan bizanibim ku qeneetek bi min re çê bibe; ku ez bikanibim kitêbekê hilbijêrim ku li gor wî be û divê jê hez bike. Ü jêhezkirin jî bêguman wek xwendevanekî edebiyatê girêdayî mustewa wî ye. Yanî wî berê ci xwendîye, daxwaz û hewcedariyên wî ci ne, qabiliyeta wî ya xwendinê çawa ye û dikane çuqaşî hezim bike ? Ez mecbûr im vana hemuyan bizanibim û baş fêm bikim ku ez kanibim jê re kitêbekê hilbijêrim ku divê tam li gor wî be.

Ji tecrubeyên xwe ez dizanim, pirr bê maneye ku meriv ji kitêbekê hez neke lê dîsa jî ji xwe re bike ïnat û rabe wê bixwîne, dixwaze bira ew kitêb yek ji şaheserên dunyayê be. Kitêbeke baş ji xwendevanekî bi ısabet re tu carî zahmet û ne baş na-yê. Lê gava kitêbek ne baş xuya be, bê guman dikane ji ber du sebeban be: Ya bi rastî ew ne ìnterestant e, ya jî wek xwendevan ew bes bi min wiha tê. Yanî ya ji kitêbekê ye û ya jî ji min e. Îcar kîjan alî di giraniyê de ye dibe ku bes edîbekî xwedî tecrûbe kanibe ji hev derxe.

Qala edebiyata wextborînê pirr tê kirin. Gelek kes dibêjin ew dixwazin tişteki wextborînê bixwînin, ji bo ku ji xwe re hinekî ıstîrahet bikin. Û rast jî literatûreke sivik, pirr paş de, bi taybetî jî tije bûyerên bi heyecan, ya jî literatureke romantîk a sathî heye, ku gelek xwendevan, kîtleyeke mezin ya xwendevanê hindik bi pêş ketî wê ji xwe re wek literatureke wextborînê û kîfxweşiyê dibînin. Lê ev nayê wê maneyê ku kitêbên bi vî rengî ji alî hemû kesi ve wiha tê qebûl kirin.

Yê min wek şexs ji panzde saliya xwe û virde ye ku ez ji kitêbên dedektif ên basît, ya jî ji romanên macerayê, wek yên Edgar Walleces ên fabrikasyon, ya jî ji romaneke evînê ya bêbingeh tu keyfekê nagrim. Ji bo min ew ne ìnterestant in. Ew bîna min teng dikin. Aramiyekê nadîn min, ji bo min bê mane ne. Qet min teşwîq na-kin. Û ji bo wextborîna here basît jî dîsa divê hawakî teşwîqkirinê hebe.

Helbet xwendina kitêbên rast bi qîmet, bêtir meriv diwestîne. Kitêbên weha dî-quet û meraqeke mezin dixwazin, divê meriv bi hemû hebûn, tefehum, fantazî û his-sen xwe tevê bibe. Lê ji bo xwendevanekî bi ısabet pîvana zahmetiyê İlhamgirtin e. Yanî gava çaviya mêmîna teşwîqê ji ya zahmetiyê girantîr kişand êdî ew ji meriv re wek dijwariyekê nayê, di rewşike wiha de meriv kitêbeke bi ısabet dixwîne. A wê gavê meriv bi şiklekî herî bilind û rastîn zewqekê jê digre. Û tenê zeweşike wiha hêjaye ku meriv qala wê bike. Ev zewq bi hawakî herî saxlem di nav kitêban de riya xwe dibîne, bêyî ku lîteratura wextborînê ya tevayî bigre hesêp.

Ne kîfxweşî tenê

Li gel her tiştî divê meriv vê lîteratûra wextborînê biçûk nebîne. Li gor xwe wezîfe-yekekê bi cî tîne, teqabûlî qonaxeke taybetî ya gelek mirovan dike. Ciyeckî xemgîniyê ye gava gelek însan bi pêş nakevin û bes di vê qonaxa xwendinê de dimînin. Wê çaxê meriv di babetekî qonaxa edebiyata zaroktiyê de dimîne, cî heyf ku ev jî pirr tê dîtin. Him normal e û him jî rast e ku gava meriv zarok be çirokan bixwîne û dûre di salêن xortaniyê de dest bi xwendina kitêbên îndîan, romanên macerayê, ro-

manê polisiye û çîrokêñ evîndariyê yên basit bike. Lê belê gava kesên mezin ya ji yên navsale bes tiştîn wiha dixwînin êdî bi hawakî dibe delîlê paşdemayinê. Kesên wiha aliye kî wan sekiniye, bi pêş neketiye û xerab tekamul kirîye.

Helbet her kes nikane bi qasî hev bi pêş keve û xwe bigihîne edebiyata bilind yanî wan kitêbên rastîn. Lê gelek kes ewê kanibin ji edebiyata wextborînê hineki bibuhurin, ji çerçewa kovarêñ hefteyî yên rengîn wêdetir herin. Gava ew vê gavê navêjin, dibe ku ev ji ber şertîn wan yên xerab, ji ber tunebûna kitêbên maqûl tê; yan ji ji ber bêqabiliyetiye wan ya dîtina kitêbên li gor xwe tê. Û jê wêdetir ji ji ne-xuluqandin, kêmfantazîtiyê û xuyêñ berê tê.

Bi însanan fêrkirina xwendina edebiyatê û temînkirina kitêbên maqûl divê wezîfa civatê ya pêşin buya. Ku ew yek heta nuha di çerçewe yekke pîr sînorkirî de hatîye kirin.

Numûne, zanîn, têgîhiştin

Tiştî edebiyatê yê herî girîng numûneyên idîal dide me. Numûneyên ji dereceyeke bilind ku wek qaîde em nikinan wan raste rast di rastiyê de û li der û dora xwe bibînin. Em di kitêban de qehreman û idîalên xwe dibînin, pîr ya jî hindik em di-xwazin bişibin wan. Em jî dibin şîrîkê qabilîyeta wan, şîrîkê hêz, daxwaz û heyecana ji wan dihere. Bi vî hawî ew tesîrê li kirinêñ me dikin û ji jiyanâ me re dibin hêz.

Gava em ji kitêbên macerayê derbasî edebiyata rastîn dibin, em ji bûyerên basit yên berbiçav derbasî cîhana probleman dibin. Êdî mesele ne reş û sipî, ne qehreman û rîbir in. Însan û têkili zêde tevlihev in. Baş û xerab wek tiştîkî grîft, ku jê neyê fêmkirin xuya dike, ji ber vê yekê jî yek tim di hundur yê din de ye. Di vir de kitêb ji me re dibe alîkar ji bo ku çavêñ me vebe, em kanibin bibînin ku rastî çuqa-sî di nav hev de û bi dijayerî ye. Dîsa ew hisêñ me bi pêş dixin, ji ber ku her tişt bi kêmasî du aliyêñ wî hene, yanî ne tenê ew aliyê ku em bi hêsanî dikanin bibînin.

Edebiyat dîsa ji riyîn însan yên zanînê ya herî girîng e. Kesên edîb ji alî xwe ve hertim di pêş psîkologên meslegî de bûne û psîkolojiya modern jî ji edebiyatê gelek tiştî fêr bûye. Di jiyanâ nû de psîkoloji wasitayeke bêemsal e û ew jî ji zanîna di der heqê însan wêdetir ne tiştîkî din e. Ev zanîn bi miqtarekî zengîn û bi formeke hê-sanpeydakir di edebiyatê de heye. Di vir de heta dereceyekê em însan ji nêz ve û hîn bi kûrahî nas dikin, ku di rastiyê de ev yek tu carî ne mumkûn e. Em dikevin dilîn wan, ji his û fîkrîn wan para xwe digrin, ji sebebêñ wan yên esasî, heta bi ki-

rin û şela wan em gişî fêr dixin. Gava bi vî hawî em dikevin hundurê insan û dibînin ku insan çawa hereket dikan û di kûrayiya hundurê xwe de ew çawa xuluqî ne, di eynî wextê de em di der heqê xwe de jî tiştna fêr dixin. Em fêr dixin ku ji bo çi em wiha his dikan, difikirin û bi vî hawê em dikan, em hereket dikan. Qet tu tiştek jî bi rengê ku xuya dike sedî sed ne were ye. Meriv ne ew kesê meriv bawer dike têne ye. Di hundurê yekî de her tim "yekî din" jî heye, ez'ê me yê hundur, pîr ya jî hindik ji alî me bi xwe ve jî nayê nas kirin. Piştî ku hera dereceyekê em ez'ê hundurê xwe nas û fêm dikan, em di der heqê xwe bi xwe de jî bi rastî tiştekî fêr dixin. Bêyî zanîna di der heqê giriftdariya me bi xwe de em dikanin bi hêsayî mecbûri kîrineke zorakî ya çewttêgîhiştî bibin, ku di esasê xwe de tiştekî wiha ne daxwaza me ye.

Gava mesele bi vî hawî, keşifkirina xwe bi xwe be, edebiyat ji bo me alîkariyeke bê hempa ye. Ew neynikeke wiha ye ku dunya me ya hundur ji hemû neynikên din baştır nîşanî me bi xwe dide. Ü berî her tişti bi alîkarya xwenasiya xwe em dikanin bi temamî bibin yê xwe. Her wisa girîngiyeke sosial ya mezin e ku em giş ne wek hev bin, ji me her yek bi rengêkî divê mexsusê xwe be. Bi vî tengî jiyanâ civakî hîn dewlemendir û tehlûkeyên psîkozên girseyî jî hîn kêmter dixin. Riya parastina demokrasiyê ya herî saxlem ewe ku divê insanê jî hev cihê û bêtir bûne ferd bêne xuluqandin ku ew bi hêsayî dev ji şexsiyeta xwe bernedin û nekevin nav hîsteriya girseyî ya bebet babeti.

Fantazî û rastî

Lê berî her tişti edebiyat xîtabî fantaziya meriv dike. Zêdetir ji alî fantaziyê ve meriv feydeyê jê dibîne. Bi riya fantaziyê kitêb dixin biranînê hêja û qîmetekê dibînin. Bêyî fantazî meriv nikane bixwîne. Çimkî fantazî jî elementekî jiyanê yê girîng e. Belê, bêyî fantazî, hetta hisen meriv yên rastin jî dixin xwedî kemasî û xapînok. Fantazî hisen meriv zînde û mezintir dike. Bêyî fantazî merivê hîn feqîrtir, hîn valatir, bes ji xwe re û di çarçewa ez'itiya xwe de izolekirî bûya. Fantazî alîkariya me dike ku em insanê din jî fêm bikin û kanibin xwe têxin dewsa wan. Fantazî alîkariya me dike ku em neticeyên kirin û bûyeran texmîn bikin, û tişten li pêş xwe ji berê de bibînin. Fantazî dewlemendiyeke, çavkaniyeke dilşadiyê ya daimî ye ku tu kes û bi tu hawî nikane me jê bêpar bihêle.

İnsan tenê bi nan najî, her wisa ew bi fantaziyê jî diji. Hemû kultur dikanin wek herikandineke fantaziyê bêne dîtin, fantaziya ku bûye rastî. Fantazî ye ya dide ber

rastiyê û şikil dide wê. Edebiyat bi xwe ne tenê berhemeke fantaziyê ye. Her wisa ew fantaziyê bi pêş jî dixe, bi vê yekê re fantaziya xwendevan jî vedijîne, firehtir dike. Lê fantazî derî li rastiyê nagre. Bilekis, di dema pêwîst de ew ji rastiyê re xizmete dike. Ew dibe alîkar ku rastî bête dîtin, bête ihtiawakirin û bête izahkirin.

Dibe ku rastî û fantazî di edebiyatê de tiştên herî muhîm bin. Kitêbên ku bi rastî kitêb in bi derbkê de fantaziyê dixuluqînin, rastiyê didin kişifkirin, heqîqerê radixin ber çavan. Û bi vî hawî dibe ku ew ji her tiştî bêtir hisên ji bo rastiyê jî bi qasî qabiliyeta xeyalkirinê bi xwendevan re xurt dikin û têgîhiştina wî ya realîte bi pêş dixin.

Belê, fantazî û rastî! Çimkî fantazî bi serê xwe tenê dibe tiştekî vala û nekêfxweşî û tenê rastî jî dikane bi rehetî rengekî cûn bigre, bixapîne û bêdeng bihêle.

Netîce, fantazî û lihevanîn literatureke xerab e. Lê tenê lihevanîn hîn xerabtir e.

Ciyê şîrê û rastî

Kitêb dikanin alîkariya me bikin ku em hîn rastir bijîn, hîn temamtir, hîn inten-siftir. Armanc ne ewe ku ewê kitêb dewsa jiyanê bigrin, di dêlî ku ewê ji bo jiyanê bin. Bi eksê wê divê xwendin bibe perçaki jiyanê, bi kêrî tiştekî bê, bibe wasitayeke bêemsal ! Bêguman hafızquranênu ku tenê aliyakî dibînin hene, bi xwendinê xwe kor dikin, xwe pirr diwestînin, eziyetekê daimî bi xwe didin kişandin. Lê vana karîkator in, tahrîbkarênu ku bes aliyeke meselê dibînin. İnsanê îdeal dikane di plana der û hundur de hereket bike. Bi wî re fikir û kîrin, fantazî û rastî bi hev re hene. Û ev balanseke wiha ye ku bêyi seqetkirin nikane bête guhertin.

Wekî din ji kesên edîb bi piranî kesên tevger û rastiyê yên herî mumtaz in. Wan gelek caran mudaxeleyi gelşen sosyal û siyasi kirine. Di van salênu dawî de ji van ni-vîskaran yên herî bi nav û deng û pirr balkêş di hemû bûyerên girîng de tim ciyê xwe girtine. Meriv dikane Malrauxê Fransî û Hemîngwayê Emerîkî wek numûnê nişan bide, ku herdu jî bi xwe tevî şerî İspanyayê yê hundur bûn û dûre jî li ser vî şerî kitêbên gelek meşhûr nivîsandin. Ya jî Koestlerê Macarî ku ji tarîxa Ewrûpa ya salênu sihî gelek tiştên giran dît û jiya, ya jî têkoşîna Siloneyê İtalî ya dûr û dirêj ya li hember faşîzmê!

Dîsa gelek hêja ye ku divê meriv bizanibe gelo di vî şerê nuha de⁽¹⁾ nivîskariyê roleke çawan listiye, bi taybetî jî li Îngîlistanê. General Wavell bi xwe antolojiyeke şîrên ku di dema herbê de hatibûn nivîsin weşand, dîsa general Montgomery her wisa; wî jî antolojiyeke şîrên ji alî leşkerên di ordiya heştemîn de, di dema şerê Af-

rîka Bakur de hatibûn nivîsin weşand. Dîsa çend cild şîrên pîlotên îngilîz jî hatin weşandin. Ev çend numûne jî nişan didin ku şer û şîr çawa dikanin bi hev re bimeşin!

Ji xwe armanca edebiyatê ne ew e ku meriv ji jiyanê û ji rastiyê dûr bixe. Bi eksê vê divê edebiyat bibe wasite ku meriv hîn bêtir nêzî jiyan û rastiyê bike, baştir têkeve hundur wan û wan idare bike. Ji bo guherandina rastiya heyî, ji bo şikigirtina însan û civatê, ku ev guherandin daimî ye, edebiyat tim di şerekî bênamebê de ye. Û ev jî bi alîkariya kesen ku kitêban dixwînin dibe!

Heger ewê însan û dunya baştir bibin, rasttir û baştir bigerin, dijayedî zêde nebin û malwêraniyêñ bêmane neqewimin, ev yek bi tevayî wek ferd li ser me maye. Pêşketina laboratuarên ilm û atolyeyên teknikê ferz dikan ku însan û civata wî jî xwe biguherîne, heger em naxwazin her tişt têk biçe, bibe kaos. Diyariyên teknikê dikannin tahrîbkar bin, hemû medeniyeta heyî dikane bibe "rastiyekê mirî." Ji bo ku em pêrgiyê li vê bigrin ji me her yek ji bal xwe mesûl e ku wek însan divê em baş bibin, zana bibin û di prosesa formdayina jiyana me ya muşterek de divê em ciyê xwe bigrin. A wê gavê jî belkî ji edebiyatê çêtir hacetekî me yê alîkariyê tuneye!

Kitêb wek hevalê însan yê jiyanê

Ji însanan beşike gelek mezin divê hevparê hilberîna kulturî bin, lê ne kultura maddî tenê, her wisa ew tiştê ku têkiliya wî bi fikir û his re heye, divê hevparê wî bin jî. Gava girse(kîtle) di maneya rastin de teví xebata kulturî bibe û ji bîr neke ku ev yek hewcedariyeke jînê ya esasî ye, welhasil garantiya berdewamiya kulturê ev e. Girseyâ mezin ne tenê barê kulturî li ser mil e, her wisa ew bi saya daxwaza xwe hebûna kulturê jî mumkûn dike, lema jî divê ew fêkiyên wê jî bixwe. Şiklê jiyana modern ji gelek alî ve baskokirî ye, pirr ya jî hindik ji tebîetê û ji dilşadiya ji hebûnen hawîrdor yên esasî hatiye cudakirin. Her tiştê ku însan di vir de wenda dike dewsa wan tenê dikane bi kulturê, bi riya guherandina hewcedariyêñ destpêkî û bi riya kêfxwşiyêñ nuh bête dagirtin.. Xebata rojane û keftelesta ji bo berdewamiya jiyanê bi xwe ne şerr e ku jiyan hemû be.

Li gel piraniya nufûsê, formen xebata kolektif û gelek babeten jiyanê yên bi hev re lê însanê nuha dîsa jî xwe pirr tenê his dike. Di çerçeweyekê gelek fireh de ji bo wî êdî maneyeke esasî ya dîn(ol) jî nemaye. Di dewsa dîn de êdî însan berê xwe di de gelek formen kulturî: Berê xwe dide edebiyatê, muzikê, resamîyê, film û tiyatro yê.

Xwendina kitêbekê têkiliya ferdî ya kulturî ya herî girîng e. Çimkî bi xwendina kitêbê însan bi însan re pîr dîrekta dipeyive. Ew nivîskar û şairên ku bi riya kitêbên wan, em wan nas dîkin dikanin ji bo me bibin însanên ji nasêñ me jî muhîmtir. Ew dikanin bêtir nêzikî me bibin, bi me re bêtir bibin dost û zêde tiştî bidin me. Ü bi saya wan em dikevin nava dunyake ji ya me hîn mezintir û ji alî naverokê ve hîn dewlemendtir.⁽²⁾

Merîv kitêbekê çawa dinirxîne?

Qala hunerê kitêbxwendinê tê kirin. Ü wek her hunerî ev huner jî ji alîkî ve qabîli-yeteke tabîî dixwaze û ji aliyakî din ve jî bi riya xwendin û antramanê mumkûn e ku ev qabîliyet bi pêş keve. Tiştê divê merîv bike ne hewceyî zahmetiyên pîr mezîn in. Dikane bi hawakî wisa biçe ku tew bala merîv jî nekşîne, wek dilşadiyekê, wek wextborînekê be. Tenê divê merîv hinek hewes û hinek jî daxwaz mobilize bike. Ü ev yek hêjayî zahmetiyê ye, him jî ji gelek tiştê ku merîv wexta xwe didê gele-kî hêjatir e. Ez hêvî dikim ku bi van rêzan heta derecyekekî di warê iqnakirinê de ez bi ser ketibim.

Ji bo xwendina berhemên edebî ewê ne rast be ku ez rabim li vir hin şîretan bikim. Şîretên wiha gelek rehet dikanin ji feydeyê bêtir zirarê bidin. Bê guman her kes dikane bi hawê xwe, xwe pêş de bibe. Li gor munaqşeyeke li ser "Hunerê xwendina kitêbekê" divê piştî xwendineke temam merîv kanibe bersîva van çar pirsan bide:

- Çî hatiye gotin?
- Çawa hatiye gotin?
- Ma rast e?
- Maneya tiştê hatiye gotin çiye?

Helbet divê merîv nehêle ku xwendin têkeve bin giraniya pirsên wiha. Heta ku mumkûn be divê xwendin tabîî be, dilşadiyekî ji xwe ber be. Dûre dikane feyde tê hebe ku merîv ji bo xwe careke din lê hûr be û bizanibe ku merîv bi tiştî çawa re bû ye. Ger bi hawakî teqrîbî be jî merîv bikanibe bersîvîn van herçar pirsan bide, helbet ewê têgîhîstina merîv ya ji kitêbekê zelaltır bibe, naveroka wê ewê baştîr were fêmkirin û ewê hêjayiya wê di serê merîv de baştîr rûne, merîvê baştîr bizanibe ku ka ci daye merîv. Dîsa gelek baş e merîv ew beşen bêtir bala merîv kişandine careke din bixwîne. Gava merîv bi dûzan di ser re here, cara duduyan merîv wan ji cara pêşî baştîr fêm dike.

Wek pirnsip divê meriv pirr bi dîqet bixwîne, qet ecele neke, ji bo ku herikandina bûyerê taqîp bike, bibîne ka bûyer dihere li ku disekine pirr nelezîne û ji bo ku hîn zêde pêre bigihê nekeve telaşê. Mesele ne ewe ku meriv çend kitêban dixwîne, mesele meriv wan bi ci maneyê dixwîne. Di kitêbekê de tiştê herî sereke û esasî ne dawiya wê ye, bilekis her tiştê berî dawiyê diqewime girîng e. Ne ku çawa dibe interesê mezin dike, ji ber ci û bi ci hawî dibe muhîm e. Û gaava meriv bigihîje wê baweriyê ku kitêbek ne hêjayî xwendineke bi ser û ber e, çêtir e ya jî baştir e ku meriv wê ji binde nexwîne. Divê meriv qet netirse kitêba ku ji meriv re interesant nehat ji dest xwe berde. Yêñ din pirr in, yêñ baş ku meriv kanibe di dewsê de bixwîne (yêñ ji bo hemû musteweyan, ji bo her derecaya pêşxistina edebî). Kitêb divê bêne hilbijartin! Û edebiyat ji bo her kesî ye, tenê divê meriv wê bibîne. Divê meriv kitêbên di bin mustewa xwe re nexwîne. Lê li alî din jî divê meriv yêñ pirr di ser mustewa xwe re jî nexwîne. Neticeya wê bi hêsanî dikane bibe dixwer nedîn, babetekî xwendina vala. Divê meriv zorê nede kapasita xwe ya edebî. Divê bi xwe bikemile, ew girêdayî kamilbûna meriv ya organîk e. Qimeta kitêbekê ji bo meriv çiye, belkî riya herî baş ew e ku meriv wê li gor dereca ku tesîreke çawa kiriye binirxîne. Ew li pey xwe valayî û xemsariyekê dihêle, ya jî dibe ku li gel mewzuyeke trajîk û dilşewat dîsa ji hisekî ji bo jiyanekî azad, intensif, hîn dewlemend û hîn bi mane li pey xwe dihêle? Bersîva vê pirsê esas e. Bi kitêbên ku bi rastî jî kitêbin meriv xwe hîn mezinbûyî û hîn dewlemend his dike. Jiyana rojane meriv kor dike, refleksê bi meriv re nahêle, meriv tembel dibe û guh nade tiştekî. Edebîyat meriv disû, paqij û nuh dike. □

Ji swêdî: **ZINARÊ XAMO**

(1) Nivîs di sala 1945'an de hatiye weşandin, nivîskar qala Şerê Cihanê yê Duyem dike. Z. Xamo

(2) Nivîskar di vir de numûneyek ji çar pênc gotinan ji nivîskarekî Swêdî, (ku navê wî jî nedaye) neqil dike. Min ev numûne wernegerand. / Z. Xamo

Nêrînê felsefî ên Pascal û Descartes



FAWAZ HUSÊN

Blaise Pascal (1623-1662) Pascal li bajarê Clérmont Ferrandê ji diya xwe di sala 1623an de dibibe. Bavê wî dadmend e û gelekî guh li zaniyariyê û nemaze li matematikê dike. Pascal naçe dibistanê û her tiştî ji bavê xwe, li malê, fêr dibe. Ew sêsâlî ye gava diya wî dimire. Bavê wî malê di 1631ê de diguhezîne Parisê. Ji heyêt saliya wî jîrbûyîna wî ji kesên dora xwe re xuya dibe. Di neh saliya xwe de ew gotareke zaniyarî li ser dengan dinivîse. Hemû warên teknik û zaniyarê bala wî dikişînin. Di nozdeh saliya xwe de ew bingeha mekîna hejmartinê dibîne û wê mekinê saz dike.

Malbata Pascal malbateke bi Xwedê gelekî bawer e, dîndar e. Carekê nigê bavê wî li bajarê Rouenê dişike û ew li wê derê dikeve xestexanê. Du dîndarên ji mezheba Jansên (1585-1638) lê miqate ne û li baweriya wî kîr dikan. Bav van nêrînên oldarî hin bi hin li dixe dilê lawê xwe Pascal ji. Pascal hergav nexweş e û carekê ji ji mirinê li kêleka Parisê difilit. Berdewamiya nexweşiyê wî ji civarê dûr dixe û davêje nava hîsên xwedayî. Lê belê tiştê herî balkêş li bal Pascal ew e ku ew guhl li lêkolînen zaniyarî û pirsên xwedeyî bi hev re dike. Destgehêن zaniyarî û pirsên oldarî di hinava wî de ne dijî hev in. Pascal di dawiya salên xwe de li ser çend pirsên zaniyarî kar dike lê ew bêtir li ser pirtûkekê li ser ola mesîhî dixe bite. Ew tenê sî û neh salan dijî û di sala 1662 an de dimire. Nêrînê wî li ser pirsa xelasê û hebûna Xwedê di bin sernavê Hizir û Ramanê Pascal de piştî mirina wî têr berhevkirin.



al di nehsaliya xwe de dest bi nivisandina gotarêñ zaniyari
û.

Ravekirinêñ oldarı di nava filetiyê de

Di sedsala hivdehan de, di filetiyê de gelek lêkolîn û ravekirin li ser pîrsa baweriyê û xelasa însên çê dibin. Gelo mirov bi limêj û rojiyê tenê dikare xwe xîlas bike? Eger Xwedê hiş û azadiya tevgerê daye mirovan çîma hinin ê bigihêjin buhuştê û hinin din ê bibin êzingêñ dojehê? Çawa mirov dikare xwe bigihîne kêfxweşîya ebedî? Keşe û oldar van pîrsan di bêdengiya perestegêh û xewlangehan de ji xwe dikin. Keşekî hollandî bi navê Cornelius Jansen (1585-1638) digihêje baweriyekê taybetî. Ew dibîne ku bêyi saya Xwedê tu kes nikare xwe xelas bike. Eger Xwedê nexwaze, kesek nikare bi limêj û pakiya dilê xwe xwe ji agirê dojehê reha bike. Xelasî û nexelasî herdu di destê Xwedê de ne. Murid û şagirtêñ vê dîtinê dev ji malêñ dunyayê dîqerin û hemû wextê xwe bi perestina Xwedê derbasdi-kin. Ew xwe ji hemû xweşiyêñ can û bedenê dûr dixin ta ku Xwedê, belkî, rojekê, li wan bê dilovaniyê. Xwedê tenê dikare bêje kî ê bikeve ber meherbaniya wî û kî wê jê bêpar be.

Pêşî, bavê Pascal dide ser vê riyê. Paşê, hemû malbata wî û bi taybetî Blaise. Herdu xwehêñ Pascal dikevin perestgeha Port-Royalê, navenda vê baweriyê. Paşê gava nexweşî li Pascal gûr dibe, ew bi xwe ji terka dunayê dike û dikeve xwelangehê. Pascal bawer dike ku Xwedê ew ji bo xelasî helbijartî ye. Ew di nexweşî û êşen xwe de irada Xwedê dibîne. Ew di salêñ xwe ên dawîn de pirtûkekê li ser parastina filetiyê dinivise, lê ew vê pirtûkê tev nake û dimire.

Ramanêñ Pascal

Pascal dixwaze ku şes salêñ ji sihet û rehetyê li ber wî hebin ta ku ew pirtûka xwe li ser Parastina filetiyê tev bike. Ew pênc salêñ nexweşiyê li ber xwe dibîne û pirtûka wî perçê perçê dimîne. Daxwaza Pascal bi vê pirtûkê ew e ku ew kesêñ duniyaper-

set û xwedênetirs bet bi olê ve bikişîne. Ew pêşî ji wan re nîşan dide ku ol û aqil ne tersî hev in. Paşê ew hêvî dike olê li ber dilê mirovan şîrîn û xweş bike.

Pascal di vê pirtûkê de tenê gavên pêşîn davêje. Ew li dû xwe »Kaxezêñ miriyekî« dihêle. Ew nêzîkî hezar perçeyî bi piraniyêñ xwe kin dihêle. Hizir û ramanêñ wî cara pêşîn di sala 1670 î de têñ berhev û çap kirin. Pişti vê çapê gelek çapêñ din derdikevin û Pascal bêtir û çêtir tê nasîn.

Tevgera Pascal di hizir û ramanêñ wî de tevgereke taybetî ye. Ew serê xwe bi îsbat û peytandina hebûna Xwedê naêşîne. Ew dizane ku peyitandina Xwedê bi gotinan zehmet e. Ta ku ew xwendevanê xwe bixe ser rêya baweriyê filetiyê, ew bi nermî û bi bêhna fireh berê xwe dide dil, ne mejiyê wî. Ew rave dike ku hebûna mirovan li ser rûyê cîhanê tiştekekî seyr e. Mirov ji mezinahî û biçûkahiyê çê dibin. Ji aliyeckî, ew wek qeselekê qels in, jar û melûl in, zû nexweş dikevin û dimirin. Ji aliye din, ew di ser hemû lawiran re ne, ew dikarin tiştan ava an weran bikin, ew dikarin biramin, bifikirin. Mirov »qeselek e ku difikire«, lê ew dizane ku ew zû dişike. Pacal bi endîşe û xemgînî li ser çarenûsa mirovan ji xwe dipirse. Felsefe bersiva xurtbûn û qelsiya mirovan nikare bide, tenê filetî, bersiva van tevliheviyan di hinava mirovan de dikare bide û dide ji. Ol dibêje ku mezinahiya di canê mirovan de ji dema berî Guneha Serekîn tê. Berê, mirov di buhuştê de bû, ew mezin, xurt, pak bû. Gava Adem bi gotinêñ Hewayê û yên marê pîs kir, Xwedê ew ji buhuştê derxit û ew jar û qels kir. Li gor baweriyêñ Pascal, filetî bersiva pirseke mezin dide. Tişte ku aqil nagihêjê, baweriya oldarı digihêjê. Paşê, tişte herî giring di hizir û ramanêñ Pascal de şertê Pascal e. Pascal dibêje ku gerek mirov baweriya xwe bi Xwedê bîne ji ber ku ew bi vê baweriyê tiştekî ji xwe kêm nake. Eger Xwedê û roja qiyametê hebin, ji xwe mirovê bixwedêbawer ê bigihêje daxwaza xwe, ew ê vegere buhuştê. Eger Xwedê nebe, ji xwe dîsa tiştek jê kêm nabe ji ber ku bawerî rêya këfxweşî û xérê di rûyê mirovan de vekirî dihêle.

Hizirêñ Pascal di sedsala hivdehan de seraser deng didin. Gotinêñ wî nikarin bi rastî mirovekî bînin ser rêya ol û bixwedêbaweriyê ji ber ku ew tenê gazî dilê mirovan, ne mejiyêñ wan, dikan.

Pascalê rewşenbir xirecir, serês û tevgerêñ sedsala xwe pêşkêş dike. Pirsên xweda-yî û asmanî ciyekî mezin di vê sedsalê de digirin û Pascal hewl dide bersivêñ wan bide. Di warê pêşketina bawerî û nêrinêñ felsefê de li Fransayê, Pascal, wek Descartes ciyekî taybetî distîne.

René Descartes

(1596-1650)

Descartes (Dêkart) ji malbateke xandar ji navçeya Poitou-yê ye. Ew di biçûkaniya xwe de rûmeteke mezin dide zaniyariyê. Ew matematikê, fizi-kê dixwîne. Rojekê rastiyek di hişê wî de xuya dibe. Ew dibîne ku geyti, dunya hemû yekîtiyek e. Ew dibîne ku zanîn û zaniyari kilita têgihaştina destgeha vê yekîtiyê ye. Ew hemû wextê xwe dide lêkolîn û xebatê zaniyarî, ta ku ew xwe bigehîne »rastiya mezin«.



Descartes bingeha teorî û metoda felsefeya modern daniye

Descartes li Parisê hemû beşen zaniyariya insan û xwezayê dixwîne. Ew neh salan li Ewropayê digere. Di sala 1628 an de ew mala xwe dibe Holendayê ji ber ku ev welat azad e û li wê derê ew dikare bi kêfa xwe, bi azadî, birame, lêkolnên xwe berdewam bike. Ew di sala 1637, bêyi navê xwe, pirtûkeka Gotara destgehê (*Discours de la méthode*) bi fransî diweşîne. Seraser dijminên vê pirtûkê derdikevin û tuhma kuft û bixwedêne-baweriyê tê ser Descartes. Pişti vê pirtûkê Descartes bi semt û tirs li ser hizir û ramânên xwe dînivîsîne. Nêrinên wî ciyên xwe ên rastîn di civata fransî de nabînin. Di sala 1649 ew biryara xwe dide biçe Swêdê bibe mîvan û mamosteyê Christina, qirala Swêdê. Dersênu ku ew dide qîralê li taxeke sar li Stockholmê di pêncê destê sibehê de dest pê dîkin. Rebenê Descartes sermayê digire û gelekî nexwêş dikeve. Ew ji ber vê quesra sar di pêncî û çarsaliya xwe de dimire.

Gotara destgehê (1637)

Di vê pirtûkê de, Descartes dîroka xwe dibêje û ji xwendevanan te rave dike çawa ew hin bi hin bi ser rastiyê ve dibe. Ew behsa zaroktiya xwe, xortaniya xwe, gerên xwe li Ewropayê, jiyana xwe li Holandayê bi zimanekî sade dike. Ew bi vî rengî dîroka rewşenbîriya xwe rave dike.

Tiştê balkêş di vê pirtûkê de ew e ku Descartes wê ne bi latînî, wek her filozofî, lê bi zimanê fransî dinivîse. Di vê demê de, fêlesûf û zaniyar li Fransa û li gelek we-latêن Ewropayayê hêna bi latînî, zimanê zaniyarî û felsefeyê dinivîsin. Descartes pirtûkê bi fransî, bi zimanê gel, amade dike. Ew li ser rûmerta aqil û giranbuhayiya aqilmendiyê dinivîse. Ew dibîne ku jiyana mirovan dest pê dike gava ev dest bi fîkr û ramanê dîkin. Bi saya Descartes ev hevoka navdar belav dibe: »Ez diramim, na xwe ez heme.« Descartes dibêje ku Xwedê aqil wekhev daye herkesî û her kes gerek vê danê bi kar bîne. Bi karanîna vê dana Xwedê gerek bi rêk û pêk be. Ta ku rêya rastiyan vebe, gerek ev bi karanîn bi destgeh be. Pêşî gerek mirov li ser her tiştî pirsan ji xwe bikin, gerek ew tiştîkî bê tefkîr qebûl nekin. Bi saya aqil û destgeha lêgerînê, mirov ê bi ser rastiya mezin ve bêñ û paşê ji, rêya kêfxweşiyê ê li ber wan vebe.

Gotara Desrgehê destgeha azadiya raman û fîkrê ye. Descartes nêrinêن xwe li ser destgeha zaniyariyê bigewde dike. Ew aqil dike qiralê nemir, fermandarê ebedî. Ew di tefkîra bi rêk û pêk de, tefkîra bi destgheh, xuyabûna hemû rastiyan dibîne.

Rastiyên zaniyarî û oldarî piraniya caran ji hev cihê ne. Descartes bi parastina aqil û danêن zaniyari kesên oldar ditirsîne. Ev kesên oldar bawer dike û destgeha zaniyarî û aqilane ye. Ew ê ji baweriyên metafizîkî dûr bikevin. Oldar di vê sedsalê de xurt in û li siyasetê kér dîkin. Nêrinêن Descartes di sedsalâ Louisê Çardehan de ciyekî mezin nagirin. Ev qiral pirtûka Gotara Destgehê di sala 1685 an de qedexe dike ligel ku Descartes hergav baweriya xwe bi Xwedê eşkere dike û dibêje ku nêrinêن wî ne dijî dêrê û baweriyên oldarî ne. Descartes û destgeha giringiya ramana aqilanî geleki li filozofen Ronahiyê û nemaze li Diderot paşê kér dîkin. Descartes rê dide bi Xwedê nebaweriya sedsalâ hîjdehan. □

Ji bo Evdalê Zeynikê

"Te dinyaye, te fanî ye
Welle mirin çêtir e ji feqîriyê"

Ji kilama Evdal

Der bihar e, kula dilan re lo bakî sar tê
Ew kilama te çandî çend sal e, guhê min de
Lap ewrekî reş e li ser me feqîr bûn
Ma mirin çêtir e ji feqîriyê Evdalo!...

Pez çûn qulipîn çiya ye han ha ha haa!...
Bizinek dikale rex hemberî
Dayika pîr nan davê ser sêlê sor dike
Qotek toraq hilde rê keve Temo lawo
Miran çêtir e ji feqîriyê bawer ke...

Refek qulung tê wer binere Evdalo
Per û baskên xwe weşandin
Çavê xwe de, çavê xwe de
Hemêz ke ronkayî ye, hemêz ke bextê te de me
Feqîrbûna me ji korbûnê ye pismamo!...

Sal pey salan diçin
Feqîrbûn ewrekî reş e li ser me, bi me re
Ji çavkaniya han avekê vexwe, Temo lawo
Pez çûn qulipîn çiyaye han ha ha haa!...

VEYSEL ÇAMLIBEL

Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê

Beş: 4



MEHMED UZUN

Serpêhatiya Kevokê ku ew ê paşê ji dê û bavê xwe, bi kitekit, hîn bibe, weha dest pê dike. Bi welatê xerîbî yê mirinê, bi tav û germê, bi qûm û çolê.

Baz; zarokê mirinê.

Kevok; zaroka sîrgûnê.

Niha?

Niha jî em vejerin bajarê mezin, payitextê Welatê Fireh, warê General Serdar. He ta niha em li dora serpêhatiyên koman bûn, niha em ruyê xwe ber bi kesan bikin û vejerin dilê welêt û herin Salona Zabîtan û hinekî din nêzîkî li Baz bikin. İro, vê êvara çıksayı ya payizekê, Baz dizewice. Ji navbera wan rojêن yekemîn ên cûntayê, koç, çûyin û hatinên germ û iro, bi qasî deh salan derbas bûne. Bazê ku di wan rojan de, mîna tegmen dest bi jiyana zabîtiyê kiribû, niha bûye serhengekî navdar. Baz bilind bûye, nişanên wî zêde bûne, hatina wî zêdetir bûye. Ü ya herî girîng Baz qîsmek ji xewn û xeyalên xwe bi cîh anîne, yên mane bi cîh tîne, di armanc û he defen xwe yên jiyanê de, pengav bi pengav, bi ser dikeve. Vê êvarê, di Salona Zabîtan a payitextê Welatê Fireh de, Baz gaveke nû davêje û dizewice. Bi keçikeke hinekî gulover, porzer, gerdengewher, çavşîn, spehî û rûken re, -ku em jê re bibêjin Xanima Baz. Bi tenê Xanima Baz a porzer.

Êvarê dest pê kiriye. Mêvanên vexwandî ku hema ci bigire hemû zabit û malba-

tên wan in, hatine. Salona Zabitan a germ di nav ronahiya elektirîkê de dibiriqe. Her aliyê salonê, bi sûret, kaxizên zêrhêlî, stêrên zîvhêlî hatiye neqîşandin. Orkestra leşkerî ku hertim marşen leşkerî lêdixe, niha, li kêleka pîsta dansê, li müsîkeke nerm dixe. Li salona modern, bi qasî cil maseyên fireh û gulover, li gora dûzana dawetê, hatine danîn. Mase, hema ci bigire, tijh bûne. Mêvan, di nav kincêن sivil ên paqij û nû de, li kêlekên maseyan rûniştine û şîva êvarê dixwin. Zava û bûk, yanî Baz û Xanima Porzer ku niha, pişti bîskekê, gava mehra wan hate birîn, wê bibe xanima Baz, li dora maseyeke bicûktir, li kêleka pîsta dansê, hinekî ji okstrayê dûr, bi tena serê xwe rûniştine û xwarina xwe dixwin.

Her tiş temam e, tu kêmanî nîn e. Salona ronî û germ, xwarin û vexwarinên herî baş, baştîrin okestraya hemû ordiyê, müsîkeke nerm û spehî, raxistin û neqşen bedew, pergaleke bi rêk û pêk, mêvanen bijarte yên hemû welêt, ahengeke yekta, germahî û xweşiya kêf, henek û hevaltiyê... her tiş, vê êvarê, temam e. Bi tenê kêmaniyekê heye; General Serdar. General Serdar nehatiye, lê wî xeber şandiye ku ew ê derengê êvarê were. General Serdar ê jî were! Baz kîfxweş e. Baz mesûd, bextiyar, serbilind û serfiraz e; bi coş û bi heyecan e. Baz rûpeleke nû ya jiyana xwe vedike. Ew jiyana xwe bi birarziya zabîtê simbêlqît ku hertim, mîna bavekî, li Baz xwedî derketibû, dike yek. Ji vê êvarê pê ve, êdî nav, bejn û bal, tâhîm û reng, rabûn û rûniştina yeka din jî dê di nav rûpelên jiyana Baz de hebe. Jiyana wî dê êdî bibe jiyanâ du kesan.

Taximekî kincên reş li Baz e. Îşligekî spî û kirawateke sor a xalxalî di stûyê wî de ye. Solêن wî yên nû yên reş dibiriqin. Rûyê wî yê kurkîrî dibiriqe. Bîbikên çavên wî yên bicûk dibiriqin. Bûk, di nav cil û bergên çîkî spî yên bûkiyê de, li kêleka Baz rûniştîye, di bin çavan re, bi ken, li Baz û li der û dorê dinihêre. Umrê wê ne zêdeyi bîhist û yek, bîhist û duduyan e. Herçî Baz e, gîhiştiye sîhan. Destpêka jiyanâ zabitiyê, ew rojêن xeşîmiyê, salêن hînbûnê li pey mane. Niha Baz, zabîtekî zane, têgihîştî, pêbawer û xwedanberpirsiyari ye. Niha Baz, êdî ne şagirt, lê hoste ye. Ü niha, di heyama xwe ya kamil de, Baz dizewice.

Ji kîfxweşî, heyecan û westa çend rojan a haziriya dawetê, Baz nikare şîva li ber xwe bixwe. Ew, carina, tikeyekî goşt dibe devê xwe, hêdî hêdî dicû û dadiqultîne, li dora xwe dinihêre û difikire. Kesên ku hatine ezimandin, zabît û kesên girîng ên ordî û dewletê ne. General, amiral, kumandar, serheng, zabîten giregir hatine. Di nav wan de amîr, kumandar û serbazên Baz jî hene. Hatina wan, tiştekî nişan dide; Baz bi ser ketiye, bi ser dikeve.

Li jorê pîsta dansê, li ser okestrayê, bi herfîn mezin û zer li ser cawekî sor ê fireh

û dirêj, "pîroz be" hatiye nivisîn. Belê, pîroz be... lawikê sêwî, kesê bêkes, pîroz be, Baz difikire. Ev gotin nişan didin ku Baz tê hezkirin, Baz, endamekî bijarte yê malbara mezin, yanî ordiyê ye. Û di ser cawê sor û zer re ji wêneyeke mezin a General Serdar ku bi destê resamekî hatiye çekirin, hilawestî ye. General Serdar, ji wit, bi çavêن xwe yên nêrevanan, bi awirê xwe yê tûj, bi simbêlen xwe yên boq, li salonê û Baz dînihêre. General Serdar; welatparêzê herî mezin, xelaskar û rizgarê welêt; rêber û serdarê welêt; kumandarê mezin, sermiyanê welat, dewlet û miler. General Serdar; bavê manewî yê Baz; stêr û heyva şevêن wî, tava rojêن wî, rêberê jiyana wî. Ü General Serdar ê were û şerefê bide wî û daweta wî...

Belê, rûpeleke nû... Baz her tişt kir, her xwesteka xwe bi cîh anî, hemû xewn û xeyalên xwe, yek bi yek, li dar xist. Niha rûpeleke nû vedibe. Na, venabe, ya nû li rûpelên ku heta niha hatine jiyîn, zêde dibe. Rûpela çi? Rûpelên jiyana wî zahf in; rûpela leşkerî û zabîtiyê, rûpela hevaltî û dostiyê, rûpela kêf û henekê, rûpela xwarin û vexvarinê, rûpela jiyana civakî, rûpela egidî û mîraniyê... Lê ya nû? Ya nû li çi zêde dibe? Keç û jin, li rûpela keç û jinan. Li rûpela herî girîng, herî rengîn a jiyana wî.

Di rojêن wî yên tarî yên zaroktî û xortiyê de, xewn û xeyalên wî, pirtirîn, li ser keç û jinan bûn. Jin, her û her jin. Berî her tiştî dê; dayikeke dilgerm, dilpak û şef-qertiijî ku hembêza xwe jê re vekira, bang bikirayê, ew bixista hembêza xwe û di nav pêşîrên xwe de bihewanda. Wî, hîs, heş, dil, mîjî û jiyana wî dayikek diviya. Paşê ji xwehek, hekek, hevaled, yarek, hezkarek. Lê jin. Ji bo wî, ji bo mîraniya wî ya ku hişyar dibû, jiyana wî ya mîr, dinya wî ya mîr jin diviya. Ew salên wî yên Akademiya Leşkerî, yekcar, salên şewat û xezebê yên xeyalên keç û jinan bûn; salên xedar ên hişyarbûna bedenê, salên daxwazên bêpayan ên keç û jinan bûn. Belê, ew sal, salên serfirazî, serbilindahî û biserketinê bûn ji. Baz, di wan salan de bû Baz. Wan salan riya iro, vê êvarê, li ber wî vekir. Lê li milê din ji, şevêن dirêj ên bêhej-mar ên wan salan nedihatîn kişandin. Her şevekê, bi serê xwe, jiyaneke dûjehê bû. Ew şev, ew şevêن sar ên tenêtiyê. Umrekî ciwan, bedeneke xort û ew şevêن tarî û vala. Jiyana Akademiyyê, der û dora Baz û şevêن wî, bi tenê, ya mîran bûn. Hevalên wî, xwendevanên ku pê re dixwendin, serzabîtên wî, mamoste û kumandarên wî, aşxane, dersxane, serşok, salona razanê, hemû, mîr bûn, ji her derî, bi tenê bîhna mîran dihat. Lê wî jin diviya, jin, jin...

Baz bi xeyalên jinan dikete xew, bi xewnêن jinan hişyar dibû; porê wan ê dirêj, rûyê wan ê vekiri, çavêن wan ên nerm û germ, lêvên wan ên ku ji şekirên hemû cîhanê şîrintir, gerdana wan, stûyê wan ê dirêj, pêşîr û memikên wan, sermemikên

wan ên qahweyî, celebêن pêşîran; mezin, biçûk, dakerî, vekişiyayî, gulover, zik û berzikê wan, berzik; daristaneke biçûk ku seqêن mîna kevanê vekişiyayî diniqışandin, der û dorêن qelişekan dixemilandin, reşahiya berzikê, navenda xewn û xeyalên Baz, cihê ku fantaziyêن Baz tê de winda dibûn, warê tarî ku Baz bi hesreta wê dîmir, hêtêن gulover, seqêن mîna sitûn û bedenêن jinan ên nerm û gewher... ev hemû aliyeñ wan ên spehî ku şox û şengêن jiyana însanî bûn. Ewana; jin. Jin; hebûna Baz, jiyana Baz. Baz li wan difikirî, her û her, li her cih û warî. Nemaze, êvaran, nîvê şevan. Destê wî di nav seqêن wî de, tilî li ser "serbilindahiya wî", çavêن wî girtî, ew li seqêن cûrecûr ên jinan difikirî. Wi seq ji hev dikirin, li navenda seqan dinihêrî û paşê dikete navê, pêşî bi qasî tiliyekê, paşê bi qasî bihustekê, paşê ew bi xwe hemû bedena wî, hemû hebûna wî. Ü hingî dest û tiliyêن wî şil dibûn, aveke tîr di nav tilî û pêçiyêن wî re diherikîn. Carekê, du caran, sê caran, carina çar caran. Berî razonê, berî rabûnê, di serşokê de, li avdestxanan, li her cihê ku wî keys didît. Gav bi gav hemû Akademî bi avika wî ya bêdawîn dihate avdan.

Piştî Akademiyê û salêن xwendinê, rê li Baz vebû ku ew hemû xewn, xeyal û fantaziyêن xwe bi cih bîne. Edî wext, wexta ceribandin, tahmandin û jiyînê bû. Wî êdî dikaribû serê hespê fantaziyêن xwe berde û di meydana şehwetê de xar bide. Wî welê kir; keç nasîn, jin nasîn, beden nasîn, texlîd bi texlîd daristanêن tarî nasîn, celebêن memik, qelfîsek û quł nasîn; çav û lêv nasîn; deng, axîn û nalînêن şehwetê yên têkel nasîn. Evêن wî yên şewat û xezeba dûjehê qulipîn ser şevên hûnik ên bi-huştê. Tenêti xelas bû. Ev, hew sar û tenê bûn. Hertim, her car, gava Baz bixwesta, wî dikaribû ji nav çar, pênc, şes keç û jinan yekê hilbijêre û bang wê bike. Li her alî û taxêن payitextê ku Baz li wir, li Qerergahê Bilind ê Ordiyê dixebeitî, hevalên wî yên jin hebûn. Niha, gava ew tikeyeke goşt di devê xwe de dicû û qedeha xwe ya cîn-tonîkê dibe devê xwe û li jina xwe ya rojêن bê dînihêre, ew li wan dost û hevalên xwe yên rojêن rabirdû difikire.

Keçikeke porzer a xwendevan hebû. Dirêj, xama, lihevhatî û çavmezin. Gava keçik, danê êvarê, ji unîwersîtê derdiket, Baz, li wir, bi kincêن leşkerî, li ber deriyê geleki mezin ê unîwersîtê, li benda wê bû. Keçik dikete otomobîla sîvîl a Baz û ew, hêdî hêdî, bi hev re ber bi mala Baz diçûn. Mala Baz li kêleka çemê mezin ê ku di bajêr re diherikî, li devereki leşkerî bû. Apartimanêن sîteya leşkerî bi donzdeh qatan lê bûbûn û qata apartimana ku Baz lê dijiya, qata yanzdehan bû. Ji wir hemû bajar, çemê nazenîn ku bi şewqêن şevê dibiriqî, otomobilên cade û kolanan, lam-payêن bêhejmar ên bajêr, hemû, dixuyan. Baz keçik, heftê du caran, didît. Her car a ku wî keçik didît, jê re derpê û kirasêن hewreşimi yên neqîşandî dikirîn. Gava

ew digihîştin malê, Baz demança xwe ya smith-welson û kincên xwe yên leşkerî ji xwe dikirin, cil û bergên keçikê jê dikirin, ew tâhzî dikir û bi destê xwe, derpê û kirasen nû lê dikirin û paşê wan, bi wodka yan jî cîn û tonîkê, dest bi êvarê dikirin. Di wan şevan de, kêfa Baz bêpayan bû; wî cil û berg ji keçikê dikirin, kiras û derpê jê dikirin û ew tâhzî dikir û lê dînihêrî, bi dedîqeyan, bi saetan. Vê yekê kela Baz radikir, kêfxweşî û şehweteke nedîti didayê û bi wê kêfxweşiyê, wî, bedena keçikê, sir û sihêrên bedena wê, ji nû ve, keşf dikir. Car bi car, bi kîliyên dirêj. Û Baz, bi avika xwe ya tîr, keçik, sir û siherên wê yên veşartî û hemû bedena wê av dida.

Rojekê jî Baz li vê salona ku ew niha tê de bûn, jinikeke navsal a hinekî reşik na-sî. Jinik, tevî hinên din, li maseyeke dûr rûdinişt. Danê êvarê bû, Baz ji kar derketi bû, li wir, bi tena serê xwe, li ber pencera mezin a aliyê bexçê rûniştibû, li darêne be-xçê dînihêrî û wodkayeke sar a bi leyemon vedixwar. Welê dixuya ku jinikê, beriya wî, ew dîtribû. Jiber ku gava çavê wî bi jinikê ket, çavên jinikê yên kilkirî lê bûn. Bi awirekî heweskar, bi çavên kentijî û nêrîneke dawetkar. Bazê ku serê hespê xwe berdabû û li pey nêçirê bû, ev fersend nerevand. Dûmahîka wê nêrînê diyar bû; ew bûn heval. Jinik, hosteya şixulê xwe bû, di şevê zêrhêlî yên payitextê Welatê Mezin de, dest, tilî û zimanê jinikê hemû bedena Baz a xeşîm, dest bi dest,bihust bi bihurst, terbiye kir. Tiliyên jinikê bûn merhem, zimanê wê bû derman û bedena wê ya hinekî gulover bû kahniya nalîna şehwetê. Bazê ku hê di hunera hez û hezkirinê de şagirt bû, bi henek û lîstikên jina zane û xwedantecrube, di demeke kurt de, bû hoste. Belê, jinikê bi karê xwe dizanîbû; wê Baz, hemû bedena wî, can û ruhê wî radikêşand hundirê xwe û bernedida çilkeke avika Baz vala here. Bazê ku hertim der û dor av dida, êdî bûbû hesîrê jinikê: Jinikê hemû avika wî dadiqultand. Pêşî wan heftê carekê hevûdu diditîn, paşê bû du caran, paşê sisê û demekê hat, êdî jinik, hema ci bigire, her şev dihate mala Baz. Gava dengê zîlê du caran, tîz, li ser hev, lêdiket, hingî Baz dizanîbû ku jinik li ber derî ye. "Ez hatim zabîtê xwe yê çeleng bixwim", wê digot û bêyî gotinên zêde, dest bi karê xwe dikir. Bi dû demekê re, jinikê hevaleke xwe ku hinekî jê kintir û qelewtir bû, bi xwe re anî. Èvarekê, gava Baz deriyê malê vekir, du jin li ber derî bûn. "Em hatin zabîtê xwe yê çeleng bixwin" jinikê got û herdu ketin hundir. Ew bûn du jin. Du jinên ku bi kar û şixulê xwe dizanîbûn. Tu îtirazên Baz ji vê yekê re nîn bû; wî xwe û bedena xwe teslimî tilî, dest û zimanên jinên hunermend dikir. Ew di hembêza jinan de, ji xwe ve diçû û diket nav xewa kûr. Pişti salek û nîvê, gava Baz, bi hêncera hin karên nehî-nî, çû Welatê Derya yê Welatê Fireh, Baz ji xewa nerm, germ û kûr hişyar bû. Lê xew, ne xirab bû, ji bervajiyê, mîna vê êvarê, xeweke geş bû!

Carekê ji, Baz, dîsan, keçikeke bejndirêj û xwende nas kir. Keçika esmer û xweşilihevhati ji Welatê Çiyan bû û tevî ku ew xwende bû, pir baş bi zimanê Baz nizanîbû û bi devokeke jihevkeri dipeyivî. Lê stranên wê geleki xweş bûn. Ew di nav cîhê peregende yê Baz de, tazî, rûdinişt û ji Baz re stran digotin. Baz ji geh cixare, geh qedeха vodkayê di destan de, geh di hembêza wê de, geh li ser cîhan dirêjbûyi, lê guhdarî dikir. Stranên basid, şen û geş ew kêfxweş dikir. Keçik neçar bû, bi bûrseke dewletê dixwend. Loma ji Baz, carina, perene hindik dida keçikê. Di demeke kurt de, keçik, bi her awayî, bi her tişte xwe, bi Baz hate girêdan. Baz her tişte ku wî dixwest, difikirî, xeyal dikir, bi keçikê re dikir. Tişte ku Baz herî zêde jê hez dikir, girêdana keçikê bû. Baz ew carina dernixûn, carina serpiştê, tazî, radizand, dest û piyêن wê, bi hesinêن koşeyên textê razanê ve girêdida û pê her tişt dikir. Piştî demekî, keçik bi xwe ji hînî vê leyistokê bû, êdî keçik bi xwe diçû oda razanê, xwe ta-zî dikir, li ser textê Baz dirêj dibû, destêن xwe dirêj dikir û li hêviya Baz disekinî.

Ev macera hanê ji bi qasî salekê dewam kir, -ta ku keçik ji ber neçariyê, dev ji xwendinê berda û vegeriya welatê xwe.

Keç û jin... hîn çendîn keç û jinên din...

Lê di nav wan hemûyan de ya herî dildar, qîmetdar û hêja, ya kerxana payitext bû. Baz jê re digot "Mader." Mader; qelew, gulover, dirêj û pêşîrmезin. Hêtfireh, nuktedan û germ. Ü nerm û kûr. Hertim çav, lêv û dev boyaxkirî. Desrpêka sala yekemîn a Akademyê, dawiya hefteyekê, gava Baz û hevalên wî yêن Akademyê, derketin bajêr, Baz li kerxanê Mader nas kir. Baz û hevalên wî bi kincêن resmî derketibûn bajêr. Ne kincêن sivîl ên Baz hebûn ne ji pereyêن wî yêن pir. Lê hevalekî wî ku kurê zabîtekî nas bû, hertim digihîş hawara wî. Ew bi hev re diçûn mala hevalê wî. Li wir wan kincêن sivîl li xwe dikirin û hingî dadiketin bajêr. Kincêن hevalê Baz li Baz dihatin. Wi kincêن hevalê xwe, ji bo rojekê, li xwe dikir û derdiket keşfîn nû yêن li bajêr.

Hingî, rojek ji wan rojêن tatîlê, Baz Mader keşf kir. Na, ne Baz, lê Maderê Baz keşf kir. Baz û hevalê wî, bi hev re, çûbûn cîhê ku wan her cara ku dadiketin bajêr, ziyaret dikirin; kerxane. Mader li ber deriyekî rawestabû û li şeniyêن ku di ber derî re diçûn û dihatin, dînihîrî. Gava çavê wê bi Baz ket, tafilê wê bang Baz kir. Baz pê re çû oda Maderê ya biçûk ku di nav hilmeke giran de bû. Desrpêka pêwendiya wan a dirêj weha hate pê. Roj bi roj, hefte bi hefte, Baz bi Maderê ve hate girêdan. Piştî ku Baz çîroka jiyana xwe, bi qasî ku wî pê dizanîbû, ji Maderê re, bi detay, got, Mader jê re bû jin, bû dost, bû heval, bû hogir û bû dê. Maderê êdî digot, "wore, lawê min ê sêwî yê çeleng" û Baz dikişand ser xwe, serê wî dikir nav memi-

kên xwe û bedena wî diguvişand. Carina, piştî coşa hezkirinê, bi qasî kîliyekê, Baz li oda Maderê ku bi lampayên loş ên sor hinekî ronî dibû û jê hertim bîhna parfumên erzan, xwîdan û hezkirinê dihat, di hembêza Maderê de, (carina jî di nav şe-
qan de) di xew re diçû. Ew kîliyên xewê, ji bo Baz, kurte-demêni bihuştê bûn. Mi-
na civikeke biçûk ku nû, sakîn, bêperwaz û sivik, bi firê bikeve, Baz dikete nava xe-
weke hûnik a sivik. Ew bîhna mîz, avik, xwîdan û hezkirinê mîna bîhna misk û
emberê bi difnê Baz diket. Piştî demekê Maderê hew pere ji Baz girtin. Dawiya da-
wîn jî wê dest pê kir û pere dane Baz. Yar, dost, heval, jin û diya ku Baz li pey bû,
wî li kerxana payitextê Welatê Fireh peyda kir. Û ji roja yekemîn heta vê êvarê, pê-
wendiya wan a germ û samîmi dewam dike û ew ê her û her dewam bike. Hemû
jinêni ku Baz nasîbûn li milekî, Mader li milekî. Mader; hevala sêwiyan, yara kesen
tenê, pardara siûdêne neçar. Di rojêni teng de, Mader li Baz xwedî derket. Di rojêni
ronî de jî Baz ê li Maderê xwedî derkeve.

Tevî ku Baz vê êvarê dizewice.

Jin; jiyan, xwediyên jiyanê, sebeba jiyanê, hebûna jiyanê, garantiya jiyanê. Keç û
jinêni Baz. Sebebêne hebûn û jiyanâ wî. Tevî ku ew vê êvarê dizewice, keç û jin ê
hertim sebebêne hebûn û jiyanâ wî bin.

Baz li dora xwe, xanimêni ku vê êvarê hatine, dinihêre. Xanim ji peyayan zêde ne.
Xanim ji peyayan zêdetir bala xwe didin ser kîf û henekê, dawet û dîlanê. Xanima
Porzer ku niha li kêleka wî rûniştiye, bi üsil, çavêni xwe kil, lêvên xwe sor kirine.
Piştî demekê, işev, Baz ê van lêvên qelew bike devê xwe û wan bimêje. Ev lêv, ev
beden, ev keça xama dê ya wî be. Baz dilopên dawîn ên cîn-tonîkê jî vedixwe û hi-
nekî esebî, "xwarina van jî tu carî naqede" dibêje.

"Dawet e", Xanima Porzer, bi ken, dibêje, "şeva kîf û şahiyê ye. Leza te ji bo ci
ye?"

Baz jî gotinêni wê hinekî eciz dibe, lê dengê xwe nake. Bi destan, ew bang yek ji
garsonêni ku di navbera maseyan de derin û têni dike û jê cîn-tonîkeke nû dixwaze.
Gelo ev gava ku ew niha davêje, di cîh de ye? Ev keça ku niha li kêleka wî rûnişti-
ye, dê bikaribe wî fahm bike, jê re bibe piştî û bi ya wî bike? Maderê jê re gotibû,
"lawê min ê sêwi, baş bifikire, zewaq qeyd e, heke carekê lingêni te ketinê, hingî jê
xelas bûyin, gelekî zehmet e. Baş bifikire." Gelo ew baş fikiribû? Baz nikare iddia
bike ku ew vê keçika ku li kêlekê rûdine, zahf baş dinase. Belê, keçik biraziya Zabî-
tê Simbêlqît e. Belê, bavê keçikê jî zabît e û keçik bi terbiya leskeran perwerde bû-
ye. Belê, Baz ew, car bi car, li mala Zabîtê Simbêlqît, li vê salonê, li hin der û dorêni
din ditiye, pê re bi dirêjahiya seatan peyiviye, gelek caran bi hev re çûne sînemayê,

bi gotinêñ germ nêzîkî lê kiriye, bi destê wê girtiye û ew biriye li park, bexçe û parîzen payitext gerandiye, ew hembêz kiriye, ramûsaye. Keçikê jî jê rû banedaye, ji bervajiyê, bi kêfxweşî, nêzîkî lê kiriye û ew xwestiye. Lê ev têri zewacê dike?

Zimanê wê yê şêrîn, gotinêñ wê yên lihevhatî, zanîn û têgihîştina wê, adet û terbiya wê, lixwekirin û bal û bejna wê, rûgeşıya wê, ji kêf û henekê hezkirina wê, ev hemû aliyên wê bi dilê Baz in. Lê li milê din, pesn û fortêñ wê, maxrûrî û jixwera-zîbûna wê, destgirtî û çikosiya wê, hezkirina wê ya mal û milk, zér û pere û hin aliyên din ên weha ne bi dilê Baz in. Çavê wê hertim li pey mal û milk, zér û yadîgaran e. Her cara ku Baz û wê hevûdu dîtine, wê bi tevgerên xwe, bi Baz daye zanîn ku ew yadîgarên giranbuha dixwaze. Ü her cara ku Baz xwestiye, jê re, behsa kar û şixulê xwe bike, wê babet guhertiye û anîye ser mal, milk, pere, xanî, otomobil, ger, geşt û seyran, xwarin, vexwarin, lixwekirin, cil û berg, parfum û bîhn. Wê hertim xwestiye bala Baz bikişîne ser van tiştan. Loma, heta niha jî Baz, hertim, xwe dudîlî hîs dike. Hertim dilê wî bi sâzenî hildavê, hertim di heşê wî de şik hene. Gelo? Dîsan gelo?

Lê, Zabîtê simbêlqît ku pir dixwest ku ev zewac were pê, Baz îkna kir û ew xiste ser riya zewacê. Evarekê, em ê bibêjin, berî vê êvara zewacê bi qasî şes mehan, gava Baz, ji bo serîdanê, çû mala Zabîtê simbêlqît, piştî şîvê, Zabît Baz xewle kir û pê re li ser zewacê peyivî. Gotina dawîn a Zabîtê simbêlqît hê niha jî, baş tê bîra Baz; "kurê min, êdî dev ji vê jiyana peregende, jin û keçen serserî berde. Bes e. Ma kê binê wan qul û kûrahiyên tarî yên jinan dîtiye ku tu jî bibînî? Bêbinî ye, dawî nin e. Bes e. Bizewice, bibe xwedî mal, dezge, dûzan, zarok... û ji bîr meke, di ordiyê de şertê yekemîn ê biserketinê dûzan û disiplîn e, jiyana mal û malbatî ye." Bêguman, gelek sebebêñ din jî hebûn, lê di biryara Baz de van gotinêñ dawîn ên Zabîtê simbêlqît gelek tesîr lê kîrin.

Baz dizanîbû ku Zabîtê simbêlqît ku bi xwe kurdûnde bû, êdî ji ordiyê teqawît bûbû û tevî jina xwe ya hurme jiyanekî basîd û girtî dibuhurand, mîna laweki xwe, ji Baz hez dikir û gelek dixwest ku Baz bi biraziya wî re bizewice. Zabîtê simbêlqît ku hertim, ji zaroktiyê heta niha, li Baz xwedî derketibû, hertim ew pirsibû, alikariya wî kiribû, rê li ber Baz rast kiribû û riya leşkerî û ordiyê jê re vekiribû, li ber dilê Baz gelekî hêja bû. Baz, bi rêz û rêzdari, li gotina Zabît guhdarî dikir. Di mesela zewacê de jî wî wele kir; li ser gotinêñ Zabîtê simbêlqît fikirî û paşê jî biryara xwe da û herweha ew gîhiştin vê êvarê.

Vê êvarê Xanîma Porzer di nav cil û bergên bûkitiyê yên spî de, ji her carî zêdetir, balkêş û xweşik dixuye. Rû, ten û bedena wê ya gewr, vê êvarê, di bin şewqa

lampayêñ krîstal de hîn gewrtir dixuye. Bi hêdîka, ew ji qedeha ber xwe ya şaraba spî vedixwe û gotin bi gotin dipeyive. Ew kêm dipeyive, di jor re li der û dora xwe dînihêre, hertim di navbera wê û kesên din, bûyerên din, pêwendiyêñ din de mesafe heye. Hertim ferq di navbera wê û der û dorê de heye, mîna ku ew pir paqij, der û dor pir gemarî be. Gava ew dipeyive, hingî gotinêñ wê, mîna gotinêñ ayetekê, giran in. Gotinêñ wê yên bijarte û giran, ji ber awirê wê yê sakîn û sar, nêrîna wê ya maxrûr, tesîr li merivan dike. Lê belê, Baz, leşkerê bêtirs, zabîtê mahîr û însanê sebirdar ji bi karê xwe dizane; gava Baz cil û bergêñ wê jê kirin, ew tazî kir, di nav cihan de, bi dest, tilî û zimanê xwe, bedena wê ya gewher vegirt û xwe gîhand kûrahiyêñ dil û bedena wê, hingî ne ev maxrûrî, mesafe û ferq ê bimîne, ne ji awirê sar û gotinêñ lihevhâti lê vala û pûç ên giran. Ev keça nazenîn û jîxwerazî hê Baz baş nas nake, ev keça zane lê saf ê bibîne ka dinya, jiyan ci ye...

"Noş", Baz qedeha xwe ya nû ber bi qedeha wê dike û dibêje, "noş ji bo te, me, zewaca me û jiyana me..." Xanima Porzer, bi kîfxweşî dibêje "noş", bi zanîn, dest û piyêñ xwe ji normalê zêdetir li ba dike da ku zér û zînetên dest, pî û gerdanê şewq bidin û bi hêdîka, hemû şaraba qedehê vedixwe.

Xwarin qediyyaye, tevgereke piştî xwarinê ketiye nav salonê, şeniyêñ maseyan radibin, derin û têñ. Orkestra niha müsikeke hîn xurttir lêdixe. Mêr û jinine ciwan rabûne, li pîsta dansê, bi hêdîka xwe dilivînin. Garson di navbera maseyan de dilezînin û vexwarinêñ têkel bi mîvanan digihînin. Di nav çûyin û hatina mîvanan de komeke însan ber bi maseya Baz û Xanima Porzer têñ. Zabîtê simbêlqît, jîna wî, bav û diya Xanima Porzer û çend kesên din. Gava Zabîtê simbêlqît û koma wî diğêhîn masê, "êdî wext hat", ew, bi rûyekî kentijî û geşbîn, dibêje, "walî, serekê belediyê hatine, mehra we dê bê birîn..." Baz û Xanima Porzer ji cîhê xwe radibin û berî ku Baz bikeve milê Xanimê, Zabîtê simbêlqît dilezîne, tê navbera wan, dikeve milîn wan û wan ber bi aliyê din ê pîsta dansê dibe. Mehra wan ê li wir, li kîleka maseyekê gelekî dirêj, tevî mîvan û şahîdan bête birîn.

Şahîdê zewacê yê Baz, Zabîtê simbêlqît, mamê Xanima Porzer e. Yê Xanîmê ji waliyê leşkerî yê payitexta welêt e. Ew hemû li wir, yek bi yek, hevûdu hembêz û pîroz dîkin û li kîleka masê rûdinin. Serekê belediyê ku generalekî nas e, dê mehra wan bibire. Baz, li ser rûyê wî keneke geş, serê wî bi qedehêñ cîn-tonikê xweş, li dora xwe dînihêre. Ew roj, ew êvar, ew saer û dema ku Baz gelekî lê fikiriye û hema ci bigire bi serê her benî ademî tê, niha hatiye; zewac. Her tişte ku Baz dil dikir, niha, li nik wî ye, her kesê ku wî dixwest hebûya, hatiye. Zabîtê simbêlqît ku jê re bavîti kiriye li vir e. Bavê Xanima Porzer ê zabît û diya wê ya bêdeng ku niha wê

bibin xezûr û xwesiya Baz, li vir in. Walî û serekê belediyê, ev herdu generalên navdar ku hertim ji bo Baz bûne tîmsala xurtî, mîranî û welatparêziyê, li vir in. Serba-zên Baz ku her pişt dane Baz, lê alî derkerine, li vir in. Heval, dost û nasêñ wî yên din ên binemala mezin, yanî ordiyê li vir in. Mezinahî, serbilindahî, hêz û quweta dewlet û ordiyê li vir e. Kêf, henek, bîhn û jin li vir in. Ü hevala wî ya pêşerojê, man û nemanê, niha li kêleka wî ye.

"Belê" Baz dibêje, gava serekê belediyê jê dipirse ka ew Xanima Porzer, mîna bermalîya xwe qebûl dike, "belê, belê..."

"Belê, belê, belê..." Ü imze, çepik, maç, hembêz û pîrozbahî.

Belê, piştî ku mehra Baz û Xanima Porzer ku êdî em ê, ji niha û pê ve, jê re bibê-jin Xanima Baz, tê birîn, bi deng û çepikan, musîk dîsan dest pê dike. Baz û Xanima wî dest bi dansa yekemîn a zewacê dîkin. Bi tenê, di navenda pîstê de, bi dengê şenîyan, bi ahenga çepikan. Welê dixuye ku bextiyarî û mesûdî ev e. Baz, ji mesûdî û vexwarinê serxwêş, li dora xwe, bêdûzan, bêyî ku heşê wî li ser ahenga musîk be, bi hêdîka, çerx dibe. Şewqa lampeyan li rû û çavêñ wî dixe, dengê zêr û zînetên Xanima wî, mîna dengê şalûl û bilbilan bi guhê wî dikeve û dengê çepikan wî, bi temamî, sermest dike. Dengê çepikan; nîrdevaneke dirêj û bilind, ber bi esmanan. Nîrdevana qehîm, têkûz û bilind a jiyan, dewlet û ordiyê, Baz pêpilikên nîrdevanê, yek bi yek, gav dike û ber bi jor dibe. Baz hildikişê, di nav dengê boş ê çepikan de, hildikeşê jor, qata herî bilind û ji wir li girseyêñ çepikkêşan, bi ken, bi maxrûri, dînihêre.

Baz tî dibe, dixwaze, bêrawest, vexwe. Ew derin û li cihê xwe rûdinin. Ü hingî pîrozbahiya mezin û esasî dest pê dike. Mêvan, yek bi yek, kom bi kom, qor bi qor, têr, Baz û Xanima wî radîmûsin, hembêz dikin, yadîgarekê didin wan û vedigerin maseyêñ xwe. Yek, dido, sisê, pênc, dch, bihîst, sîh, cil, pênce, sed, sed û pênce, du sed... Bi kêmanî du sed ramûsandin, hembêz, bi kêmanî bi hezaran gotinên pîrozbahî yên mîna hev, bi kêmani hezar caran rabûn û rûniştin. Bi sedan rûyên cihê yên têvel, bedenên cûrecûr, dengê newekhev. Ü di navberê de, bi qasî ku Baz keysê dibîne, ew hin qedehêñ cîn-tonîkê vedixwe. Baz sersem, sermest û serxwêş e. Xanima Baz westiyayî lê kêfxwêş e; dest, pêçî, pî, sîng û ber, gerdana wê, niha, tijî, zêr in. Ji niha ve, wê bi qasî umrekî zêr berhev kirine. Xanima Baz dikene, perwa-zên wê nîn in ku pê bifire.

Êvar diqulipe ser şevê. Şev û westa şevê perda xwe berdide Salona Zabitan. Kê-sên ku dans dikin, kêm bûne, müsîk giran e. Hin mase vala bûne, mîvan, hêdî hedî, derin. "Ev şev xelas bûya", Baz, serîgiran, difikire, "biqediya, herkes biçûya, ez

jî, em jî biçûna, min serê xwe bixista nav vê sîng, ber û gerdana gewher..." Lê hingî tevgereke xurt dikeve salonê, tiştek diqewime. Ji bîstan zêdetir zabîtên kincên resmî lê, dikevin Salonê û li der û dora salonê belav dibin. Walî û serekê belediyê û kesine din radibin û ber bi deriyê mezin ê salonê dibin. Baz ji tecrubeyên xwe yên bizavêن leşkerî dizane; tiştekî qîrîng diqewime. Zabitekî ji wan ên ku nû ketine salonê, tê nik Baz û bi hêdîka sedema lez û bezê, di guhê Baz de dibêje; General Serdar tê.

General Serdar tê!

Gotinêñ din hew têñ bîra Baz. Ew ber bi deriyê salonê dibezîne û dere li kêleka walî û serekê belediyê ratiweste. Lê xanim? Ka xanima wî? Serekê belediyê zabîtekî dişîne hundir da ku xanîmê bînin. Ü piştî kêliyekê şes otomobilên mercedes ên reş û mîna hev têñ, dikevin bexçê û li ber deriyê salonê ratiwestin. Bi qasî bihîst zabîtan ji otomobilan peya dibin û der û dora derî radipêçin. Paşê deriyê otomobila sisîyan a kerwana otomobilan vedibe û General Serdar peya dibe. General Serdar; bavê welêt, sermiyanê dewletê, pergala ordiyê; bejneke dirêj ê qehîm, simbêlên boq ên xurtiyê, awirê teyrêñ baz ê êriş û parastinê.

"General Serdar, General Serdar, tu her bijî!..." Çepik, qîrîn, qîjîn, rîzdarî. "General Serdar, tava welatê me, stêra esmanê me, General Serdar..."

General Serdar, li dorê girsa zabîtan, tê nik walî, serekê belediyê, Baz, Xanîma Baz, Zabîtê simbêlqit. Siya keneke zirav li ser rûyê wî, General Serdar Baz û Xanîma Baz pîroz dike û nîşaneke biçûk bi sîngêñ wan ve dike. Nîşan, nîşaneke zîvhîlî ya alaya sêrengîn a Welatê Fireh e. Paşê ew hemû bi hev re dikevin salonê. Gava General Serdar dikeve salonê, hemû şeniyên salonê dev ji sohbeta geş, kişandina ci-xarê û vexwarina qehwe, çay, konyak, vodka, vîskî, likorê berdidin, radibin ser piyan û li çepikan dixînin. Berdevkên General cih li jor, li kêleka Baz û Xanîma Baz nîşanî General didin, lê ew rûnane. Wî wext, ji bo rûniştinê, nîn e. Ew li pêş, girse li pey wî, kom li salonê dizivire. Ji aliyeke heta aliye din. Çepik berdewam in. Kes nikare nêzîkî General be, ew destê xwe nadî kesî, bi serê xwe, silavê dide şenîyan û bi destan silavê dişîne kesên dûrî xwe. Piştî ku kom dizivire û cardin digihîje ber devê deriyê mezin, hingî orkestra dest bi lêxistina marşa neteweyî ya Welêt dike. Herkes li piyan, sîng, serî û rû ber bi General, bi dengekî, bi aheng û gur, marşê dibêjin. Salon bi dengê tîz ê şeniyên salonê diheje. General, mîna heykelê xwe yên li meydana derve, bêlebat, li pê, di navenda şenîyan de rawestiyayî, çavêñ wî hinekî li jor, li marşê guhdarî dike.

Baz, bi dengekî gelekî berz, heta radeya qîrînê, marşê dibêje. Belê, Baz mensûbî

binemaleke weha têkûz e. Belê, ev binemal e ku welat û dewletê diparêze, yekitiya welêt li ser lingan pêdigire, miyeserî û pêşketinê direşîne ser gelê welêt. Belê, General Serdar e ku bi hebûna xwe, bûye temînata hebûna welat û dewletê. Baz, bi heyecaneke boş, bi coşeke bêpayan, diqîre; "welat, ji bo te can feda. Alaya rengîn, ji bo te, em heyran, xwîna me qurban... Serek, ey serek, bi can, bi dil, bi xwîn, em bi te re, ey serek..."

Pâşê serek General Serdar, dîsan, bi lez, vedigere, dikeve otomobilê û ji ber çavan winda dibe.

Êdî ci maye? Hîç. General Serdar ji hate şevê, bi hemû mezinahî û quwera xwe silav da şevê, şev rengand. Êdî herkes dikare, bi serfirazî, bi best û hesta ziyareta General, vegere mala xwe. Êdî şeva biserketî belav dibe. Hevalên Baz dil dikin zava û bûkê bibin û li bûlwarên ber devê çemê mezin ê bajêr, bi erebê, bigerfinin. Lê ne Baz ne ji Xanima wî vê yekê dixwaze. Mal, zûtirin wext mal, bi tenê Baz vê yekê dixwaze. Mala germ û heyecana vê şevê, perda duwemin a vê şevê ku dê li malê vebe.

Du hevalên Baz, zava û bûkê dixin otomobileke reş a leşkerî û wan dibil malê, mala ku nêzikî stêran e.

Mala germ... mala ku Baz, ji nû ve, ji bo işev, ji bo jiyanâ malbatî raxistiye. Mala fireh ku ji çar jûran hatiye pê, bi rîk û pêkî, hatiye raxistin. Tu kêmânî nîn e. Salôn, mitbax, serşok, odayê mîvan û razanê û têkber û firaqên wan hemû temam in. Herdu pencereyên fireh ên salona fireh li çemê ku niha bi ronahiya stêrên şevê diçirûse, dinihêrin. Di salona fireh de, tiştê yekemîn ku bala merivan dikişîne, portreyeyeke mezin a General Serdar e ku li diwarê mezin ê salonê hilawestî ye. Li diwarê din ê ji, li hember portreya General, alayeke mezin a rengîn û çend sûretên Baz ên leşkerî di nav çarçeweyên basid de, hilawestî ne. Li diwarê kêlekê yê devê mitbaxê, koleksiyoneke kêt, xençer û şûran di nav kalanên zîv û zêrhêlî de hilawestî ye. Piştî ku Baz çakêt û kirawata xwe ji xwe dike, bi qasî kêliyekê, ew li der, li çemê ronî mîze dike. Ronahiya stêran, şewqa pêtên ronî yên çêm li ser pencerê dibiri-qin. Baz hemû lampe pênextîne, hundir hinikî tarî ye. Xanim naxuyê. Baz li ma-seya biçük a ku li kêleka pencerê ye vedigere û di nav şûşeyên ser masê de li şûşa cînê digere. Baz şûşê dibîne, lê tonîk, şûşa tonîkê nikare bibîne. Baz nikare, niha, li tonîkê ji bigere. Ew qedehhekê tiji vodka û ava leymonê dike û bi carekê ve, qedehê heta nîvê vedixwe.

Xanima Baz, dest û rûyê xwe şuştî, pelerîn û lepikên spî yên cil û bergen bûkityê ji xwe kîrî, gulyîyen porê xwe yê dirêj berdayî, tê salonê. Di desten wê de, sêniyekê

bîcûk heye. Hinekî ji Baz dûr, ew sêniyê datîne ser masa salonê û bi ken li sêniyê dînihêre. Wê zér û zînetên ku îşev hatine dayinê, xistiye sêniyê. Gustîl, guhar, bâzîn, gerdanî, bronş, fer bi fer, cot bi cot, di sêniyê de dibiriqin.

"Were ba min", Baz, li ber pencerê, li pê, jê re dibêje. "Tu were" Xanim, bêyi ku li Baz binihêre, çavên wê li ser sermiyanêن xwe yên jiyanê, dibêje, "were, li van, xweşiya van binihêre." Baz ku ne li hêviya bersiveke weha bû, hinekî şas dibe, lê bêdeng, dere nik Xanimê. Hê jî bîhneke gelekî spehî ji Xanimê difûre. Lîvên wê yên sor, ji kêfa, dilivin. Çend dilop av di navbera memikên wê yên mezin re ber bi jêr dibin. Baz Xanimê ber bi xwe dikişne û destê xwe yê çepê dibe ser memikên wê. Xanima wî hinekî xwe dide alî, "na, ne îşev, ez, em gelekî westiyayî ne" dibêje.

Çawan ne îşev? Ma îşev ne şeva me ya pêşî ye? Çawan ne şeva gerdekê? Baz hinekî jê bi dûr dikeve û pir bi dîqet lê dînihêre. Ew dîsan dengê xwe nake, dere ber pencerê, radihêje qedeха xwe û vodkaya mayî, heta dawiyê, vedixwe. "Bes e êdî, te îşev zehf vexwar" Xanim, bi dengekî hinekî esebî, dibêje. Bêyi ku Baz bersivê bidiyê, ew qedeheke nû ya vodkayê tijî dike û dîsan hinekî jê vedixwe. Bi qasî demeke dirêj ew welê, Baz, çavêن wî li ser çirûsk û pêtên stêr û avê, Xanima wî, çavêن wê li ser çirûsk û pêtên zér û zînetan, radiwestin. Paşê, ji nişkekê ve, mîna ku ew ji xew hişyar be, Xanima wî dibêje, "de em razên, em gelekî westiyayî ne" û bêyi ku li benda Baz bisekine, berê xwe dide oda razanê. Lê li ber deriyê odê, ew radiweste, mîna ku wê tiştek ji bîr kiribe, vedigere û li salonê dînihêre. "Berê jî ez gelek caran hatibûm vê malê, lê hingî mal ne ya min bû" ew, çavêن wê li ser dîwaran, dibêje, "lê niha mal ya min e jî. Divê mala me, mala min û te be, ne garnîzoneke leşkerî, ez van tabloyan, kêr, xençer, dermançe û berîkan, tiştên leşkerî li malê naxwazim."

Baz, matbûyî, xwîna wî vekişiyâ, li jîna ku berî niha bi qasekî bû bermaliya wî, wê bibe hevala jiyanâ wî, dînihêre. Ci divê? Baz ci bike, ci bibêje?.. Ev jîna hanê ci dibêje? bi ci zimanî dipeyive? "Eger tu guh bidî ser gotinê min, tu dê jî fahm bikî ka ez ci dibêjîm" Xanim, gotin bi gotin, dibêje. "Belê, tu dê fahm bikî, ezbenî... General Serdar, serekê me, sermiyanê me, her tişte me ye, lê ne hewce ye ku ew hertim li mala be jî" Ezbenî? Çîma ezbenî? Xanima wî hem dersan dide, fermanan li pey hev rêz dike, hem jî dibêje ezbenî! Baz diheze, gewriya wî zuha dibe. Pişti van gotinê dawîn, Xanima wî dere ber portreya General û portrê ji dîwîr dadixîne. Hingî Baz hew dikare xwe rabigire, bi hîdet, dere ser Xanimê û sîleyeke sert lê dixe, "ker, keça keran!.." Bi tesîra sîlê, Xanîm xwarî erdê dibe, lê ew xwe dide hev, bi awirekî ku Baz hîç nedîtiye, li Baz dînihêre û xwe davêje ser Baz û rûyê wî penc dike, "ker, kurê kerê, kurê bêkes û bêesilan." Rûyê Baz dişewite. Dilê wî, bedena

wî, hemû hebûna wî dişewite. Ew destê xwe yê rastê hildide û bi hemû quweta xwe, sîleyeke hiştir li Xanimê dixe. Xanim bi dev û rû dere erdê, lê ji erdê radibe, destê xwe dibe pozê xwe. Ji pozê wê xwîn tê. Ew dest bi qîrînê dike û li dora xwe dinihêre. Kêr û xencer... ew xwe li aliyê kêr û xenceran digire û xwe digihîne xencerek xwar. Lê berî ku ew dest hilîne, Baz xwe digihîne wê û ji bazinda destê wê ku xencer tê de ye, pêdigire. Bi qasî çend deqîqeyan, bi qîjîn û qireqîr, bi çêr û gotin, ew hevûdu dibin û tînin. Paşê ew dikevin erdê û li erdê gêr dibin. Mase, sandalye, kursî, maseya şûşeyan, şûşeyen li ser masê hemû tevîhev dibin, dişkiyên, belav dibin. Bi dû pêveçûna dirêj a li ser xalîça erdê re, herdu ji hev vediqetin û ji hev dûr, radibin ser piyan. Êdî deng ji wan nayê, bi tenê, bi kîn û nefret li hev dinihêrin. Xencer naxuye, destêner herduran jî di nav xwînê de ye. Îşligê spî yê Baz û fîstane spî yê bûkitî yê Xanima wî di nav xwîna sor de ne. Bi qasî kêliyekê, li herdu milen maseya salonê, li pê rawestayî, bi çavêr mîna beloqê vekirî, ew li hev dinihêrin.

Paşê Xanima Baz, mîna telizekî vala, hildiweşc erdê. □

Kurd di weşanê polonî de

Pirsgirêka kurdî di lêkolînê polonî yên qonaxa piştî şerî (salên 1945-1969) de

MARIA PARADOWSKA

Lî naverasta sala 1969ê, pirtûka nivîskarê kurd A. R. Qasimloyî (Kurdistan û kurd), ku ji mêj ve behsa wê dihat kirin, ji weşana wê ya Pragê ya ingilîzî hat wergerandin bo polonî û gehişt bo ser teqîckên pirtûkfiroşîyan(1). Evê xebata lêkolîniyê gelek dengdana xwe heye û ji ber egerên cuda dibe cihê dilxweşiyê. Ev yeke-mîn lêkolîna berfireh e bi zimanê polonî li ser pirsgirêka kurdî piştî van çend salên paş Şerê Cîhanî yê Duyem. Ji ber hindê û digel qelsiyên tê de, bi taybetî di warê zanyariyên etnografîk de, ev pirtûka Qasimloyî berhemekê buhadar yê weşandî ye. Her weha ew bêguman wê valahiya di literatura polonî de li ser vê pirsê heyî pir nake, lê nebûna lêkolînê li ser pirsgirêka kurdî, ci yên nivîskarênen polonî û ci yên wergerandî ji literatura mişê di vî warî de, ji nivîskarênen rûs û Sovyetê, ci nivîskarênen ingilîz, alman, ci fransî, weha dike ku ev wergera pirtûka A. Qasimloyî, ya li jor binavkirî bi pilyeka bilind bihête hilsengandin.

Ji bili nivîsine di hindek kovar û weşanê heyamî yên polonî de û bi terzekî ji terzan di xebatêñ mezintir de yên girêdayî pirsgirêkên deverên Rojhilata Nâvîn, em, di literatura polonî ya zanistî û ya giştî de ya piştî şerî, pêrgî ci xebatêñ lêkolînvanîyê yên mezin li ser jiyan û kultura kurdan nabin. Digel berfirehbûna pûtedana hem zanistî û hem ji grupêñ mezin yên xwendevanê polonî bi kultura milletêñ neewruppi, nebûna lêkolînan li ser grupêñ etník yên cuda li deverên rojhilata erebî mîna kurdan, bêguman cihê pîrsyarkirinê ye. Kultur û rewîstêñ balkêş û gelek elementêñ tradisyonê yên kevnar ku di nav kurdan de heta roja îro hatine parastin, babetêñ baş in ji bo lêkolîn li ser kirinê.

Ku mirov temaşayî berhemêñ çapkirî bike, dê bibîne ku ev pirs li Polonyayê kêm naskirî ye. Di rojnameyên rojane û heftenameyean de, dengûbas bi nûçeyên

bîçûk, ku bi awayekê serekî li ser rewşa kurdan ya siyasi bûn, dihatin weşandin. Ew nûçe jî di piraniya xwe de li ser kurdên Îraqê bûn, ji ber gelşa wan bi desthilatdarên Îraqê re⁽²⁾. Nûçeyên rojnamevanî derbarê kurdên ku di nav sinûrê Îranê de dijîn gelek kêm bûn û li ser rûniştivanê kurd li Tirkîye û Sûryayê bi yekcarî nebûn.

Her wekî dihêt zanîn axa Kurdistanê di navbera van herçar dewletan de da-beşkirî ye. Piştî Şerê Cîhanî yê Yekem, di egera sistêma hêzên siyasi û berî her tiştekî hilweşiyana Împeratoriya Osmanî de, rê li ber kurdan, bo bicihanîna daxwazên xwe yên azadîxwaz ku bi sedan salan xebata çekdar ji bo kirî û di sed-sala 19ê de bihêzkeftîn, vebû. Lê her di encama Şerê Cîhanî yê Yekem de Kurdistan di navbera Tirkîye, Îran, Îraq û Sûryayê de hat dabeşkirin. Di ser vê parçekirinê re, hesta netewî ya hêzdar û girêdan bi ziman û rewişt û titalan ve, bûn egera xebateka berdewam ji pêxemmetî pêkanîna dewleta xwe. Lihevhatina aştiyê digel Tirkîyeyê li Tebaxa sala 1920ê li Sevrê qala damezrandina Kurdistaneka serbixwe ya pêkhatî ji deverên kurdî yên Îraqê û Tirkîyeyê kir, lê ev pilan ne hat bicihanîn.

Li deverên erebî yên Rojhilatê, kurd, ku serhejmara wan nêzîkî 7 milyonan e, grupeka etnîk ya serbixwe ye -bi koka xwe indoewropî ne- diyaleketekê nêzîkî yê îranî bikardînin. Xwe hêj koka wan ya etnîk bi duristî nehatîye vekolandin. Kurdish, digel kartêkirinên mezin yên milletên cîran li ser wan, cudahiya xwe ya kulturî di hinek warên jiyanê de, bi taybetî di warê avakirinê û di cil û bergen de, li gor dewrûbera xwe ya geografîk parast. Wan, di warê peywendiyen civakî, zanebûna gelêrî û baweriyan de, bêtir elementên xwemalî li nik xwe parastine. Ev bêtir peywendîdar e bi kurdên Îraqê û Îranê, ji ber ku pirtirîn xelkê kurd li van herêman dijît. Kurdish ku li Sûryayê dijîn grupeka bîçûk in, ji çend deh hezar kesekan pêk dihêن û kurdên Tirkîyeyê ji ber politika helandinê, ji aliyê hukumeta wê dewletê ve, bi xelkê tirk dihêne naskirin.

Piştî Şerê Cîhanî yê Duyem, li Polonyayê, kêm nivîs li ser kurdan hatin weşandin. Her wekî min gotî, di wî warî de ci xebatêن serbixwe yên mezin nebûn. Yê hebûn jî valahiyeka bîçûk di literatura girêdayî vî babetî de digirin. Di nav wan de nivîs hene li ser babetên dîrokî-siyasi û geryanname û herwesa behsa lê-kolinêن geografîk li wan deverên ku kurd lê xwecih. Ji bilî nivîsên di kovaran de, nûçeyên bîçûk li ser van pirsên me elaqetdar dikin, di karêñ mezintir û baberberfirehitir de dihêن dîtin. Nivîsên gerok û lêkolînvanêñ polonî yên sedsala 19ê li ser Kurdistanê ku careka din hatine çapkirin, balkêş in. Dema mirov beh-

sa nivîsên dîrokî-siyasî bike divêt li berahîkê navê nivîsa A. Bartnickiyî li ser dîroka kurdan û xebata wan ji bo rizgarbûnê bîne⁽³⁾. Ew nivîs mezintirîn xebata lêkolînvaniyê ye, ku bi zimanê polonî li ser wan pirsan, piştî Şerê Cîhanî yê Duyem hatiye belavkirin. Bartnicki bi dûr û dirêjî behsa serhatiyên milletê kurd dike û bêtir li ser xebata kurdan û çend serhildanekên wan yê çekdar, ku bo berevanîkirinê ji welatê xwe, bi dirêjiya çend salan kirine, radiweste. Herwesa ew di nivîsa binavkirî de gelek cihî dide bizavê kurdan yê diplomatik digel Komeleya Milletan piştî Şerê Cîhanî yê Yekem, ku mebest jê damezrandina dewleta kurdî ya otonomî bû û herweha diçe ser behsa pirsgirêkên serhildanen kurdên Îraqê û Iranê yên vê dawiyê. Pir kêm li ser kultura kurdan û bi awayekê serekê li ser koçerî û peywendiyêşîrîniyê û binasên neyarîniya di navbera hindek eşîran de dinivîse.

Li ser xebata kurdan ji bo rizgarbûnê G. Wojciechowski⁽⁴⁾ reportajeka kurt heye, tê de ji bîlî wesîfkirina hindek eşîrên kurdan, daxwazên kurdên Îraqê di serhildana Hezîrana 1963yê de berçav dike. Her girêdayî vî babetî, J. Dziedzica⁽⁵⁾ ji li ser xebata rizgarîxwaz a kurd di salên 1968/1969an de radiweste û tê de kurdan wekî kîmâniyeka netewî li Îraqê li qelem dide.

Li ser kultura kurdên Îraqê du nivîs hatin belavkirin. Ew jî geroknameyên (reportajên gerokiyê) yên J. Lichodziejewskiyî ne⁽⁶⁾. Piştî çend salan ew reportaj bi awayekê berfirehtir, wekî beşeka pirtûka wî *Piaskiem w oczy* »Toz di çavan de -werg.« hatin belavkirin. J. Lichodziejewski piştî şoreşa Qasimî wekî delegatê teknikî yê daîm yê Navenda Bazirganiya Derve »Cekop« çû Îraqê û bi hezkirina xwe çû deverên kurdî bo dîtina wan. Ji ber ku ew bi xwe li wê derê bû, behsên wî dîrekt in û dema mirov wan dixwîne hest bi rastîniya wan wesîfkiranen dike. Ji bîlî rawestaneka kurt li ser dîroka kurdan û rewşa wan ya geografîk, nivîskar bi dûr û dirêjî behsa tiştine ji jiyana rojane û rewişt û titâlên kurdên Îraqê dike. Gelek cihî dide wesfa bajar û gundên tê re derbas dibe, koçeran, cil û bergen wan, xwarin û vexwarinên wan û serhatiyên girêdayî koka kurdan.

Nivîsên peywendîdar bi geryanên polonî ve bo çiyayê Bilind, ku deverên kurdî jî digirin, beşekê bi serê xwe ne. M. Popko⁽⁷⁾ ku qala geryana xwe dike û bi taybeti di nivîsa xwe ya duyem de, ji bîlî berçavkirina deskeftiyêşîrîniyê xwe yên alpinistik, bi parçeyî hindek rastiyêşîrîniyê li herêmên Tirkîyeyê tomor dike. Ew bêtir giringiyêşîrîniyê dide cilkan û xwarinê û herweha tiştîn ku kurd diçinîn û heywanên ku bixwedî dîkin binav dike.

Li dûmahiya berçavkirina nivîsan, hêjayî hindê ye em wan helbestên kurdî

yên hilbijartî ku ji aliyê etnografên fransî ve hatibûn belavkirin û Z. Stolarkî⁽⁸⁾ ji zimanê fransî kiribûn polonî bi bîr bînin. Em bi xêra hindê şîyan şîira gelêrî ya bedew, ya pîrî nazikiya hestan û kulturê, şîira ku heta roja me ya îro mayî, nas bikin.

Grupeka din pêk dihêt ji nivîsên li ser pirsên herêmên Rojhilata Navîn, ku mirov dikare di wan de agahdariyêngirêdayî kurdan peyda bike. Helbet lêkolînêng ku bi şêweyê pirtûkên geografiyayê derdi Kevin, wesfa Kurdistanê dîkin û herweha gelek zanyariyan di warê pirsên abûrî-geografîk yên vê herêmê ji didin⁽⁹⁾. Ji rexekê din ve mirov dikare pûteyî bide xebatêngî dîrokî-siyasî ku tê de nivîskar li ser pirsgirêkên peywendîdar bi tekoşîna milletê kurd ji bo serxwebûnê radiwestin⁽¹⁰⁾. Divêt em li vê derê biçin ser behsa nivîsên gerokî-reportajîk ku ji aliyê J. Lichodziejewski û K. Dziewanowskîyi⁽¹¹⁾ ve hatibûn kirin. Di nivîsa J. Lichodziejewskîyi de, di warê zanyariyêng ku ser kurdan de, meteryalekê mişê cih girtiye, lê pirtûka K. Dziewanowskîyi reportajeka rojnamevanî ya nimûneyî ye, diçe ser behsa problemêngirêdayî bikarxistina neftê li deverên Kerkûk û Mûsilê û herweha rewşa saxlemiyê û pûtedanê bi tenduristiyê li wan deveran.

Divêt navê wergera geroknameya G. Bidwellî⁽¹²⁾ bihête gotin. Bidwell li salên 1945-46an li Rojhilata Navîn geriyabû û di bîranînêng xwe de hindek tişt ji kultura kurdan destnîşankirine û bêtir giringî daye ser koçeriyê û ketina koçeran bo nav jiyanâ akincîbûnê.

J. Leliwa⁽¹³⁾ di pirtûka xwe ya navîncî de babetê kurdan vedike û bi rengekê serekî li ser pirsa xebata azadixwaza kurdan li Îraqê û dîroka wan radiweste.

Dema mirov bixwaze li ser pirsa kurd di xebatêng bi polonî nivîsandî di qona-xa piştî şerî de rabiweste divêt mirov destnîvis û nivîsên lêkolînvanêng polonî yên sedsala 19ê yên dûbare çapkîrî bide berçavan. Mebesta min li vê derê berî hemûyan nivîsên K. Brzozowskîyi û destnîvisa W. Jablonowskîyi ne.

Beşek ji nivîsên K. Brzozowskîyi yên ku di gelek kovaran de belavbûyî, T. Brzozowskayê⁽¹⁴⁾ di pirtûka xwe di beşâ bi navê »Belqan, Kurdistan, Mezopotamya« de civandine serhev. Tiştên ku di vê beşê de ne, peywendîdar in bi geryanen K. Brzozowskîyi li çiyayêng Kurdistanê li sala 1869ê. Egera ku ev nivîs bêtir dibin cihê balkêsiyê ji ew e ku nivîskarê wan weki yekemîn lêkolînvanêng ewrupî li ser Kurdistanê û çêtirîn şehrezayê wan deveran di zanista cîhanî ya nîva duyê ji sedsala 19ê de hatiye naskirin. T. Brzozowskayê bes hindek parce, yên peywendîdar bi biografi û geografiyê ji nivîsên K. Brzozowskîyi hilbijartine û bala xwe nedaye ser parçeyêng etnografiyê. Ev zîyaneka mezin e, ji ber ku K.

Brzozowski di nivîsên xwe de gelek agahdariyan di warê jiyanâ koçerî ya eşîrên kurdan û karakterê wan yê şervaniyê dide, behsa çandina dexlî û fêqî û texlîten xwarinên kurdî yên ku li cem wî xelkî dihatin çekirin dike. Di hindek nivîsên xwe de behsa avakirinê dike û bêtir serincê dide ser avakirina bajarên mezin, mîna Kifî yan Silêmaniye. Herweha zanyariyan li ser cil û bergên kurdan, hem yên mîran û hem yên jinan dide. Di nivîsên K. Brzozowskyî çend agahdariyek li ser peywendiyêñ kornelayeti, zanîna gelêrî û baweriyêñ kurdan hene⁽¹⁵⁾.

W. Jablonowski ji her bi wî şêweyî diçe ser behsa vê pirsê û hindek parça jê li sala 1967ê⁽¹⁶⁾ hatin weşandin. Di xebateka ku armanc jê nasandina çarenivîsa müşextên polonî li Tirkiyeya Osmanî û bi awayekê giştî li Rojhilata Navîn bû, ji wê meteryala berfireh û mişe bes hindek parça hatin weşandin. Ev jî ne di qazanca meteryala etnografîk de bû ku di destxeta vî nivîskarî de bi dewlemendi cih girtiye. W. Jablonowski ji sala 1866ê û heta mirina xwe li sala 1894ê weki pîşkekî di xizmeta leşkerê tirkî li Tirkiyeya Osmanî bû û di wê mana xwe de çend heyvekan li deverên kurdî li İraqê û Iranê geriya. Di bîranînen xwe yên bi detalya de tiştên balkêş li ser xelkê kurd jî dînivîse. Bes beşek ji wan di berhemên li sila binavkirî de hatin weşandin. Xwe zanyariyêñ di destxetê de, hindî bibêjî buhadar in, ji ber ku ji jêdereka bijare ya polonî ne li ser kurdan. Ji ber ku W. Jablonowski bi xwe di nav wan de jiya, lewma şiya kultura kurdan bina-se û weha şiya xanî, cil, xwarin, navgînên veguhastinê, hindek rewiştan û hindek ji jiyanâ civakî⁽¹⁷⁾ baş wesif bike.

Meteryalîn etnografîk yên sedsala 19ê yên li ser kurdan ku ji aliyê gerok û lêkolînvanen polonî ve hatibûn civandin, hêj li benda şirovekirin û li ser rawestiyana rexnegiran in. Di wê serdemê de li ser biografiya wan poloniyan bêtir ji destkeftiyêñ wan di warê lêkolînen etnografîk de rawestiyabûn⁽¹⁸⁾.

Derkeftina wergera polonî ya pirtûka A. R. Qasimloyî, di demekê de ku berhemên polonî -çi yên xumalî û ci yên wergerandî- di warê lêkolînan de li ser kurdan û li ser tradisyonen kevnar tê de pir kêm, karekê hêja û mezin e. Xwe ev pirtûk valahiya heyî danagire. Gelek tişt jê kêm in û karakterê pirtûkê yê siyasi-ekonomî bûye egera sinûrkirina çenditî û çawatiya meteryalî etnografîk tê de. Xwe A. Qasimlo di pêşgotina pirtûka xwe de diyar dike ku dixwaze problemen kurdî yên hevçerx bi dîtineka siyasi deyne ber çavêñ xwendvanan. Ü ew bi wê dîtinê ye ku ev dabeşbûna Kurdistanê di navbera çend dewletan de dikare, ji ber wekyekiya dîrokê, bi awayekê taybetî ji xwendevanê polonî re niyas be. Nivîskar dibîne ku gelek tiştên hevbeş di dîroka herdu milletan de, yê kurd û yê

polonî de hene. Pirtûka navbirî bi awayekê serekî li ser jiyanâ kurdên hevdem û xebata wan sexmeratî azadiya netewî û mafêñ wan di nav wan dewletên ku tê de dijîn radiweste. Ne bes dîroka kurdan, lê herweha ravekirineka dirêj jî ji bo rewşa kurdan ya siyasi û cıvakî ya hevçerx li Îran, Îraq, Tirkîye, Sûrya û Sovyetê pêşkêş dike. Ev pirtûk di babetê xwe û di vî warî de bêguman karekê gelek bu-hadar û êkane ye. Lê mirov nikare wê gotina nivîskarî erê bike ya ku bi rengekê giştî dixwaze weha bide zanîn ku kêm vekolîn -di warê literatura cîhanî de- li ser problema kurdî hatine kirin⁽¹⁹⁾. Hema ya berî her tişteki vê gotinê nepejirîne bibliografiya wan lêkolînên li ser kurdan e⁽²⁰⁾ ku li sala 1963ê li Moskvaya hatîbû weşandin û tê de navên nêzîkî 3 hezar lêkolînên girêdayî vê pirsê hatine destnîşankirin û bêguman ev ne hemî nivîsên girêdayî vê pirsgirêkê ne.

Pirtûka Qasimloyî ji sê beşan pêk dihêt; beşa yekem kurtiyeka pirsên geografi-dîrokî yên Kurdistanê ye, ya duyem berçavkirineke bo rewşa abûrî û beşa sê-yem li ser pirsgirêka kurdî di vê nûdemê de ye. Di beşa yekem de nivîskar diçê ser behsa geografiya deverê, xwecih û rûniştivan, ol, ziman û literatur, xwendin û pizişkîniyê. Paşî kurtiyeka dîrokî û li dawiyê jî dabeşkirina Kurdistanê ya dawiyê berçav dike. Beşa duyem ku li ser rewşa abûrî ye, ronahiyê dixe ser rewşa abûrî û sexletên wê yên giştî, astê berhema çandin û avdanê û herweha kurtiyeka dîroka civaka kurd û formên sexbêrişîkirina axê û formên baca bingehîn. Her di vê beşê de zanyarî li ser struktura civakî û astê jiyanâ xwecihêñ gundan, problemen pîşesazî, bazirganî û finansan û herwesa derxistina neftê li herêmên kurdî û cihê wê di abûriya netewî de. Di beşa sêyem de, bi awayekê berfireh, pirsgirêka kurdî ya hevçerx dihêt şirovekirin digel destnîşankirina peywendiya vê pirsgirêkê û mafê milleran bo biryandanê li ser çarenivîsa xwe û xebata kurdan ji bo otonomiyê li Kurdistanâ Îraqê.

Ev berçavkirina pirtûkê ya giştî bo van pirsan her li ser wê demê ye ya ku pirtûk tê de dihat nivîsandin. Ji bilî zanyariyên geografi-dîrokî-siyasi, tu dikarı di beşa sêyem de detalyayên herî balkêş yên peywendîdar bi pirsên kurdan yên abûrî bibînî. Berî hemûyan jî struktura sistema eşîrîtiyê û pêşdeçûna wê, texkirna komelayetî ya xwecihêñ kurd, wesikrina avdanê li wan herêman û pirsgirêka avê di çandina kurdî de. Qasimlo, herweha, gelek zanyariyan li ser metodên wecdîtinê jî axê di çarçoveya sistema xwegirêdana texên cotyaran yên hejar bi xwedîyen erd û milkêñ mezin dide û herwesa tiştên ku dihêne çandin binav dike. Xuya ye ku tiştên bi taybetî balkêş in ew agahdariyên rastîn in li ser peywendiyyen civakî yên rûniştivanê Kurdistanê. Bêguman pirtûka A. Qasim-

loyî ew armanc ya ku nivîskarî di nivîsandina wê de li ber çavêن xwe deynayî bicihaniye û bêguman dê ev pirtûk, ji lêkolînên din re, meteryalekê buhadar û arîkar be. Lê ji ber karakterê wê yê yekhêli; siyasi-ekonomî û ji ber nebûna pêdaçûnan di warê kulturê hem ya meteryal û hem jî -piçek- ya komelayetî û ji ber herweha nebûna zanyariyan di warê zanîna gelêri û baweriyêن xelkê kurd, pirtûk ne pir dilxweşker e.

Di lîteratura polonî, hem ya zanistî û hem jî ya giştî de, nebes di qonaxa piştî şerî de, lê herweha di dûmahiya sedsala 19ê û destpêka sedsala 20ê de, ci xebatên nivîskî yên mezin ku li ser pirsgirêkên kurdî rabiwestin nînin. Evca divêt bi-hête gotin ku derkeftina berhemeka weha, bona ku di naskirina kultura milletê kurd de ji me re arîkar be, pêwîst e. Ew pirsgirêkên herî balkêş jî ku hêjâyî lêkolîn li ser kîrinê ne, bêguman dê problemên koka kurdan, xeslerên xwemalî û derveyî di kultura wan de û herweha guhertinên kultûrî yên hevçerx li vê deverê bin. □

Ji polonî: **SIDQÎ HIRORI**

Ev nivîsa Maria Paradowskayê ya ku di kovara etnografik ya polonî »Lud«, bergâ 54'an, sala 1970'ê de hatibû weşandin, ji polonî hatîye wergerandin.

Çavkanî

1. *Abdul Rahman Ghassoul, Kurdistan i kurdowie.* Warszawa 1969.
2. Berê xwe bide, bo nimûne »Trybuna Ludu«, »Zycie Warszawy«, »Głos Wielkopolskim« û rojnameyine din.
3. *Andrzej Bartnicki, Kurdowie.* »Mowia Wieki« 1966, R. IX, nr. 3-5.
4. *Grzegorz Wojciechowski, Znow wojna w Kurdystanie.* »DookoLa Swiata« 1963, R. X, nr. 27, rûpel 4-5; herweha berê xwe bide *Ogien w gorach.* »Swiat« 1963, R. XIII, nr. 31, rûpel 8-9; *Juri Boczkarew. Kurdowie u progu wolnosci.* »Widnokregi« 1960, nr. 10, rûpel 98-100.
5. *Jan Dziedzic, Kraj dwóch rzek.* »Kontynenty« 1969, nr. 3 (62), rûpel 16-19.
6. *Jerzy Licodziejewski, Na spotkanie Kurdystanu, û Na przełeczy Rawanduz.* »DookoLa Swiata« 1962, R. IX, nr. 12 û 13.
7. *Maciej Popko, Na Araracie, û W gorach Cilo Dag.* »Poznaj Swiat« 1968, R. XVI, nr 1 (182) û 2 (183).

8. Zbiegniew Stolarek, *Wybór wierszy kurdyjskich*. »Kultura« 1963, nr 5, rûpel 6-
9. Berê xwe bide, bo nimûne *Kraje i morza pozaeuropejskie. Geografia fizyczna*, li bin serperiştiya prof. E. Neef, Warszawa 1959; yan J. Baker, *Odkrycia i wyprawy geograficzne*. Warszawa 1959. Herweha pêwist e li vê derê navê xebata K. Moszynski, *Ludy pasterskie*, Krakow 1953, bihête anîn, ku tê de nîvrûpeleka nûçeyên kurt li ser kurdan heye.
10. Marek Gdanski, *Arabski Wschód*. Warszawa 1963; yan ji Lukasz Hirschowicz, *III Rzesza i Arabski Wschód*. Warszawa 1963.
11. Jerzy Lichodziejewski, *Piaskiem w oczy*. Warszawa 1964; Kazimierz Dziewanowski, *Mahomet i pułkownicy*. Warszawa 1963.
12. George Bidwell, *Szlakiem karawan*. Warszawa 1956.
13. Jerzy Leliwa, *Irak wczoraj i dzis*. Warszawa 1964.
14. Teresa Brzozowska, *Strzelba, turban i pioro*. Warszawa 1966. Çirokek e li ser Karol Korab-Brzozowski.
15. Berê xwe bide M. Paradowska, *Karol Brzozowski - podroznik i badacz Bliskiego Wschodu. »Etnografia Polska«*, bergê XI, 1967, rûpel 208-223.
16. WLadyślaw Jabłonowski, *Pamiętnik z lat 1851-1893*, berhevkirina J. FijaLek, Wrocław-Warszawa-Krakow 1967.
17. Berê xwe bide M. Paradowska, *Rekord W. Jabłonowskiego i jego znaczenie dla historii etnografii polskiej. »Etnografia Polska«*, bergê XII, 1968, rûpel 162-172.
18. Berê xwe bide, bo nimûne Jan Rejchman, *Karola Brzozowskiego wejście w r. 1869 na Pir Omar Gudrun (2588 m)*. »Wierchy« 1964, R. XXXII, rûpel 119-129; herweha *Z nieznananych kart orientalistyki polskiej XIX w.; Polscy badacze języka i folkloru Kurdów*. »Przegląd Orientalistyczny« 1969, nr 1 (69), rûpel 49-59; Stefan Przeworski, *Z polskich badań naukowych w Azji Zachodniej. Szkice z dziejów polskiej orientalistyki*, Warszawa 1957. Herweha berê xwe bide nivîsên li ser biyanîyên ku lêkolîn li ser kurdan kirine, mîna Franciszek Machalski, *Wspomnienie o Bazylem Nikitinie*. »Przegląd Orientalistyczny« 1961, nr 2, rûpel 217-220.
19. A. R. Ghassimloo 1969, berhevkirin û pêşgotina W. Skuratowicz, rûpel 7
20. *Bibliografia po kurdovedeniju*, Moskva 1963.

Gula Mehabadê

Divê îro pê ve, sibe em ê pir bibin
Dinê bidin mendalan û bextiyar bibin.
Tu dizanî
Şilf hez dikim guliyên behîvan
bi gulçîçekan jî...
Mîna darêن bê çîcek in zarokêن Helepçê
Hê jî ji serma zivistanê ya mirovkuj
û ji germa havînê
Em nikarin wan biparêzin.
Bi evîn û hesret û keser dişewitî dilê min
Ewr têن û diçin
Ewrêن bi siyyanûr û gazê
Tixûb û sînoran nas nakin
Bêînsaf lê diqelibin
Dilê min dibe kovana Dêrsimê
xwîn jê herikî
Navekî evîna min jî Mehabad e
Asê dibim, îsyân dikim
zaliman û dîroka zaliman re
Di van berbangêن sor û xwînî de
Şiyar bin, serî rakin
Xweş e!
Kesk û sor û zer
Wek nîşana serxwebûn û azadiyê
Di destê min de
Gula Mehabadê
dixwazîm bidim we
bixim destê we!

ADIL DURAN

Cesaret

Gorkî û Pasternak di navendê de



SÜLEYMAN DEMİR

Dîroka rewşenbîrên rûsan, dîroka şerê bidestxisti-na azadiya nivîsandin û axavtinê ye. Gellek êş di vê derheqê de kişandine û mixabin bi şoreşa 17'ê oktoberê re dawî li şer û êşen wan nehat.

Piştî ku bolşevîkan desthilat girtin destêن xwe, çavêن desthilatê bi ser nivîskar û rewşenbîrên ne bolşevîk de beloq bûn. Mixabin ûjdanê leşker û polîsan bû sosyalîzm û derket pêşıya wan. Hêla sosyalîzmê a ku qet nebe divabû ji bo xelkê û hêza afirandina bedewiyên jînê demokratik bûya, nehat bipêşvexistin. Zor, bû metoda halkirinê ya bingehîn û di hin waran de tu tiştekî aştîxwaz û demokratik ji sosyalîzmê re nema. Em îro dibînin ku di qada siyasi de wilo bû. Di derheqa nivîskaran de wilo bû û her ku çû hişktir bû. Ên ku nehatin girtin û bi xwe re gihan, ji welêt reviyan, ên ku man jî, man dest û niggirêdayî. Terora ku di vî warî de bû, wilo berfireh hat kirin ku gellek caran hin rewşenbîrên bolşevîk jî ketine ber.

Heta demekê min bi xwe bawer dikir ku ev yek hew di dema Stalin tenê de wilo bûye. Lê mixabin em îro dibînin ku ne wilo ye. Ji serî ve, hîna gava ku Le-nîn sax bû û hera sîstema ku bolşevîkan ava kiribû hilweşîya, wilo bû. Wê ji agahdariyên ku Gorkî dide, xuya bibe ku Lenîn bi xwe dest bi wê yekê kiriye û bingehê wê yê teorîk daniye. Derdikeve û bêşik dibe ku Lenîn siyasetvanekî şa-

reze bû, lê ji hêla humanîzmê ve feqîr bû. Û her wilo, qet ne demokrat jî bû. Ji ber vê yekê bi hêsanî êrifş birine ser kesên ku ne hevalên wan bûn û ew bi wê hêsanîyê wek dijmin diyar kirine.

Ji ber vê yekê divê bê gotin ku ev yek ne kar û kirina çend kesan bû, em nikarin bi zalimbûna Stalîn tenê rave bikin. Bûyer, ji serî ve bûnbû hêleke sistemê.

Ez bawer im ku ev yek, wek şermazariyeke mezin di stûyê sosyalîzmê de ye. Lê her wilo jî ez bawer im ku sosyalîzm, ne ew yeka ku bû ye. Ji ber wilo jî agahdariyê di vê derheqê de bala min dikişînin. Ez bawer im ku divabû do wilo nebûya. Divê iro jî ne li welatê me û ne jî li tu welatên din wilo bibe. Û her wilo divê sibe jî wilo nebe. Divê tu nivîskar ji ber tu bawerî û nivîsên xwe, nebin mijara taqîbata polîs û siyasetvanan. Divê em kurd jî vê yekê xurt bikin û azadiya baweriyê û nivîsandinê bikin adeteke xwe ya bêmunaqaşe.

Gorkî navekî li naveroka bûyerê dike. 'Birîndarkirina mejiyê gelekî'. Rast e. Gava êrifş diçe ser rewşenbîrên welatekî, êrifş diçe ser hêza afirandina gel a çandî, exlaqî û her babet hêlên bedew. Bi êrifşê re, îcar hilweşandina neteweyî dest pê dike. Ma gelo ne ji ber wilo ew Rûsya ku demekê di warê edebiyatê de yek ji welatên herî li pêş bû, iro bûye yek ji welatên dinya sêyem. Rastiya vê yekê ji bo min bêmunaqaşe ye. Ji ber ku ne yek û dudu û sisê hatin kuştin. Bi sedan nivîskar hatin kuştin, girtin û wendakirin. Bi sedan ên ku nehatin kuştin, ya hatin girtin, ya hatin tirsandin û rawestandin, ya jî »xwekuştin« bû moda mirina ku pirr jê hat hezkirin. Ên din jî reviyan. Ne nivîskar tenê, lê her babet alim û hunermend ketin ber wê talanê. Gava mirov li héza siyasetvanan dinere, îcar hejmar ne bi sedan e, bi hezaran e. Ji komîta navendî a partiya bolşevik a ku şoreş kiriye, çend kes tenê digihijin ku bi xwe bimirin. Ên din hemû bi xâintiyê têr rawanbarkirin û têr kuştin. Gava mirov li hêla leşkerî dinere, her wilo ye. Vê talanê sîh-çil salan ajotkiye. Rojek hatiye ku welatê Sovyetan bê mejî maye. Heger ne wilo bûya, belkî sosyalîzm bikarîba bi ser biketa.

Bîranînê Anna Larîna Bucharîna, di vê derheqê de balkêş in. A. L. Bucharîna keça Larîn e û jîna Bucharîn e. Herdu jî ên herî li pêş bûn. Ji ber vê yekê jî Anna di nav bûyeran de bû, didîtin û dibihîstin. Heta van salêن vê dawiyê di hefsê de bû. Gellek di hefsê de jî dîtibûn û li wan guhdar kiribû.

B. Jangfeldt agahdariyê dawî ên ku di derheqa rewşenbîrên rûsan de ji arşî-vên polîsan bi destê xwe xistibûn, wek pirtûk çap kirin. Pîreka min, wek xelata çilsaliya min diyarı min kir. Spas. Navê wê *Hawariyê Sêzdemîn* e. Navê rûmet û vatiniya ku Mayakovskî dabû xwe ye. Min xwend û ez dixwazim bi kurtî behsa



Maxim Gorki rewşenbirekî bêtirs bû

1920

K. A. Khnko

çend hêlên wê yên balkêş bikim. Wek ku ji navê nivîsê jî tê famkirin, Maksîm Gorkî û Boris Pasternak di navendê de ne.

M. Gorkî him halxweş bû û him jî xurt û xwedî otorîte û cesaret bû. Vê yekê û baweriyêñ wî yên ku azadî û demokratî diparastin, rewşenbîr û nivîskar li do-ra wî dicivandin. Gava karîbûn, diçûn derdêñ xwe û xeterêñ li ser serê xwe jê re rave dikirin, lê gava ku nikarîbûn jî, name jê re dişandin. Wî jî her babet alîkarî bi wan dikir û ew diparastin. Ên di vê derheqê de herî balkêş, Viktor Şklovskî, Nina Berberova û Roman Yakobson in. Nîvdostaniyeke Gorkî û Lenîn a sat-rancê hebû. Ji ber wilo karîbû naman rast û rê ji wî bi xwe re binivîse. Di sala 1919-an de gava qeflek rewşenbîr têñ girtin, Gorkî nameyeke protestoyê jê re dişne. Ew di namê de wilo dibêje:

Gelo ev metoda xweparastinê ji êrişkeriyê pê ve çi yê din e, ma gelo ne qebûlkirina gelsiya xwe bi xwe, ya jî -a herî dawî -xwestin û kirina veşartina bikérnehatina xwe ye.

Ez vê taktika ku ji hêla exlaqî ve feqîr e û mejiyê miletekî birîndar dike, bi temamî protesto dikim.

Ez dizanim tu dê wan gotinên her carê bibêjt: »şerê politîk«, »ên ku ne bi me re ne li dijî me ne«, »mirovê bê teref bi xeter in« ûhw...

Vladîmîr İlyîç! Ji bedêla ku ez bibim hevparê bêdengiya di derheqa karê tekbirina hêza gelê rûs a herî bedew de, ez jî cîhê xwe li kêleka wan kesan digirim û girtinê û cezayê hefşê hildibijêrim. Ji bo min bêşik eıkere bûye ku »yên sor« jî wek »yên sipî«, dijminên gel in.

Divê ez bibêjim ku ez bi xwe dixwazim ku »yên sipî« min wenda bikin, lê »yên sor« jî ne hevalên min in.

Lê mixabin ne vê namê û ne jî tu şîret û aqilê din, biryarên di vê derheqê de ranewestandin.

Lê tiştê di vir de û di jîna Gorkî de balkêş e, cesareta wî ya mezin e. Ji xwe heger ku ne wilo bûya, wê Gorkî, iro ne mezin bûya. Wek rewşenbîrekî ku şahidê demê bû, nikarîbû bitirsiya û bêdeng bîma. Mirov dikare bitirse, lê dîrok tiştêkî ji bîra nake. Ev yek vatiniyekê dide ber rewşenbîrên ku vê yekê dizanin û cesaretekê dike dilê wan. Li hemberî neheqiyêni dîrokî derdikevin û alîkariya ku berê rewşê bikeve ser rêya xêre bi rewşê dîkin. Gorkî yekî wilô bû û dixwest alîkariyê bi rewşê bike. Dixwest ku azadî xurt bibe û rewşenbîr nebin mijara taqîbata polîs û qanûnan. Lê gava qanûn neyên rayê û polîs bi tu awan neyên girtin, kese ku dixwaze alîkariyê bi rewşê bike, têk diçe. Tiştê ku hatiye serê wî jî mixabin wilô xuya dike.

Lê rewş û qanûn û polîs çi bikin û bibêjin, cesaret adeteke rewşenbîrên rûsan bû, bilind radigirtin. Aleksandr Radîşçev, Aleksandr Pûşkin, Michaïl Lermantov û Vladîmîr Mayakovskî di dîroka rewşenbîrên rûsan de, egîten ku cesaret bilind kiribûn û diyarî ên bi dû xwe de kiribûn in. Her çi qasî Mayakovskî ji nîşê piştî Gorkî ye jî, berî wî ji jînê koç kiribû û ji ber wê yekê jî yek ji ên ku cesaret emanetî wan kiribû ye.

Gorkî, menşevîk bû, lê Şklovskî sosyalîst bû. Lê dostêن hev ên nêzîk û xwedîyên gellek baweriyêne hevbeş bûn. Hevdu ji berî şoreşê ve nas dikirin. Şklovskî, payîza 1921'an nameyekê ji Gorkî re dişîne û »dev ji me berde û here wir, (İtal-

ya.S.D) *here wê dera ku yekî nivîskar dikare lê binivîse»* dibêje.

Gorkî serê çile diçe İtalya. (Bi piranî li wir dimîne, 1933-an dîsa bi temamî ve-digere). Lê cilê 1922-an gava dor tê sosyalîstan, navê Şklovskî bi xwe jî di listê de ye. Ew jî ictar di ser Finlandiyayê re direve Berlînê. Di nama ku ji wir ji Gorkî re dinivîse de, »*Ez nizanim bê ez ê bêyî welatê xwe çawa bijîm. Lê çawa be ez ji ber gedera ku hat serê Gumîlyov* (helbestvan û mîrê Anna Achmatova, havîna 1921-ê hat kuştin. S.D.) *xelas bûm»* dibêje.

Piraniya rewşenbîrên ku direvin, hevdu ya li Berlînê ya jî li ba Gorkî dibînin. N. Berberova diçû serdana wî. Lê Mayakovskî li Berlînê diçe serdana wan.

R. Jakobson, hîna sala 1920-an direve Pragê. Bi dû re di ilmê lînguwîstîk û helbestvaniyê de dibe alimeki mezin û iro li gellek unîversiteyên dinyayê tê xwendin. Di temamê jîna xwe de, ket dû ku bersiveke zaniyarî ji vê pîrsê re peyde bike: gelo helbest çi ye û çi nivîsekê dike berhemeke edebî? Bersiva ku wî peyde kir, hîna jî rast tê qebûlkirin.

Piştî ku Şklovskî direve, dixwaze jina xwe jî bibe ba xwe û li wir bimîne. Lê wî li Petersburgê li bendî wî radigirin û nahêlin ku biçe ba wî. Ew bi xwe mecbûr dimîne ku vegere. Wî çaxî nameyekê ji Gorkî re dinivîse:

Ez vedigerim welêt. Aleksey Maksîmovîç, ez ê mecbûrê ku ez derewan bikim, bêm kirin.

Ez dizanim ku ez ê mecbûrê ku ez derewan bikim, bibim.

Ez ne bi hèviya ku xêr li bendî min e.

Bi xatirê te.

Piştî ku vedigere, pêwendiyêwan têrîn. Lê bi dû re derdikeve ku ew sax e. Lê li gor ku iro tê zanîn xwestiye di warê edebî de çi bike, bi ser neketiye. Ew di sala 1930-î de mecbûr dimîne ku bi nivîsekê eşkere bike ku ew li hemû kirinê xwe yên berê poşman e.

Heta gava Gorkî vedigere welêt, Borîs Pasternak dibe otoriteke edebî a xurt. Pasternak ne di warê edebiyatê tenê de dibe otorîte, lê her wilô wek kes jî xurt dibe û digihije hêza ku bikaribe tesîrê li rêvebirina dewletê bike. Di baweriya fermî de, dibe helbestvanê herî »mezin«.

Heta wî çaxî navbereke fireh di nav wî bolşevîkan de hebû û her wilô xwe li derveyî dewletê hisab dikir. Lê wan çaxan, pêwendiyêwan wî û Bucharîn ji ên hemû çaxan xweştir dîbin û »ez êdî bûme perçeyekî ji dema xwe û dewleta xwe û

êdî berjewendiyêن wan bûne ên min bi xwe« dibêje. Di sala 1934-an de gava Bucharîn dibe serokredaktorê Îzvestiya û wek serokredaktor nivîsa xwe ya pêşî diweşîne, nivîseke wî jî cara pêşî tê de derdikeve. Êdî dihat bawerkirin ku Pasternak bûye yekî ji dewletê. Lê ne ew gotina wî û ne jî karê wî dikare wilo bê tercumekirin. Pasternak »perçeyekî ji dema xwe û dewleta xwe« ye, lê tu caran kuştin û taqîbata li ser serê rewşenbîran qebûl nekiriye û şika xwe ya di wê derheqê de ji dilê xwe neavêtiye.


Gava mirov bala xwe dide wê hêla wî, mirov dibîne ku bi cesareta xwe û kiri-nên xwe rewşenbîrekî bêqusûr e. Ez ê bi kurtî bahsa çend numûnên di vê derheqê de bikim. Bi xwekuştina Mayakovski şika wî ya di derheqa ku nivîskar û rewşenbîr bi destê dewletê têñ kuştin xuya dibe. Di sala 1931'ê de di derheqa xwekuştina wî de dinivîse û wilo dibêje: »Gava min ev qedâbihîst min gazi O.S. kir û jê xwest ku bê wir. Dilekî min ji min re digot ku wê ev bûyera kamax hinek hêsanîyê bide wê û wê êşa wê bi xwe siviktir bike.«

Wek ku B. Jangfeldt dibêje, heger mirov nizanibe bê O.S. kî ye, tu maneya zêde di van rêzan de tune ye. Lê O. S. herdu tipêr serê nav û paşnavê Olga Sillov e û jina helbestvan Vladîmîr Sillov e. Yek ji hevalên Mayakovskî û grûpa wî ye. Lê Sillov, berî xwekuştina Mayakovskî bi çend mehekî, ji nifşkê ve wenda dibe û nema tê dîtin. Ew navdar bû, lê tu kes li tu deran bahsa wendabûna wî nake. Ev yek him tirseke ku Pasternak bi xwe nikare serê xwe jê re deyne dixe nava wî û him jî wî diêşinê. Di nameyeke xwe de (ne kifş e bê ji kê re ye, lê di bîranînên wî bi xwe de heye. Dem: 1 adar 1930.) di vê derheqê de wilo dibêje:

»Ez îcar gotina xwe li vir dibirrim, ji ber ku min ji xwe bi qasî ku hewce bû gotiye. Lê heger qedexe jî be, yanî heger em bi xwe, gava kesén li dora me wenda dîbin, mecbûr bibin û wek ku hîna dijîn bikin û qet wan bibîr neynin û ne-bêjin ku êdî ne li ba me ne; heger nama min hin belan bîne serê te, ez tika dikim min neparêze û hemû tiştan têxe stûyê min. Ji xwe ji ber wilo ez bi navê xwe yê temam îmze dikim (wekî din îmza min carê ne bi awayekî ku bê xwendin e, ya jî ez bi tipêr serê navê xwe dinivîsim)«.

Di sala 1932'an de gava jina Stalîn, Nadezjda xwe dikuje, 33 nivîskar sersaxiyê di Lîteraturnaya Gazeta de, organa yekîtiya nivîskaran de ji Stalîn re dinivîsin. Pasternak îmze nake. Lê bi dû re li ser navê xwe tenê, wek dûmahiya wê nivîsê dinivîse û diweşîne:

»Ez hisêñ hevalên xwe fam dikim. Şeva berî wê ez cara pêşî dûr û dirêj bi awayê yekî hunermend di Stalîn fikirîm. Min sibehê nûçeya bûyerê xwend. Wek ku ez bi



Boris Pasternak demekê xwediye otorîteyeke mezin bû

xwe li wir bûm, wek ku min dîtibû û ez bûbûm şahid, ez pê hejiyam.«

Ji xwe hîna wî çaxî gotin bi sistî digeriya û dihat gotin ku jînik hatiye kuştin. Tê gotin ku Stalîn ji gotinên Pasternak bi tu awayên din tercume nekirine. Ga-va »xwe dikuje«, Stalîn li mal e, li oda tenîsta a wê razayî ye û deng neçûye wî.

Wê êvarê bi xwe, şahiya pazdehsaliya şoreşê bû. Stalîn serxweş bûbû û di şahi-ye de qâşîlên pirtiqalan û qûnikên pûro avêtine ser rûyê wê. Jînik zû ji şahiyê derdikeve û diçe malê. Heger mirov li gor agahdariyên ku jîna Bucharîn dide bûyera kuştina wê tercume bike, Stalîn ew kuştîye. Pasternak ew yek bi xeyalên hunermendan »dîtibû«.

Lê sal dor 1934-an gava dibe »perçeyekî ji dema xwe û dewleta xwe« him xurt-tir e û him ji eşkererî diaxive. Gava gulana 1934-an Mendelstam tê girtin, bi alîkariya Bucharîn dixwaze wî xelas bike. Bucharîn di partiyê de ji bo vê yekê hewl dide. Hîna hezîranê, Stalîn telefonê dide Pasternak û jê re dibêje ku sero-katiya partiyê biryar girtiye ku wê li cezayê Mendelstam binere. Di derheqa pê-wendiyên wî yên pê re de pîrsan jê dike û gazina bê çîma rast û rê li wî bi xwe negeriyaye jê dike. Mendelstam ji hepsê tê berdan lê sê salan tê nefîkirin. Lê hê-dî hêdî Pasternak û Stalîn li semta hev dibin xeter û navbera di nav wî, dewletê û Stalîn de dîsa fireh dibe.

Di sala 1937-an de gava mareşal Tuchatjevskî û heft leşkerên bilind tênu kuştin, ji hin nivîskaran tê xwestin ku nivîsekê binivîsin û bibêjin ku wê »faşistên ajan« li gor qanûna bi navê 133, a »welatê dînyê yê herî demokratîk« bênu kuştin. Pasternak navê xwe nade wan, lê gava nivîs tê weşandin, dîsa ji navê wî di nav ê wan de li bin nivîsê tê nivîsin. Gava protesto dike, tê gotin ku ji bo ku wî ji kuştinê xelas bikin, bi zanebûn wilo kirine.

Pasternak nehat kuştin, lê ew bi tenê hat hiştin. Ji bo ku berhemên wî negîhi-jin xelkê, rê li ber wan dihatin girtin. Berhema wî ya herî navdar, Doktor Jîvago, a ku sala 1957-an li İtalya hat çapkîrin û 1958-an xelata Nobel girt û bi dû re bû film, hera sala 1985-an li welatê sovyetan derneketibû.

Lê iro Stalîn û ramana stalînistî tê ricimandin û Pasternak, Mayakovskî, Gor-kî, Berberova, Jakobson û bi dehan nivîskar û rewşenbîrên rûsan têne bilindki-rin. Ev ji dide xuyakîrin ku ramana dîktatorî tu caran nikare zora azadiya fîkrê bibe. □



Hunera xwendinê

OLOF LAGERCRANTZ

Gava em dixwînin çi dibe? Çav, rêzên reş ku ji tîpan pêk hatine, ji çepê ber bi rastê ve û dîsan ji çepê ber bi rastê ve dişopînin. Ü benderuh, xweza, an fikir mîna ku mirov niha lê fikirîbe, an jî berî hezar salî lê fikirîbe, li gorî ku mirov lê fi kiriye, mîna sihêrbaziya ku ji tovegorrêن firewnan bibîşkîvin, derdikevin pêş.

Kesêñ ku mirov di pirtûkan de pêrgî wan dibe, dişibin mirovên rastî. Ew mîna me dipeyîvin, mîna me bêhna xwe digirin û berdidin, mîna me digirin û mîna me dikenin. Lê ger em ji bo hemêzkirina wan milêñ xwe dirêj bikin, wê milêñ me li hewa bimînnin.

Kevneteoriyek heye, dibêje, Xwedê nivîskarek bû. Xwedê Încîl nivîsand û ji bo ku wî Încîl nivîsand, dinya çêbû. Wî Adem nivîsand û Adem bi goşt û xwîn derket holê. Wî Hewa nivîsand û Hewa mîna gulekê li bin dara zanistiyê xuya bû. Heta niha tu nivîskarî tiştekî wilo nekiriye. Lê nivîskarên jîr dixwazin vê bikin.

Lêkolînerekî alman, Wolfgang Iser, sira xwendinê wilo formule dike: -Xwendin arenayek e ku li wir nivîskar û xwendevan bi hev re tiyatroyeke fantastîk dileyizin.- Ne nivîskar bi tenê avakir e, lê xwendevan jî bi nivîskîr re diafirîne. Nivîskarên baş bi vê yekê dizanin û loma ew xwendevanan jî dawetî alîkariyê dikin.

Nivîskarê poloni-îngilîz Joseph Conrad ji hevalekî xwe yê bi qîmet re nivîsand: -Çi nûçeyeyeke xweş e ku te ji pirtûka min hez kiriye, ji ber ku nivîskar bi tenê nîvê pirtûkê dinivîsîne, dawiya maye jî aîdê xwendevanan e.

Ger ji sedî pênciyê pirtûkê ji aliyê xwendevên ve were nivîsandin, û xwendevan çiqasî jîr û çiqasî bi evînî pirtûkê bixwîne, wê ew pirtûk ewqasî baş be. Xwedê xwendevanê baş daye me nivîskaran.

Hinek nivîskar ji bîr dikin ku xwendevan bi wan re avakirê berhemê ye. Du heb ji qehremanên mezin yên sedsala me Marcel Proust û James Joyce, hemû enerjiyê bi xwe xerc dikin. Gava mirov ji Odysseus an jî ji Analiza wê dema ku diherike kurtebeşin biçûk dixwîne, bêhna mirov diçike. Van herdiwan celebê kevneçîrokbeh-jîyê û pevgirêdana wê kuştine. Şirovekar ji kesen ku dikarin bixwinin zêdetir in. Ev nîşana kemilandinê an jî ya binketinê ye- hûn bi xwe hilbijérin!

Lê karê hin pirtûkan ew e ku tov bin. Ew wek bajarêñ mezin in, em bi tenê dikarin têkevin çend kuçeyên wan, an jî ew weke ciyayêñ bilind in ku em nikarin rapelikin ser qotê wan. Em li jorê wan dinihêrin û dilşa dibin.

Keçikek li metroyê rûniştibû û *David Copperfield* Dickens dixwend. Min xwe bi ser keçikê de daqûl kir û jê pirsî, bê rengê David çawan dihate ber çavêñ wê. "Ez dizanim ew çawan dixuye" wê got. "Resimek di pirtûkê de heye." Wê çapeke bi resim ku ji ber film hatibû girtin dixwend û wilo bawer dikir ku David dişibe aktorê film.

Hin kesen din wî bi awayekî din dibinin. Nasekî min got ku ew rûyê qehremanê romanen mîna bêrên spî dibîne. Hevaleke min jî got ku ew figuran, kincen wan, rîveçûna wan pir zelal dibîne, lê belê rûyê wan ne zalal e. Hevaleke min ya din jî got ku ger nivîskarek rûyê kesekî tarîf bike, an ew di ser wê tarîfe re gav dike, an jî heta ji wê tê ew dixwaze wê tarîfa nivîskêr ji bîr bike.

Gava mirov dixwîne pir zehmet e ku mirov li xwe binihêre. Ger pirtûk mirov bigire, ew hemû balê dadiqurtîne. Min xwestiye ez figurên romanen di serê xwe de jîndar bikim, lê ew tavilê di serê min de hatine guhertin; jî bo min jîndarhiştina wan bêmkan bûye. Yen ku di romanê de xwedîyên rolên alîkar in dikarin zelal bixuyin, lê heçî serokrol in ew têne guhertin.

Min carekê xwest di dema xwendinê de ez ji xwe re surprizê çebikim. Min hingî romana Cornard Lord, *Jim* dixwend. Ew wilo ava bûye ku xwendevan hertim daweti tarîkirina qehremanê romanê, *Jimê xemgîn* dibin.

Jim di demeke girîng de hatiye xapandin û bi wê xapandinê jiyana xwe mehû kiriye. Ew di dema binavbûna keştiyê de, digel karmendêñ din yên keştiyê, ji keştiyê derdikevin û mahkûmekî digel heştsed heciyêñ musulmanan di keştiyê de dihêlin. Ew bi vê yekê tradisyonâ pîroz ya ku li her derê dînyayê derbas dibe, dişikîne. Ji ber ku divê di dema binavbûna keştiyê de, karmendêñ keştiyê herî dawî ji keştiyê

derkevin. Jim hem ji aliyê moral de hem jî ji aliyê huqûqî de hatiye mehkûmkirin.

Conrad ev drama wilo kiriye ku her xwendevan xântiya Jim, rûreşıya wî û zehmetiyên wî di laşê xwe de hîs dikin û dixwazin ku ew were fêhmkrin û were pakkirin. Hevalên Jim yên keştiyê sextekar in. Lê belê Jim hesab ji xwe dixwaze. Têkoşîna wî ya piştî bobelatê ji bo ruhê wî ye, û gava em dixwînin, em dibînin ku ger em bûna me ê eynî mîna Jim bikira. Em bi Jim re têne mehkûmkirin û bi wî re derdi-kevin hemberî mehkemê; hemberî mehkemeya wijdan. Ger em poanê fêhm nekin jî, dîsan wê di bîra me de were, gava kapten Marlow, ku bi xwe bêjerê romanê ye, dibêje: "He is one of us." "Ew yek ji me ye."

Em ji rewşa Jim dibînin ku serê wî berjêr e, pişta wî tewiyaye, çavêن wî di bin pêşenîka wî de dixuye, "ev rewşa ciwangeyekî ku ji êrîşkirinê re amede ye tîna bîra mirov"...

Belkî min deh caran ev roman xwend. Min bi kelecan rewşa Jim ya zehmet şop-pand. Wê çaxê tavilê û ji nişkê ve rûyê wî hate ber çavên min. Lê di hundurê sani-yekek de jî rûyê wî hate guhertin. Çavên Jim yên hêşin li hemberî min bîriqîn û rû-yê wî dişibîya yê min, dişibîya yê bavê min, dişibîya yê lawê min, dişibîya yên dost û dijminên min. Min fantomek dîr ku navê wî Jim bû û ji aliyê Joseph Conrad ve hatibû afirandin û di eynî demê de ew ne tenê yek bû, lê gelek bû. Min hindî dev ji xwendinê berda û li jor nihêrî, lê di eynî kîliyê de ronahiya li ser rûyê gu-herbar hate vemirandin.

Pirtûkeke baş tesireke wilo li xwendevêne dike ku ew dibêje qey ew serpêhatiyêne xwe dixwine. Gava edebiyat herî baş e, mirov dibêje qey mirov ji nişkê ve bi tiştekî girîng dizane, lê ew tişt ji bîr kiriye.

Jina Leo Tolsoy carekê bi kîf behsa sira xwendinê dike. Tolsoy *Ser û Aşî* dabû wê da ku ew paqîj binivîsine. Wê ji Tolsoy re nivîsand: "Gava ez rûdinêm û dinivî-sinim, ez diçim cîhanke şâfrane ku carinan ez dibêjim qey ne ku romana te ewqasî baş e, lê ya ku ewqasî biaqil e ez im." □

ji swêdî: F. CEWERİ

Olof Lagercrantz yek ji nivîskarêne Swêdê yên bijarte ye. Pirtûka wî ya pêşî di sala 1935'an de hate weşandin. Jê pê ve wî bi dorê li ser nivîskarêne mîna Stig Dagerman, James Joyce, Dante, Agnes von Krusenstjerna, Naelly Sachs, August Strindberg û hwd. pirtûk weşandine. Me ev kurtenivîsa li jor, ji pirtûka wî *Hunera xwendin û nivîsandinê* wergerandiye.

Tayek nane

FATİH EL-MUDARRIS*

Cemê Qweq ku ji herêmên herî bakûrê Sûriyê dertê û ber bi jêr diherike, bi mijek spehî yê ji germbûnê çêbûyî, pêçayî ye. Paşnívroyek hişkegerm ya giran(hêdi), xwe bera ser girên Herbates û Der Sekin dide. Li milê çepê yê çem, li dûr, li kêleka Tell Bareke gundê Dagerman, mîna komek kevirên reş, carina xuya dibe. Ji ber mijê mirov nikare rêya ku -teriziye û dişibe çermê gumgumokan- ji Sû-laq Dagerman dirêjî çem dibe, bibîne.

Çemê kerr û mutewazî yê ku di bin çavdêriya darên bî de ye, wek hergavî, di nav nivînên xwe yên ji qamiran çêkirî radize. Çemê Qweq, di bin çavê roj yê bêinsaf ku kevirên birqok yên hûr dişewitîne; li bin siyên şin dirêj dibe; û xwe bi dizî digehîne bin dara xernof û lemên krangan.** Li bakûr çemê Qweq mîna çemekî jîndar diherike û li mîrgân kêlekên wî bi sedan mîh û bizin diçerîn.

Nîvroyekî xedar û pêtî. Alo ya piçûk çavêن xwe yên ji tozê şewitî bi destêن xwe yên mezeloqî diparêze. Ew, bêxem û bêhayî ji talûkeyên xapînok yên di bin qelîstokêن di nav tehtêن reş de, berjêr ber bi çemî diçe. Ji ber ku rêya wê dûr e, wê parîyek nan bi xwe re aniye. Nanê wê dê têra wê bike. Lê belê wê ji dil dixwest hinek helaw jî pêre heba. Wê gavê bi rehetî dê Nazê û Dende jî bi wê re biçûyana, herçiqas Dendeyê kirasekî nuh li xwe kiribû jî.

Lê belê nuha fêda fikirkirina vî tiştî ci ye? Alo destê xwe mîna mezinan di hev di-de, wê gava ku ne pêxwarinek ne jî hevalek bi wê re ye. Dema ku dizîvire, ew bi çavêن xwe yên êşdar hewl dide, da ku li dûr diya xwe ya nexweş bibîne; diya wê ya ku li paş diwarêñ gund û li serê wê hibrî girêdayî ye. Ew, pirçimên ku ketibûn ser rûyê wê yê zirav, bi destê xwe paşve diavêje, dizîvire û dimeşe.

Di wê bêdengiyê de çelekek li paş girekî -yê ku astengê dîtina çem e- diore. Alo zû dimeşe. Kevirên birqok yên hûr piyên wê yên piçûk mîna bizotê agirî dişewitînin. Ew xwe bi xwe dibêje »bîstek din ez dê bikevim avê«, »eger lawik li wê derê tu-

ne bin.« Ew serê xwe yê kej dihejîne û xweziya xwe dadiqurtîne. Ew ji fikra ku dê karibe bin avê bibîne û guhdariya dengê mişîna çem û xuşîna qûmê gelekî kêfkwêş e. Midetekî din dê kirasekî kesk yê eywanan, di bin avê de, bixêrhatinê li wê bike. Paşê ew dê ji avê derkeve û wek masiyek, avê ji devê xwe biavêje.

Ew bi tiliyên xwe, mîna ku ji nişke ve ji xeyaleke hênik û xweş bête şiyarkirin, porê xwe şeh dike. Axa sor piyên wê dişewitîne. Diviyabû wê şimikên diya xwe hil-dana. Wê gavê, mîna ku ew li mîrgan be, dê karibûya bazda.

Ew xwe xwar dike û ji erdê qoratek(qırşek) garis hiltîne. Li pey xwe di nav axpîn-kê re dikişîne. Ew disekine û lê dinêre ka ew toz li ber bê çawa xuya dike, lê belê toz hêdî hêdî dadikeve ser erdê. Çi bêşansî, surek ba ji tune ye! Bê dikaribû serê wê -yê di bin herareta tavê de- hênik bikira. Xwe bi xwe »ez keçikêk hejar im« dibêje. Ew bêvila xwe, ya ji xweydanê wek mircanan e, pak dike. Ew radibe ser pêçiyên xwe û li dûr fedike da ku çemî bibîne. Ew dizane ku çem li pişt kaşen hanê ye.

Cara ku ew bi bavê xwe Muslim re çûbû wir tê bîra wê. Hîngê axayê gund bavê wê neşiyandibû ba eskerên nobedar. Bavo hîn ji wê derê venegeriyaye.

Li jor, li hêla bakûr çiyayê Kemnûn piçûk xuya dike. »Dibe ku bavê wê nuha li pişt çiyê ye.« Bi qaratê garis ber bi asoyê işaret dike. Tişte ku wî soz dabû wê, tê bîra wê: Dema ew bê, dê ji bo wê xurmeyan û ji bo diya wê derman bîne.

Dema ew ber bi çemê hênik dimeşe û xwe bi xwe dipeyîve, ji dûr, ji ser bilinda-hiya kaşekî, dengek tê wê: »A ... o!« Ew nazivire lê bi lez xwe diavêje erdê û vedize-le. Paşê cesaret dike û di ser milê xwe re awirekî dide. Ewizarê(teqlidê) dengê »A ... o!« dike; û ew kêfkwêş dibe, ji lewre ne bekçiyê gund bû, çèlekek bû dioriya. Çi heyf zarok newêrin nêzîki wê derê bibin, ji ber ku axa li qeraxa çem bexçeyekî mî-weyan, bi kevirên reş pêçayî, daye çandin. Lê belê ew naçe wê derê.

Ew meşa xwe bi cesaret didomîne. Dem dem ew li pêçiyên xwe yên nazik fedike. Ew dibê qey av di hundirê guhêñ wê de dikele. Gava ew destêñ xwe dide ser guhêñ xwe û dişidîne eşâ wan kêm dibe, lê bi rakirina destan ve eş cardin vedigere. Ew tê-digehe ku dengê mişîna ava çem û xuşîna darêñ bî li qeraxê çem têkelhev dibe. Ji nişke ve şîretên diya wê têñ bîra wê: »Eger tu demek dirêj li bin rojê rawestî, tu dê bimîrî. Gava jîna axê heb dan te, bi lez vegere malê!«

Çima wê jînikê, bêî ku tiştekî bide wê, ew bi rê kir? Ax, ci zad li dora xaniyê wan hebû, mîna şûşeyeke zérîni ya hûrbûyî ya mezin. Wê fêm nedikir, gelo çima wan heb yên ku dê diya wê rehet bikira nedabûn wê. Qefleyek mêsên rengqehweyî yên birqok li ser serê wê doş dîbin. Ew bi qaratê garis li wan dide û wan tarûmar dike. Wextî ji bîra wê biçûya, ka wê dê li qeraxa çem ci bianiya -ji bo diya xwe derman-an wek axê gotibû: »Here, ji bo diya xwe qewdek nane bide ser hev, keça kor!«

Emrê axayî bû.

»Ev der ne nexweşxane ye. Em heban ji kê derê bînin?« Ev gotinêن Kahya(kızır) bûn û ew bi wê keniyabû. Li ber deriyê eywana mezin eskerek rûniştî goşt dixwar. Wî tiştek neda Alo. Wê ji dil dixwest, ew di şûna segê li ber lingên wî baya, yê ku bi gîlizê ve hesât dikotin! Na, nuha divê ew tiştekî din bike. »Ber bi çem, Alo!« Gava ew li seg likumî û bi girîn ji wê derê beziya pirqînî bi hemiyan ket. Keçika piçûk çavêن xwe girtin, serê xwe bilind kir û cara yekemîn tîk li rojê mêtzekir, da ku bibîne aya bi rastî ew jî bi qasî axa û jina wî Fazla zalim bû. Wê ji wek mezinan bi hulmikan li sînga xwe da û qêriya: »Ax, Xwedêyo ew çiqas zalim û bêinsaf e!« Paşê, serê xwe bê hejandin bera ber xwe da, cênikên xwe firikandin û bi gavên tîrsonek ber bi çem meşîya. Asoya rojhelat dişibiya dîwarekî lerzok ji camê buxurî. Çem ci pîr dûr bû! Diya wê nexweş bû û axa sor mîna kûreyê bû. Dilê wê ji ber tîbûn û hîznê dihat givâştin. Ji halketî kete erdê, dest bi nalînê kir û li ber girînê bû. Ji erdê rehek sûsik -ku nêzîkî xanî hatibû avêtin- hilda û dest bi cütinê kir. Paşê bi destekkirina çokan rabû ser xwe -hîn jî bizarre mezinan dikir- û meşîya. Çavêن wê yên şîn di nav rondikên wê yên mayîn de dibiriqîn, çawa ku giriybû welê bi lez jî keniya. Wê bêî ku bisekine rondikên xwe çepraz bi piyêن xwe zuha kîrin. Di qirika wê de çêja(tama) rondikan geleki şor bû. Gava ew gîhaşt Qubûr el-Gavûr, -cihê ku mezin hildikişîyan ser zinaran da ku karîbin çem bibînin- ew hilkişîya ser kevirekî mezin, li gel ku heyâ jê dihat ew rabûbû ser pêçîyan û stoyê xwe dirê kiribû jî, wê nekarî avê(çem) bibîne. Bayekî hênik rûyê wê mist; ew bi kêf û stran gotinê beziya: »Kundir, kundir, kundiran, stranek kurdî yê kevin, gava zarok birçîne dinuhurînin. Wê hêdi hêdi strana xwe domand:

Kundir, kundir, kundiran

Kundir teva bîrxuran

Kundir wena hundir kin

Kundir wena malî kin***

Di dawiyê de çem xwe nişanê wê dide. Ew li ber kursa striyê yê ewil, ya ku li ber gora kurdê pîroz Welî Mahmûd e, disechine. Ew ji wî bawer: »Mirovê pîroz, rehmetiyo, gelo çîma li ser kursa striyên te mîwe nîne?«

Paşê ew berjêr diçê newalê. Dîtina avê tîbûna wê şiyar dike. Dilê wê bi kêfxwesi lê dide. Ew xwe ji nuha ve rehet û laşsax his dike. Ew ji nuha ve dema masî dev li pêçiyêن wê dikin, bi şêweyeke têkelhev dehşet û kêfxwesiyyê xeyal dike. Ew dest bi lêgerîna şivek stûr dike da ku karibe kûçikên ku ji germa rojê, ji mîşen sor û lerze-

bayê reviyayî, hatine ber çemî, biqewitîne. Segê wê yê kor tê bîra wê, yê ku bekçiyê gund, par zivistanê roja ku birûska mezin li erdê dabû, kuştibû. Ji bo ku cesareta xwe nîşan bide, bi tivinga xwe nîşan girtibû û wê gavê bi segê belengaz ve danibû. Ev tişt piştî birina bavê wê qewimî bû. Dihate gotin ku ew miriye, lê wê bawer nedikir: Muslim namire, ew yekî xurt û bi cesaret e; û Alo gelekî ji wî hez dike.

Birek pirpirokên basksor ji ber piyên wê radibin. Ew ci bi zerafet in gava li dora qamir difirin! Ava çem, bêhejmar golgolî dabeşbûyi, wek tizbiyek durdane li ser şifonekî kesk, xuya dike. Eger mirov, ji jor ji Entab li bakûr, heyâ ber bi jêr ber bi Helebê li başûr, feke; mirov dê bêje zincîrek ji neynikên şikestîne di nav bilindahi-yen giran de xuya dibin.

Li kéléka çem Alo ne tenê ye. Komek jin berî wê hatine wir. Wan jinan cilşûştina xwe qedandine û nuha li dor beroşen mezin -yên ku ji dora wan duxan radibe-serên xwe dişon. Yek ji wan ji dûr bangî wê dike: »Weh, em ne tenê ne li vir!« Lê Alo xwe li paş biyekê vedîşêre û bersîv nade. Xumîna avê mîna aşê li Der şekîn xur-tir dibe. Çiqas ew nêzîktirî çemî dimeşe ewqas axa bin pêyên wê nermtir û hêniktir dibe. Striyekî kinî rûj di pêçiyêne wê re diçe. Na, wê nane ji bîr nekiriye; çavên wê bi rondik, ew dest bi lêgerîna naneyê dike.

Jineke din gazî wê dike: »Alo, keçika delal, ma tu naxwazî vejerî cem diya xwe, bextreşê?« Yeka din, gava porê xwe şeh dike, bi kenîn lê zêde dike û dibêje: »Eger diya wê nemire dê bi bekçiyê gund, Hasan re bizewice.« Alo dît ku va ye jineke rû xurû, porgij û pêşîrdaketi ber bi wê ve bi bazdan tê. Jinik xwe li ser lema striyan hildiavêje, bi milê Alo ya piçûk digire û dihejîne: »Çima tu hatî vir, keça mizir? Ma tu nizanî, li vir av kûr e? Ma tu dixwazî eqîbeta bavê te bê serê te?«

Ev qêrin û gazind wê ditirsinin, lê herweha ew xwe kêfxweş his dike. Ew serî di ber de ji ber wê jinika hêrsbûyi paşve diçe û disekine, bêî ku rûyê wê nîşan bide ka ew ci his dike. Jinik bi pitepit terka Alo dide û diçe ji bo devê şehê xwe paqîj bike. Yeka din gava cilên xwe li ser kursan radixe, ew ji diqîre: »Alo, keçika piçûk tu li ci digeri? Eger tu li wê derê li bin rojê bisekinî tu dê bimrî! Alo bi dengeki bilind bêî ku biqîre bersîv dide: »Ez li nane, qevdek nane ji bo diya xwe, ya nexweş, digerim.« Keçika piçûk dibêje qey ew dê wê bibihîzên û bela xwe ji wê vekin. Lê belê xumîna avê xurt e. Tu kesî ew nebihîst û gavek din dê jin rabin herin û Aloyê bi tenê bihêlin.

Alo tê nêzîkî peravê û di navbera qamiran re dibîne ku va ye li rexê din yê çemî, yê rojhelat, komek lawik dilizîn. Çiqas ji ti ye, ji dil dixwest ava paqîj vexwe û paşê ji avjeniyê bike heyâ ku di jiyanê de be. Beqek kesk ku li ser qamirekî bû bala Aloyê dîkişîne. Alo destê xwe dirêjî wî dike. Beq cil dide nav avê û xeleqeyên mezin li

ser avê peyda dike. Wê dixwest bizotek agir ji bin beroşen jinên dil bi rehm hilda û li pey wê beqê biavêta avê, yê ku dostaniya wê red kiribû.

Awirên wê diçin ser pûncek naneyê guldayî li kêleka avê. Wek daxwaza xwe ya avjeniyê, ew tîbûna xwe ji bîr dike; bi dîqet û bi pêçiyêن xwe, sehkar, xwe nêzîk dike. Ew difikire: »Masiyên mezin, di avê de hene.« Ew dizane ku av li vir kûr e û wê bi bêbextî dixapîne. Cihê ku di navbera wê û pûncê naneyê de ye, mîna tehtekî avkirî, şemitok e. Ew bi destê xwe seh dike û gav bi gav pêş ve diçe; û di nav bî û qamiran de nema tê xuya kirin. Ew li derûdora xwe, birek beqên piçûk yên çavbeloq û mezin ku li wê fedikin, dibîne. Her yek ji wan, ji hebek fasûlye yê qesartî, kesk û şemitok, ne mezintir e. Ew ji nava wan yekî piçûk hildide; û di nav destê xwe de, gava ew bi dengekî pirr nizim ji wî re stran dibêje, wî bi itîna diqulipîne.

Ji wê derê ew, jinên ku zarok yên devvekirî û kêmpporr hildane û diçin, dibîne. Beq jî, mîna zarokên piçûk yên ku bi hemî hêza xwe -dema diyên wan paleiyî de ne- gazi diya xwe dikan û diqîrin, devêن xwe yên fireh vedikin.

Beqê piçûk di nav destê wê de dike qur qur. Tu dibê qey ew dibêje: »Were, va, were, va!« Paşê bêdeng dibe. Mimkin e ku wî strana wê fêm nekiriye. Ihîmal e ku stran jê re zehmet be. Qur qura beq di wê dînyaya dorûberê çermî de, bixêrhatina yekemîne ku Alo dibihîze, keçika piçûk ji Sûlaq Dagerman, gundê axa yê zalim Hemokiya ye, yê ku derman nadî zarokên êtim, dema diyên wan nexweş in. Alo dixwaze bersîva bixêrhatina beqî bide. Ew, beq li ser qamirek pehn datîne, beq li wir bêtirs disekine. Alo bi dengek nizm ji wî re dibêje: »Ez ji te hez dikim.« Dawiyê, beqê piçûk ji keçikê aciz dibe û cil dide nav avê. Alo pirs dike: »Ma di bin avê de gelek tiş hene ku mirov bixwe?« Ji bêrika xwe çend pişûriyên nanî derdixe û ji kefa destê xwe dialêse: Ax, wê çiqas ji dil dixwest ew jî beq bayâ!

Li derûdor hertişt di bin bêdengiyê de ye. Ew bi rastî, xwe tenê û tırsiyayî, his dike. Nema tu dengek, tenê dengê zimînî vedigere guhêñ wê. Qamir dihejin û dilê wê bi kulpîn lê dide. Ew dê naneyê bifikire, yê ku dê diya wê rehet bike; ew bi awîrên xwe naneyên herî mezin û têrgul hildibêjêre. Lê av Alo dixapîne, gava ew destê xwe dirêji tayek naneyê dike û ber bi xwe ve dikişîne ... û dişemite!

Ji kûrahiyê, dengê qêrîna wê ya bêhn çikiyayî li nav peqikan dertên rûyê avê û peqik bi terizîn ji hev diçin. Serê wê yê piçûk i zer li ser avê xuya dibe. Ew destê xwe li ser avê dihejîne. Destê xwe ber bi aşîman bilind dike da ku karibe pê bigire; lê vê carê aşîman gelekî dûr e, dê gaveke din bi şîpê re bigehe hev û Aloyê li ber pêlan bibe. Tirsek dehşeti ya mirinê wê digire. Ew hawar dike. Ew bi hemî hêza xwe gazi diya xwe dike. Lê ava nerm, tarî û kûr wê bernade. Di demek pirr kurt de qevda naneyê ji hev dikeve. Nane! Ew hewl dide ku bi xurtî naneyê di nav destê

xwe de bişidîne; lê pêlên avê yên bêbext wê dixin nav destêن xwe, wê diqelibînin, careke din diqelibînin; û wê dadiqurtînin.

Alo, mîna kevirekî, dadikeve bin avê. Piyêن wê digehîjin herriya bin avê. Ew di serê xwe yê piçûk de, jiyan û serpêhatiyêن xwe yên ku wek gerfnekek dizvirin, his dike. Hertiş wê bi xwe re dikişîne. Ew diqire: »Dayê!« Dêya wê bersiv dide: »Destê min bigre Alo, delala min!« Birûskek û Muslim, li aständan ewran ji hev bela dike û mîna teyrê baz ber bi wê tê û şûtî jêr dibe. Ew wê dihejîne, wek dengê birûskê dike qêrin: »Alo, destêن xwe bavê gîya!«

Alo dibîne ku serê wê mezin dibe û paşê bi rûyê diya xwe, yê ku eniya wê pêçayî li paş diwaran, re dibe yek. Qamîrêن li qeraxan nuha wek bi hezaran destêن spî û reş xuya dikin. Ew destêن jinika rû bi xurû ya dest mezin dinase. Hezar rû xwe mi-rûz tîrş nîşan didin, di nav tariyê de seriyekî mezin dertê û dike qêrin: »Here qera-xê!« Destek wê dihejîne: »Ber bi qeraxê here xebîs!« Hemokiya çenek pişûriyêن nanî diavêje ser wê. Alo dadiqurtîne... dadiqurtîne... Serê axayî gelekî mezin bûye. Axa mîna wî kûçikê hestîkoj diranêن xwe qîç dike. Ew wê bi hişkî hembêz dike; û dev li sînga wê dike. Wê dixwest... Peqînok di rûyê avê de direqin. Diya wê ji wê re dibêje: »Bi çem te here Helebê. Ez jî bi te re têm.« Ew bi destê Muslimî digire, dîzvire û gazî dike: »Bihevre!«

Gerînekek mezin, ji her aliyî ve, wê ber bi binî dikişîne, çavêن wê dişewitîne, qirrik, sîng... wê ji hev dixîne. Ew his dike ku ber bi binê çemî dadikeve. Çavê roj yê zâlim tê bîra wê. Sîngâ wê mîna beroşek keliyayî dike ji hev biçe; dişe...

Av dikele. Porekî zer bi ser avê dikeve wek zadekî letîf ku li ber rojê zerbûye. Xeleqeyêن mezin li ser rûyê avê çêdibin. Kirasê wê yê sor yê bi deqêن spî dertê ser avê. Tu dibê qey çem diterize û şîn digire. Serê Aloyê yê piçûk di nav avê de geh dertê geh winda dibe, rûyê wê yê xweşik bi ser rûyê avê dikeve. Aständan wek hercarî, sa-kin û bêguhertin, mîze dike.

Ü şivan, yê ku êvarekê Aloyê ji avê derdixe dibêje ku tiliyêن wê li tayek naneyê mîna ku xezalok lê rabûbe(firk ketibûyê) hatibûn kîlît kirin. □

Ji swêdi: SERDAR ROŞAN

* Fatih el-Mudarris ji Sûriyê ye. Li Helebê di sala 1922 de hatiye dinyayê. Ev çîroka wî ji pirtuka »Arabiska Berättare« ya ku ji aли Ingvar Rydberg hatiye wergerandin bo Swêdî; hatiye wergerandin.

** Krang: Cureyekî strî ye.

*** Wena, li hin deveran »weyna«, »wêna« tê gotin. Rast: bînin! Di teksta swêdi de stran bi kundi ye.

Ango nehatiye wergerandin.



XEBAT ARIF

Şair

Çawî le xoll
Cestey: heresi bînîn u
Dillî tabût

Temêkî sûr berî çawanî girtûe
Reşebayekî sewz le pêy gorristan allawe u
sema leser merig eka
Tellizmî gella zerdekan
le ser u sîma eçeqên
Bo xwêñ ebin be berdebaz
Ziryanî sikalla u
Birînî roh

Awêkî reş lenêw demîyewe helleqûllê

Dengî le pêy ew minallanedaye:
Ke xoll be çaw
Heresi bînîn be ceste u
Tabût be dill
Egorrinewe

1996/11/26

Tenyayî

Lenêw çawimda: rûnakayît.
Le naximda: tallî u şîrînîy jiyan u
lenêw destima: ballindeyek,
le xwêni xoy
exwatewe.

Ke diyar nabî,
ser bo asiman hellebitrim u
le xwakan eparrêmewe:
leser berdêkî reş,
lenêw zenwêrê
bîrrwênin
ta sîmam roşin katewe.

Ke diyar ebî,
ser edeme ber qellbezey xewinekanim u
gwê bo awazî bêhawtay naxim egirim
le xwakan eparrêmewe:
leser balî firîsteyek
le nimcy rîjinebaranêk
bînexşênin
ta lem jînem
dûr xatewe.

Lenêw çawita: tarîkayîm.
Le naxitda: tallî u şîrînîy jiyan u
lenêw deste reşekanita: ballindeyek,
le xwêneket exwatewe.

1996/2/12

Lexogerran

Kesê be ballay xemim egrêt u
kesê leber gellarêzanî pêkenîna
cêyek bo rohî tasawim ekatewe.

Kesê embatewe bo satekanî pêş ledaykbûn u
destim enête nêw destî firîstekanî mergewe.

Le diyarî pakî xoşewîstîm daebirrêt u
be derbarî naşinayanî dwênenê u sibeynêm espêre.

Kesê dergayekî dillî xoy be rûy xewine lêllekanîma
ekatewe u be bezeyî u sozey gîryan,
matemînm daepoşê.

Le sate mestekanî tenyayî u xobînînda,
kesê rûberrûy tewijmî jîn u
gêjellûkey têkellbûnim ebatewe.

Minış lem tarîkistanî nebûn u hebûnda,
ledway Nakesê egerrêm,
ber pêyekanîm roşin ka u
tallê le nûrî ciwanî xoy leser çawanîm cê bêllê.

Kesê be ballay riqim egrêt u
kesê be ballay billindî xoşewîstî.

1996/7/25

Edebiyat û jîngeha wê

BORIS EICHENBAUM

Mirov tevahiya faktayan bi carekê kifş nake; wisan hindik, her weke ku du mirov hertim yek faktayekê di demekê de kifş bikin an jî pêwîstiya wan hebe ku her eynî tişti derxin meydanê. Tevahiya zanyariya me bi nîşaneke xwedî mane, bi gotineke din bi guhartineke ji tiştekî miweqqet derbasî faktaya bi maneyeke xwedî bityar ve, ne girêdayî ye. Ji tevahiya materyalên gewre yên ji dema borî ku di dokuman û destnivîsan de hatine komkirin, tenê beşek derbasî rûpelên dîrokê dibin; ango ev teorî maf û îmkan dide me ku em tiştekî ji nav van beşan di sistemekê de bi şeklekî cuda bi kar bînin. Ji ber ku hingê prensibeke ji bo hilbijartînê û zanyarikirinê tune; ji dervayî vê teoriyê de tiştekî sistema dîrokî jî tune ye.

Lê tevahiya teoriyan hîpotezên xebatê ne ku ji berjewendiyêñ faktayê bi xwe formen xwe werdigrin: Teorî ji bo jihevqetandin û civandina faktayêñ pêwîst û sereke di sistemekê de pêwîst e û ne zêde. Pêwîstbûna faktayêñ curbecur, pêwîstbûna nîşanên bi mane yên curbecur di dema nû de ji wan pirsgirikên ku di dorê de ne, têni nîşan. Tarîx bi xwe zanistiyekê ku ji danberhevên zor û tevlîhev, yên duawir pêk tê. Em faktayêñ dîrokî yên girîng ji hev diqetînin û ew bêguhartîn derbasî sistemê dibin; ew jî bêçare weke pirsgirikên girîng ji dema nû re dimînin. Bi vî awayî pirsgirêkek cihê xwe ji yeke din re dihêle. Bi vê maneyê tarîx metodeke taybetî ye ku mirov bi xwendinê dema nûjen, bi alîkariya dema borî fêr dibe.

Cîhguhartînen pirsgirêk û sembolên maneyan, rê dide jihevqetandina materyalên toreyî û hatina faktayêñ nû ku di sistemên borî de, ji ber kîmasiyêñ xwezayî ne temam bûn. Zêdekirina birrek faktayêñ nû (li gora merca muhteberbûna tiştekî) tê maneya kifşkirina wan ku hingê hebûna dervayî sistemê -tesaduf- di çavê zanistiyê de bi tunebûnê ve hevbes e. Zanistiya edebiyatê -û her wiha hinek jî rexne, ku herdu di teoriyê de bi hev re têne girêdan- niha li pêşberî vê pirsgirêkê rawestiya ye: Edebiyata hemdemî risteyek faktayêñ ku pêwîsti bi zanyariyê dibîne û dihêle derbasî sistemê bibe, derxistiye holê. Bi gotineke din pêwîstiyek heye ku pirsgirêkên

nû derkevin holê û hîpotezên nû, li ber ronahiya wan faktayên jiyanê giringiya xwe pêşkêş bikin.

Di van salên dawîn de, bala lêkolînvan û rexnegirêne edebiyatê di gavê yekem de ketiye ser »teknolojiya edebî« û şirovekirina xisusiyetên xweser ên pêşkeftinêne edebî; angò hundirê diyalektîka şikil û genrên nivîsê. Ev pêşketina edebî, pêvajoyeke tabî bû ku em gihiştinê û bi şoreşe edebî bi dawî hat (sembolîzm û futurîsm). Her wiha ev pêşkeftinêne girîng di van panzdeh salên dawîn de ji teref deryaya edebiyata teorîk ve hatiye berhevkirin. Pirr balkêş û ecêb e ku tarîxa edebiyatê di eslê xwe de li hêlekê hatiye danîn û ji rûmetia zanistiya wê şik tê kirin. Bi her awayî tê fêmkirin ku pirsên din ketine rojевê û pêwistiya analîz û lênihêrtinê derketine holê: »Mirov çawa dinivsîne?« û »wê di pêvajoyê de ci bête nivisandin?« Rêça teknoloji û teoriya zanistiya edebiyatê (lêkolîna tendensên pêşkeftî) di hundirê edebiyatê de ji rewşê il-hama xwe sitend: Girîng bû ku ev pêşketin bi ser hev de bihatina civandin û bersi-va pirsên ku di hundirê edebiyatê de ji nivşa nû dihat kirin, bide. Lêkolîna di der-heqa ka hunerê edebiyatê çawa çêbûye yan ji dikare çawa çêbibe, pêwist e bersiva pirsa yekem bide; pêkanîna »qanûnên« xwe yên konkret ji bo pêşketina edebiyatê jî ya duyem.

Herdu pirs ji nivşa ku berî deh salan kete nav edebiyatê re, li gorî pêwistiya xwe bûne rastî û niha di derecyeke bilind de bûye beşek ji zanistîyen akademîk û her wiha babetên lêkolînê. Dîrokê -ku bi piranî wisan dibe, van pirsan ji epîgonan (ke-sên ku di babetekê de li pey ên berê dimeşin û kar dikin, MD) re berda ku bi şiklekî şehane û jîrek (û bi piranî li ser kaxezê şehane) lê bê fantazî xebatê dikin û ji bo pergalên nû yên têgihîştinê kifş bikin û van zanyariyên xwe yên mezin pêşkêş bikin. Rewşa edebiyata me ya modern pirsên nû dipirse û faktayên nû pêşkêş dike.

Pêşkeftina vê edebiyatê ku hê nû xwe di profila form û dinamîzma şeklê nivîsê de eşkere kiribû, bi awayekî hatiye birîn û rawestiya ye. Tekoşîna edebiyatê karakterê xwe yî xweser yê berê wenda kiriye: Polemîkên paqîj ên mîna berê tune ne; komikên kovaran ên ku bi xetên vekirî ji hev cuda, »xwendegahêne« edebî yên ku pêşevaniyeke berbiçav bike û xwedî xwendevanên domdar, tune ne. Her nivîskar bi awayê ku hebin, forma xwe zêdetir li gora işaretên dervayî edebiyatê ku mirov dikare wê bi navê edebiyata jîngehê binav bike, bi awayekî ji bo xwe û ji bo komikên edebî dinivîse. Her wiha pirsên teknolojîk cihênen xwe bi awayekî eşkere ji tiş-tên din re hiştiye ku di vir de pirsgirêkên edebiyatara pîşeyî û xweser di navendê de radiwestin. Pirsa »mirov çawa dinivsîne?« cihê xwe ji pirseke din re hiştiye: »Maneyâ nivîskariyê ci ye?«. Bi gotineke din pirsgirêkên edebiyatê di pirsgirêkên nivîskar de hatin xeniqandin û lewra jî babetên mîna »nivîskar û weşanvan«, »nivîskar û xwendevan« û hwd ketine rojevê.

Mirov dikare bi awayekî xwedî birtyar bibêje ku îro ne edebiyat bi xwe, lê hebûna wê ya civakî ketiye krîzê. Rola pîşeyî ya nivîskar hatiye guhartin, xwendevan guhi-riye; ew şertên wê yên gelamperi û formên karûbarêne edebiyatê hatine guhartin. Di jîngeha edebiyatê de guhartinike ji sedî sed çêbûye ku ristek faktayêne di derheqa edebiyatê û pêşkeftina wê ya bi şertên dervayî edebiyatê ve girêdayî ne, derketine holê. Jinûve komikbûna civakî weke şoreşê û derbasbûyina nîzama nû ya aborî, bi xwe nivîskar jî di hinek awayên pîşeyî de (bi kîmasî di dema borî de) ji faktoren piştgiriyê bi tenê hiş -tebeqeyek xwendevanenê gihiştî û sabîr, rîexistinê kovar û weşanxaneyan û hwd- û her wiha ew jî pêwistiya berê bêtir mecbûri profesyoneliyê kir. Pozîsyona nivîskar nêzîkayî li karkerê sîparîşê kir ku maneya edebiyata »sîparîş« bi xwe bê birtyar bû yan jî di derheqa wezîfe û masfîn wî yên edebî de ket dijî pozîsyona nivîskar. Şiklekî nû yê nivîskar derket ortê -karkerekî pîşeyî û amator ku bêyî li ser bingeha tiştekî bifikire, xebateke bi amatorî li ser sîparîşê afirand. Rewş ji ber sedemên dijberiya herdu edebiyatan, ku ya kevn wateya pîşeya xwe fêm nekir û wezîfeya xwe bi awayê ku jê dihat xwestin û weke mîna ya nû nekir, zortir bû. Rewşike wisan peyda bû ku ev rewşa nivîskar û edebiyata Rûsyayê di destpêka salên 60-an de (dema ku yên kevn dest pê kirin û gotin ku pêwist e mirov dev ji edebiyatê »berde« û çaxê Turgenev ji Fet re »tiştekî bê kirin nema ye hevalê min! Dema ku em ji pêşıya ciwanan derkevin hatiye. Lê belê ka ew li kur in û ka mîratkwarên wan?«) tîne bîra me; tenê formên bêtir tevlîhev û nenas.

Tabî'î ye ku di vê rewşê de pirsêne ji tebieta edebî bi taybet bipêşketin û bûn aktuel û her wiha komikên nivîskaran jî dan pey vê motivê. Ev ne zêde faktayeke pêşkeftinê bû (bi kîmasî di maneya kevnariya xwe de) ku weke guhartin derkete holê û ji wir, berê edebiyatê da pirsgirêkeke teorîk ya nû, ango têkiliyên di nav pêşkeftina edebî û rastiya jîngeha edebî. Ev pirsgirêk ji ber ku rewşa edebiyatê di hundirê xwe de van faktayan dernexistibû pêş, di avahiya sistema dîrokî ya edebiyatê de tu-ne bû. Niha şewqa wan i zanistîyê ji ber ku prosesa pêşkeftina edebiyatê di wê forma ku li ber çavêne me xwanê dike, ketiye dorê; yan jî fîmkirina wê ne mumkin e.

Bi gotineke din em dîsa têr ser pîrsa »ka faktaya tarîxa edebiyatê ci ye?« Pêwist e ku tarîxa edebiyatê li gora navê xwe ji nû ve weke dîsiplîneke zanistî û pêwist, pirsgirêka edebiyata modern veke. Bêtaqetbûna rexneyên dema me û hinek jî lêvegerîna prensibên kevnare û mihandî, dikare bi awayekî giştî bi kîmasiya têghiştina tarîxa edebî bê manekirin.

...

Ji swêdi: **MIHEMED DEHSIWAR**

*Ev nivîs ji pirtûka bi navê »Modern litteraturteorî« beşa yekem hatiye wergirtin.

Kendal:

"Di fonksiyona entellektuelî de berpirsiyariyeke civakî heye"


Nûdem: *Demeke dirêj di ser avakirina Enstituyê re derbas bûye. Ji bo ku em careke din dîroka avabûna Enstituyê di bîra xwendevanan de bînin, em ê bixwazibin tu ji kerema xwe re ji me re behsa avabûna Enstituyê û girîngiya enstitusyonan biki?*

Kendal: Enstitû di sibata 1983an de vebû. Ev bûn 14 sal. Enstitû bi piştivaniya rewşenbirên kurd ên hêja Cigerxwîn, Yilmaz Guney, Hejar, Qanatê Kurdo, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza û bi alîkariya maddî û manewî ya hikûmerta sosyalist a Fransayê hate danîn. Amanca wê ya sereke ew bû ku li welatekî demokratik arşîvên gelê kurd, pirtûk, belge, wêne, filmên kurdî an bi zimanên biyanî li ser gelê kurd, li ser dîrok, çand û jiyana wî berhev bike, biparêze, têxe xizmeta lêgeran.

Di ber de, me bernameyek din jî danî jo bo gihadina elîten zanistî û çandî ji bo hemû perçeyên Kurdistanê. Di wê demê de, ji ber şerê Iran-Iraq û darbeya leşkerî ya li Tirkîyê, bi carekê gelek rewşenbirên kurd hatîbûn Ewropayê, rôexistinên Kurdan ên siyasi pirr bûn lê mueseseyên çandî kêm bûn. Ji ber vê yekê gelek daxwazî, xwestek û pêşniyar digihîştin Enstituyê. Kurd ji vê yekem mueseseya kurdî ya ji alî dewleteke mezin ve naskîri pirr tiştan dixwastin.

Me li gor imkanên xwe yên maddî hin ji van hewcedariyan xistine nav bernameya xwe: xebatêni li ser zimanê kurdî, derxistina bulteneke mehane ya agahdariyê bi zimanên ewropî li ser rewşa îroyî ya gelê kurd; derxistina kovareke kurdî (Hêvi) bi sê zaravan (kurmancî, dimîlî, soranî) û ya kovareke lêgerînên civakî (Studia Kurdiaca); çalakiyên hinerî (konser, pîşangeh, konferans) û civakî ji bo Kurdên Fransa û ji bo Fransizan.

Di nav salan de hin ji van xebaran pêşve çûn, cihê xwe girtin.



Kendal Nezan: "Rola entellektuelan a di jiyana civakî de weki rola generalan a di jiyana leşkefi de ye"

Pirtûkxaneya me îro dewlementirîn pirtûkxaneya kurdî ya cihanê ye. Tê de bi 25 zimanîn nézî 6500 pirtûk, kolleksiyonên 140 kovarên kurdî, qasî 80.000 pirtûkok, belavok û belgehên cihê; perçe-rojnameyên rojavayî li ser Kurdan ji salên 1920an vê de, foto, diyapoziitif, filmên video hwd. hene. Hebûna vê pirtûkxaneyê li çar ali-yê cihanê ji lêger û pisporan ve naskirî ye. Riya kesên ku li ser pirsa kurdî dixebeitin, doktora çedîkin, pirtûkan dinivîsin bi awayekî di Parisê de, di pirtûkxaneya me de derbas dibe.

Di warê gihadina elîtan de, Enstitû ta niha ji 227 xwendekarê kurd re bûrsêni xwendina bilind peyda kiriye û ew li çend welatên Ewropa dane xwendin. Ev, xwendekar ji hemû perçeyên Kurdistanê bi destê komîsyonek têne helbijartin. Em girîngiyeke mezin didin pêşveçûna jinê kurd û niha dora 40% ên xwendekarê me keç in û ya rastî keç çêtir ji dixwînin. Di nav hev de, ta niha qasî 80% xwendekarê me xwendina xwe di wextê de temam kirine, bi serketine, diplomayêni xwe standine. Hin ji karibûne xwendina xwe bi derengî xelas kin. Heçî kesên ku xwen-

dina xwe nîvcû hîstîn, ew jî bi hindikahî zimanekî ewropî yên girîng hîn bûne û di warê xwe de bi vî zanînê dikarin xizmeta doza kurdî bikin. Bultena me ya agahdariyê ev bûn 14 sal bi awayekî rêk û pêk dertêñ û ji pirtûlxane zanîngeh û legerên 85 welatan re têñ şandin. 141 hejmarêñ ta niha derketî tevíhev dikin 15.375 rûpel. Hecî kovarêñ Hêvî û Studia Kurdica, pişti demekê em gihan wê baweriyê ku ji bo derxistina wan bi sewiya edebî û zanistî ya ku me dixwast potansiyela heyî têr nave. Di sala 1983-84an de Hêvî yekem kovara çandî ya kurdî bû li Ewropa ku seranser bi kurdî derdiket. Paşê, ji ber sedemîn cihê, kovarêñ kurdî yên din derketin, ku em pê gelek kêfxweş in: Nûdem, Çira, Armanc, Berbang û hin kovarêñ kurdî yên din ji potensiyela edebî ya kurdî re bersiv didin. Çêtir e ku em piştîvaniya wan bikin û giraniya xwe bidin xebatêñ din.

Xebatêñ me yên li ser ziman berdewam in. Ferhenga me ya kurdî-fransızî ji çapê re tê amade kirin. Hin hevkarêñ me niha li Kurdistanê ne ji bo fotoyêñ giya, külîlk û çûkan bikşinin ji bo ferhengê.

Xeynî van xebatêñ bingehî, Enstitû li gor rewşê di warê mafêñ mirov de hin xebatêñ lobbying, ango ji doza kurdî re li Rojava dost û dilxwazan peyda kirin pêkaniye. Konferansêñ navneteweyî yên Parisê (1989), Waşîngtonê (1990), xebatêñ me yên ji bo Kurdistana Iraqê û yên ji bo berdana parlamentarêñ kurd, çalakiyêñ me yên li Parlamenta Ewropa, hwd, bawer im ji alî xwendevanêñ we ve têñ nasîn.

Hin karêñ ku kêmîtir têñ nasîn hene, weke belavkirina weşanêñ kurdî. Me ta niha 20 kasetêñ müsîqiya kurdî, qasî 20 filmêñ video bi zimanê kurdî û çend pirtûkan li ser Kurdan derxistiye. Hin weşanxaneyêñ ewropî bi alîkariya Enstituyê bi fransızî, almanî, îngilîzî li ser Kurdan pirtûk derxistine. Yek bi yek wan bi nav kirin ji çarçeva vê hevpeyvînê derdikeye. Me wisa jî ji bo xwendegehêñ despêkî û navîn ên Kurdistanê, bi alîkariya hin rêxistinêñ mirovhiz, qasî 280.000 pirtûkêñ dersê çap û belav kirine. Hejmareke bilind semîner, konferans, pişangeh, konser çêbûne bi destê Enstituyê; bend û nivîsar derketine di rojnameyêñ rojavayî de ji bo nasan-dina Kurdan, bi radyo û televizyonan re pirr hevpeyvîn hatine çekirin. Bi kurtî, di 14 salan de qasî ku îmkan û zanîna me rê daye me di warê xwe de ji çand û doza kurdî re xizmet kiriye. Loma hikûmeta Fransa, bi biryarnameyek ku di 2 adar 1993an de ji alî serekwezîr ve hatiye îmza kirin Enstituya kurdî weke "weqfeke ber-jewendîya giştî" nas kîfî ye ku tu nueseyyêñ Tirkan an Îraniyê xwedîyê vê statuyê nîn in li Fransayê, ên gelên din jî bi tiliyêñ du destan têñ jimartin.

– Xebatêñ we niha çawa ne? Hün ci dikin?

– Xebatêñ me yên bingehî (pirtûlxane, gihadina xwendekaran, derxistina bul-

tena agahdariyê, xebatêni li ser ziman, belavkirina weşanên kurdî, nasandina rewşa mafêni mirov li Kurdistanê, çalakiyên çandî û civakî) berdewam in. Di rewşa dij-war a Kurdan, di nav tengasi û dijwariyên cihêreng de, van xebatêni pêwist domandin, mueseseyek çandî jiyandin, serxwebûna wê ya fikri û biryarî parastin ne hêsa ye. Nemaze di demek ku, ji ber sedemêni ku ji we ve têni nasîn, nav û îmaja Kurdan li derva gelek xesar dîtiye û beşekî ne kêm ê rewşenbirêni Kurdan û gelek ji dost û dîlbawazêni ewropî yên gelê kurd mixabin ketine nav bêhêvityî. Di van rojêni reş û teng de li piya mayin, jiyan û xebat domandin ji bi serê xwe serketinek e.

– *Yek ji xebatêni Enstituyê ji xebata "Kurmancî" ye. We kengî dest bi vê xebatê kir? Hün bi metodeke çawan dixebeitin?*

– Me di sala 1986an de biryar da ku salê du caran civînen taybetî bêni çekirin li ser pirsêni zaravayê Kurmancî. Her civînek hefteyek dom dike. Me civîna xwe ya zian di destpêka nîsana 1997an li Swêdê çekir. Qasî 15 ta 20 rewşenbirêni kurd ên ku li ser pirsêni ziman xebitîne, an devoka navçeya xwe baş dizanin vedixwînin van civînan. Ji hemû navçeyêni kurmancıaxêv en Kurdistanê ango ji Kurdistana İranê, ji Behdinan, ji Kurdistana Sûriyê û ji çibigre tevahiya navçeyêni Kurdistana Tirkiyê beşdarêni me hene. Beşdar bi hevre qasî deh zimanen dizanin û hemû ferhengêni kurdî yên heyî bi kar tînin. Amanca civînan berhevkirin û zelalkirina peyvîn kurdî yên di afirandinêni nivîskî yên berê û peyvîn devokêni kurmancî û di ber de ji çekirina hin peyv û termen ku ji bo jiyana çandî ya hemdem û ji bo zimanê nivîskî pêwist in. Xebatêni civînan, weki hemû xebatêni zanistî, li gor prensîbi konsansusê pêşve dicin; beşdar hewl didin ku ji gelek aliyan de li pirsekê bê nihêrin, ku peyvîn dîti li gor çêbûni û mantiqa kurmancî bin û ku berhemeyeke têkûz derkeve. Gava ku li ser pirsekê konsansus peyda nebe, wê pirsê dihêlin civînekê din. Encamên her civîni di hejmareke taybetî ya rojnameya Kurmancî derdikevin û ji vê rojnameyê 3000 têni belav kirin. Ewê di van nêzan de 20 hejmaraen Kurmancî tevî fihristêni kurdî, fransızî, îngilizî û tirkî weki pirtûkek bêni çap kirin.

– *We berê civîna "Kurmancî" li bin welatêni din çedikir, lê ev çend sal in hün li Swêdê çedikin, sebeba vê ci ye?*

– Piraniya hevalêni beşdar li Swêdê dijîn û xwendegheha Biskops Arnö ya ku em lê dicivin ji bo xebatê ciyekî pîr baş e. Ji bo ku xercêni civîni ji Enstituyê re nebin barêkî giran me bi hev re biryar da ku bi awayekî giştî em civînen xwe li Swêdê çekin. Lê heye ku li gor îmkan û pêşniyaran em carna civînen xwe li welatêni din ji çekin.

– *Li Swêdê gelek caran minaqeşeya "rewşenbirî" û "rewşenbirîya kurdî" tê kirin. Gelo rewşenbirî ci ye û rewşenbir kî ne? Tu dikarı ji kerema xwe re tarîfeke*

rewşenbîriya kurdî bikî û rol û berpirsiyariyê rewşenbîrên kurdan bînî ziman?

– Ev pirseke fireh e û jê re bersiveke kurt dayin dijwar e. Peyvên rewşenbîr û rewşenbîrî di demêñ dawîn da bi riya soranî ketine kurmancî. Soran bi xwe ew di şûna munewwer a osmanî (ku bi eslê xwe erebî ye) aydin a tirkî çêkirine û bi kar tînin. Nûbûna van peyvan bi xwe nîşan dide ku di jiyanâ civakî ya kurdî de kesen ku mirov vî navî li wan ke tunebûne an pirr kêm bûne, loma jî civakê ji wan re peyvek taybetî çenekiriye. Gava ku eynî civak ji bo hêman, çin û qorêñ din ên xwe bi sedsalan peyvên kurdî yên cure cure durist kiriye: gavan, şivan, berxvan, golikvan, rîncber, aşvan, çolang, dengbêj, hwd. Ta demêñ nêzik di civaka kurdî de di warê xwendin û zanînê de, di xebatêñ hişî de, xwenda, zana, jîrik an aqilmend, mela, seyda, alim an şêx hebûne ku ew an zaneyêñ ilmêñ islamî bûne, an yê hune-reñ şî'rê an jî bi tecribeyêñ xwe yên jiyanê jîrî hatine hesibandin.

Rewşenbîrî bûyereke nû ye di jiyanâ civakî ya kurdî de. Di dawiya sedsala 19 û destpêka sedsala 20an dest pê dike. Wê demê li Stembolê, ji nav zaroyêñ mîr, mîrek û serekêşîrêñ kurd ên ku li Stembolê dixwendin desteyek rewşenbîrên kurd ên nûjen peyda bûn. Hin ji wan, wekî Abdullah Cewdet, di jiyanâ fîkrî ya imparatoriya Osmanîde roleke girîng leyistin, rewşenbîrên bilindfir bûn, xwedî sewyeyek bilind bûn. Hinêñ din hîmêñ tevgera vejîna çandî û welatparêziya kurdî danîn, wekî Bedirxaniyan, Memduh Selim, Tewfîq Wehbî, hwd. Meriv dikare bêje ku di salen Şerê Cihanê yê yekem de êdî dendikê rewşenbîriyeke (intelligentsia) kurdî çê bûbû. Bêguman, ev rewşenbîriya kurdî ne tenê li gor yên ewropî lê li gor yên gelên cîran (ermenî, tirk, erreb) jî hê qels bû. Bi ser de, ew hate tarûmar kirin û di her nîşê de dewletêñ ku welatê me li hev parve kirine berî her tiştî hewl dane ku bi awayêñ cihê rê li peydabûna rewşenbîriya kurdî bigrin. Bi zimanê gelerî dibêjin ku "dewlet nahêle ku serî ji nav Kurdish derkeve". Ev jî rast e, ji ber ku rewşenbîr mîjîyê civakê ye. Çawa ku gava mîjî û aqîlê yekî temam nebin laş û gewdeye wî, hêza wî ya fiziki çiqas xurt be jî nikare zêde pêşve here, dibe hemal, rîncber an emele. Gelê ku rewşenbîriya wî qels be, çiqas mîrxas û fedakar be jî nikare pêşve here; ji aliye cîranen jîrtir, ango xwedî jîrîtiya giştî ya pêşvetir tê xapandin û bi kar anîn. Jîrîtiya giştî berhema bi sistermîrî ya rewşenbîrî ya geleki ye.

Niha em werin ser naveroka peyva rewşenbîr. Ev peyv her çiqas di şûna peyva entellektuel de bi kar tînin jî, ez ne bawer im ku ew bikaribe bi rastî ciyê wê bigre. Entellektuel ew e ku ji bo naşîn û têgihiştina tişt, heyîn û bûyeran hişê (peyva latînî intellectus tê maneya hiş û jîrî) xwe bi kar tîne, ne bîra (hafiza) xwe. Di bîrê (hafizayê) de bûyerêñ bihûrî hene; xwedî bîreke xurt bûyîn nayê mana jîrbûnê. Hin ha-

fiz-ul Quran an dengbêj hene ku bîra wan gellek xurt e; lê gelo ew jîr û zane ne? Di hin warên zanînê wekî matematîk an mekanîkê, tişten ku bi bîranîna wan pêwest in tenê çend prensîbêngingehî ne. Bîra entellektuel ne ronî û rewşen e, heye ku di hin waran de fîkr û ramanêng wî yênen ronak hebin. Karê wî yê sereke bikaranîna hiş û muhakemeya xwe ye ji bo safî kirin, ji hev derxistin û têgihîştina pêkahîya (realita) tiş, kes an bûyeran e. Ew ji bo çêtir têgihîştina pêkahîyê hişê xwe bi awayekî rexneyî bi kar tîne. Hişê rexneyî bi zanîn, tecrubeyen şexsî an yênen kes û civakêng din (bi riya xwendin, dîtin û bi karanîna çavkaniyêng zanînê di warê xwastî de) çê dibe, pêşve diçe, xurt dibe. Ji bo nimûne, kesekî adetî heft tengen keskesorê jihev derdiye, gava ku resamekî oste, xwedî tecrube, xwedî nêrin û hişekî rexneyî dikare qasî şes sed nuansên rengan nas bike. Entellektuelekî di warê edebiyatê de zane dikare bi saya bikaranîna hişê xwe yê rexneyî li helbestekê an nivisarekê ji gelek awayan de rexne bigre, ji kujêng cihê de lê binêre, kêmâsi û bedewiyêng wî bide pêş çavan. Nabe ku em bi çavekî menfi li rexnegiriyêng binêrin. Bertold Brecht dibêje "li guleke bedew binêrin; her kesê xwedî hesteke estetikî ya asgarî dikare bêje ew bedew e, lê ke-sê pispor dikare wê gulê pel bi pel ji hev derxe, li bedewiya her pelî bi kûri binêre û wê çaxê ewê ji bedewiya tevahiyêng gulê gelek xurtir hiz bike". Ji kesekî nîv-xwenda bipirsin: Edebiyat ci ye? Ewê bersîva wî çend hevok bin. Sartre ji vê pirsê re bi pir-tûkek qasî 500 rûpel bersîv daye.

Di zanistiyêng musbet (fizîk, kimya) an ên jiyanî (biyoloji, bijişki) de jî xebata entellektuel, di bingehê de, her bikaranîna hişê rexneyî û bi vê awayî berebere çêtir têgihîştina bûyeran û helkirina pirsgirêkan e.

Divê ku di warên zanistiyêng civakî û siyasi de jî ev wisa bûna. Lê di van waran de pirîcar bawerî, iman, hikmîn pêşin wekî perdeyek reş pêşî li hişê rexneyî digrin; wehiya dahatî ya Xwedê, hedîsen pêxemberen wî, fetwayen ayatullah û şêxen dînî an siyasi, bê munaqeşe, wekî rastî têng qebûl kirin û pêşî li pêşveçûna civakê, ya ramane, ya hişê rexneyî, ya jiyana fîkrî digrin. Ev yek tenê li nav civakêng paşdemayî naqewimin. Di dîroka nêzîk de entellektuelêng mezin wekî Heidegger, Céline, ji ber rika wan a li dijî burjuaziyê û "demokrasiya wê ya sist" piştîvaniya nazîzmê kirin, gelek entellektuel û hunermendêng ewropî yêng bijare li ser navê pişgirtina çî-nêng bindest piştîvaniya Stalîn kirin. Meriv çiqas zana be jî, di hin rewşan de, nikare xwe ji tesîra hesten xwe rizgar bike; dil ji hiş re serdest derdikeve, entellektuel ji bir-yarêng xelet didin. Xeleriyêng kesekî ji rêzê tenê ziyânê dighînin wî û der û dora wî. Rola entellektuelan di jiyana civakî de wekî ya generalan e di jiyana leşkerî de. Gel bi jîrî û zanebûna wan bawer dike û dide pey wan. Çawa şâşiyêng generalekî dîbin

sedemên şkestina leşkerêni wî, şâştiyêni entellektuellan jî ziyanêni mezin dighînin ci-vaka wî. Loma di fonksiyona entellektuellî de berpirsiyareke civakî heye û ji ber vê berpirsiyarê kesêni ku xwe entellektuel dihesibîniñ divê hişê xwe bi awayekî serbix-we ji taasub û tirsê dûr, ji menfatêni şexsî dûr, bi kar bînin, arîkarî bidin çêtir dîtina rastiyân.

Gotina pêşîyan “nîv hekîm meriv ji can dikin, nîv mele ji din û iman dikin” ali-yekî din ê berpirsiyariya entellektuelan nişan didin. Divê ku ew timî bixebeitin ku di warê xwe de xwe pirr baş bîghînin, xwe ji nîv-zanayıyê rizgar bikin, ta ku bika-ribin bizanîna xwe baş arîkarê civaka xwe bibin.

Bi kurtî, tarîfa min a entellektueliyê ev e.

Ku rewşenbîri intelligentsia ango deste an çîna entellektuelêni civakek be, bi dîtina min meriv nikare bêje ku iro rewşenbîriyeke kurdî tune ye. Heye, lê, ew jî bi se-wiya paşdemayina gelê me ve girêdayî ye; qels e û paşdemayî ye. Lê herwekî niha qasî milyonek Kurd li weletên Rojava, di nav imkanêni çandî yên nûjen de dijîn û bi milyonan Kurdêni din jî di bajarêni mezin ên Rojhelata navîn de dijîn û nêziktirê imkanêni xwendin û xwe pêşvebirinê ne, hêviyek mezin heye ku di demeke ne pirr dûr de ewê rewşenbîriyeke kurdî ya xurt, nûjen û nêziktirê standardê ewropî pêk bê. □

Hewî

Beş: 2

XEMGİN TEME

Cih mala Ehmed Axa, ode bi xalîçeyên ecemî raxistiye, mîhvan rû-nıştine, li ber pala wan balgî hene, hemû bi kîf û eşq in.

Ehmed Axa: Hûn bi xêr hatin mîhvananê ezîz.

Şêx Eli: Xwedê xêrê bide te, me pir bêriya te kiribû Axayê min.

Ehmed Axa: Tu Şêx me yî, bê te, em nizanin tiştekî bikin, kesê wek te bi xêr û bereket, rêya rast û durust şanî me dikin.

Şêx Eli: Em hemû evdên Yezdan in, ew rêya rast şanî me dike.

Ehmed Axa: (*Berê xwe da Silo*) Silo, bi lez qehwê ji mîvanan re bîne.

Silo: Belê, belê Axayê min. (*Zû helist û ji odê derket.*)

Ehmed Axa: Diyar e ku tu diêşî Şêxmûs Paşa?

Şêxmûs Paşa: Hê ew jana min a kevn e, çığa dermana dixum, bê çare ye.

Ehmed Axa: Xwedê heye, dê çarekê bike. (*Helist û ji odê derket.*)

Şêx Eli: Xwedê belan dide û belan dibe, hemî tişt bi destê wî ye.

Mele Emer: Rast e, Şêx min, rast e. (*Helist û li ber Şêx serê xwe tewand û destê wî maç kirin. Ehmed Axa derbas bû.*)

Ehmed Axa: Şêx min, pîrek û zarok dixwazin destên te maç bikin, da tu wan ti-berik bikî, heger tu bikaribû ji kerema xwe werî derve.

Şêx Eli: Ez ê bêm, Xwedê emrê giştikan dirêj bike. (*Helist û ji odê derket. Salar derbasî hundur bû.*)

Salar: Selam û eleykum. (*Giştik bi hev re*)

Giştik: We eleykum elselam.

Şêxmûs Paşa: Tu çawa yî mamoste?

Salar: Ez baş im, tu çawa yî?

Şêxmûs Paşa: Serê te sax bê, dewlet Xwedê û serê xwendevanên wek te, ez baş im.

Mele Emer: Salar miroveki zane ye Paşayê min. (*Salar beşîş, pêheneki di rûyê wî de diyar bû.*)

Salar: Seyda, tu li pêş min pesnê min didî, Xwedê dizane ka bê tu li pişt min ci dibêjî!

Mela Emer: Na, Salar, ez tim û tim bi qencî behsa te dikim.

Şêx Eli: Xwedê we bihêlê, Xwedê we mezin bikê, cihê we behişt bê, Xwedê we efû bike. (*Dengê wî di pişt perdê de dihat û dawî ji pişt perdê diyar bû û hat li cihê xwe rûnişt.*)

Salar: Tu bi xêr hatî Şêx Eli.

Şêx Eli: Xwedê xêrê bide te. (*Cibe ji xuwe kir û danî ser balgî.*)

Ehmed Axa: Şêxê min firavîn hazır e, heger hûn bixwazin, dê deynin?

Şêx Eli: Daxwazeke me heye, em dixwazin pê biştexilin, bi dû re em ê xwarinê bixun.

Ehmed Axa: Bibêje Şêxê min. (*Silo derbas bû, cezwê qehwê, du fincan û gehwa tehl di desten wî de bûn. Fincan dagirtin.*)

Silo: Fermo Şêxê min, ez heyran. (*Fincan danî ber Şêx.*)

Şêx Eli: Estefxir ellah, em heyranê Xwedê ne.

Ehmed Axa: Silo, çima tu wisa dereng ma yî? (*Berê xwe da Silo.*)

Silo: Axayê min, heta min qehwe hûr kir, ez dereng ketim, qehwa hûrkirî tune bû.

Ehmed Axa: Rabe derkeve, here alîkariya pîrekan bike. (*Silo derket.*)

Şêx Eli: Em hatine mirovatiya te, em hatine keça te bixwazin.

Ehmed Axa: Ji kê re?

Şêx Eli: Ji Şêxmûs Paşa re, ew dixwaze mirovatiya te bike.

Ehmed Axa: Şêxmûs Paşa hevalê min e û keça min biçûk e. (*Li Şêxmûs Paşa meyze kir. Şêxmûs Paşa serê xwe nizm kir.*)

Şêx Eli: Axayê min ê mezin, ez dizanîn ku malbata te bilind û berz e. Şêxmûs Paşa ji ji malmezinan e, ma tu dê mirovatiyê li gel kê bikî? Tu dizanî ku kese-kî maldar û dewlemend e, gundê wî hene û sermiyan e. Wê keça te xweş û paqij li nik wî bijî.

Ehmed Axa: Ew kesekî bi jin e, ez ê çawa keça xwe bidim ser hewiyê?

Şêx Eli: Tu xweş dizanî ku di dînê me de, du jin ji mîrekî re helal in. Dawî ji tu

serbest ì, tu dizanî ku ez dixwazim ku hûn bibin mirovên hevdû. Ji ber ku Şêxmûs Paşa bi nav û deng e. Ez bawer im ew biçe keça kê bixwaze, wê bidinê.

Mele Emer: Tiştê ku Xwedê li ser aniya însên nivîsi be, dê bibe. Axa tu dizanî ku Şêx Eli, Şêxê me giştikan e, xêrê ji me hemûyan re dixwaze. Em hemû mirîdên wî ne.

Şêx Eli: Xwedê helal kiriye, tiştê ku Xwedê helal kiribe, ne guneh e. (*Eslan derbas bû, zirne di destê wî de ye.*)

Eslan: Eselam û eleykum.

Hemû tevde: We eleykum elselam.

Ehmed Axa: Eslan rûne. Çima tu wisa şipiya mayî? (*Eslan rûnişt.*)

Eslan: Diyar e ku iro şensê min heye. Mêvan pir in, hemî jî malmezin in.

Ehmed Axa: Eslan tu çîma ne diyar ì, tu bi ku de diçî?

Eslan: Ez li qûtê xwe digerim, tu dizanî ku niha havîn e, divê ez bigerim divê bîçim dawetan, niha dema dawet û dîlanan e.

Ehmed Axa: Min digot qey tu ji bo qutê xwe hatiye ba min, ya jî tu hatiye min bîbînî?

Eslan: Ji bo herduyan ji Axayê min. Ez qet te ji bîr nakim, tu mezinê me yî û Axayê me yî, em jî qereçiyêne we ne.

Giştik: Ha...ha...ha...

Ehmed Axa: Tu wisa min bilind dikî, da ez gellek peran bidim te.

Eslan: Ez bibêjim û nebêjim tu bilind ì û ji malmezinan ì, tu dê para min bidî min, Elhemd allah, hûn gellekî merd in. Diyar e ku Şêx jî hatiye dana xwe.

Şêx Eli: Ez ne qereçî me, heyâ li danê bigerim, misilman zikê didin min.

Eslan: Ferq nîne Şêxê min. (*Zirne danî ber balgi.*)

Şêx Eli: Ev dana ku didin te guneh e, heram e, qet xêr jê nayê, pars e. Pars di dînê me de heram e. Lazim e tu kar bikî. Xwedê zend û bend dane te, ji bo ku tu bi wan kar bikî.

Eslan: Ma tu çi karî dikî Şêxê min? Zikê didin te, ew jî pars e.

Şêx Eli: Ez bi mal û perê ku millet dide min, mirîd û feqan xwedî dikim, ez xelkê didim xwendin, da ku dînê xwe nas bikin.

Eslan: Ez jî kêt û eşqê di nav xelkê de belav dikim, li zirnê û kemançê dixim û wan dildar dikim, dilê xort û keçan şâ dikim, ez evînê di nav millet de belav dikim, ev e dermanê millet.

Şêx Eli: Tu millet dixapînî, wisa dîn û axreta xwe ji bîr dikin. (*Salar keniya*)

Eslan: Ev urf û adetên millet in, ev folklora millet e, ez hebim û nebim ji dê millet vî tiştî bike, bê wilo nabe. Xwedê mirov ji bo hezkirinê çekiriye. Dev ji bo maç û ramûsanan çekiriye, çav ji bo dîtina rewş û cemalê çekiriye, guh ji bo bihistina dengê muzîkê, ê bilibil û kewan çekiriye, poz ji bo bêhkirina nêrgis û gulan çekiriye.

Hemû: Ha...ha...ha. (*Bi dengê bilind Keniyan*) Silo derbas bû.

Silo: Xwarin hazır e Ehmed Axa, dê sar bibe.

Ehmed Axa: Bila bi dû re disa germ bikin. Here heyâ ku ez gazî te bikim. (*Silo derket.*)

Eslan: Baş e, ez dê goşt ji bixum, ez ê tim û tim pesnê Ehmed Axa bidim, ji ber ku di mala Xwedê merd e û qedrê mewanan digire.

Şêxmûs Paşa: Eslan, tu gellekî dipeyivî, zimanê te pirr dirêj e. Heger careke din tu zimanê xwe li ber Şêx dirêj bikû, ez ê zimanê te jê bikim.

Eslan: Ne ku ez zimanê xwe dirêj dikim Paşa, ez û ew ji hevdu dûr in, wek dûrbûna erd û asimên. (*Bê deng bû û tirsîya.*)

Mele Emer: Bes e, dev ji Eslan biqerin, ew kesekî mitirb e, divê mirov xwe neke kemança wî, tu kes nikare şerê mitirban bike, ew hetikî ne, kesê ku ket devê wan, hat hetikandin û navê wî ket stranan.

Salar: Eslan rast dibêje.

Şêxmûs: Tu xwendevan i, tu mamoste yi, tu çawa radibî wî bi heq derdixî, tu mitirban baş nas dikî.

Salar: Mitirb jînê xweş dikin, dildariyê û evîniyê belav dikin. (*Salar helist.*)

Ehmed Axa: Tu dê ci bikî Salar.

Salar: Ez ê biçim karê min heye. (*Li saeta xwe meyze kir.*)

Ehmed Axa: Bi me re firavînê bixwe, firavîn hazır e.

Salar: Na, ez ne birçî me, lazîm e ez biçim. (*Derket.*)

Şêx Eli: È, baş e, de ka bersivê bide me Ehmed Axa.

Mele Emer: Rast e, gotina şêx rast e. (*Ehmed Axa hesiri, serê xwe tewand.*)

Şêx Eli: Heger tu ne razî bî, xem naake, tu kes nikare te mecbûr bike. (*Ehmed Axa serê xwe bilind kir û li Şêxmûs Paşa meyze kir.*)

Ehmed Axa: Min qebûl e, lê divê daxwazên keça min hemû bén cih.

Şêxmûs Paşa: Ez razî me, tiştê ku bixwaze, ez ê pêk bînim, ma ne hemû tişt bi peran in, heger cêri û xadiman ji bixwaze, ez ê jê re bigrim. (*Beşîşî û këfx-wes bû.*)

Ehmed Axa: Next û cîhê xweş, bê dilhiştin wê ji hewiya xwe cihê be.

Şêxmûs Paşa: Ez bi van tiştan hemûyan razî me.

Şêx Eli: Rabin fatihê bixwênin. (*Giştik helistin ser pêyan, fatîhe xwendin û bi dû re rûniştin.*)

Ehmed Axa: Eslan here gazi Silo bike, bila xwarinê bîne.

Eslan: Baş e Axayê min, de ser xêrê be. (*Derket.*)

Mele Emer û Şêx Eli rahiştin destê wan û herdûka bi hevdûre gotin: Xêrê ji hevdu bibînin. (*Silo û Eslan ber bi sifra xwarinê hatin. Hemû li dora sifre rûniştin.*)

Şêx Eli: Xwedê zêde bike, xwarina te xweş bû.

Şêxmûs Paşa: Eslan heftiya bê, dawet e, ez dixwazim ku tu û birayê xwe bêن, li def û zirnê bixin. (*Destê xwe şûşt û rûnişt.*)

Eslan: Xêr e, îro ji min re xêr e, ez ê bêm.

(*Heta mîvan çûn, Lewend rûnişt ye û aciz e. Şêrin û Bêzarê digirîn, Ehmed Axa ci-xarê dikişîne*)

Lewend: Ne wexta ku tu Şêrin bidî ser hewiyê, rast e Şêxmûs Paşa zengîn û mal-dar e, lê ji Şêrin mezintir e, di temenê te de ye, te qet ji tu kesan nepirsî, lazim bû te ji Şêrin bipirsiya, lazim bû te şêwir bi min re bikira.

Ehmed Axa: Ez mîr im, cîhê raya pîrek û jinan li nik min nîne, bi hezarê jinêن li ser hewiyê hene, nabe ku ez bi a Şêrinê bikim.

Lewend: Ew jîna wê ye, ne jîna te ye.

Ehmed Axa: Şêxmûs Paşa, dewlemed û zengîn e, tiştek ji wî kêm nîne.

Lewend: Her tişt jê kêm e, şexsiyeta wî kêm e.

Ehmed Axa: Bi ci tengî şexsiyeta wî kêm e.

Lewend: Heger şêxsiyet pê re hebûya, dê nehatiba Şêrin nexwestiba. Ew bi jin û zarok e. Jina wî qenc e û bi a wî dike, di temenê wî de ye, zarokên wî jê hene. Ma ci jê dixwaze?

Ehmed Axa: Gotina min şeref û namûsa min e, qet nema jê vedigerim.

Lewend: Dayê, ma xweş e ku hewiya te hebe? (*Li wê meyze kir.*)

Bêzarê: Hewîti dijminatî ye, mala ku hewîti tê de hebe timî şer û gelacî tê de ye.

Ehmed Axa: Heger hûn min aciz bikin, dê biçim jinekê ji xwe re bixwazim.

Şêrin: Yabo, dexilê te me, ez büçük im, ne a mîran im, ez naxwazim tu min têxî nav êgir, ew jiyanek e, ew emrek e. (*Digirî*)

Ehmed Axa: Bes e, min gotina xwe got, ez nema jê têm xwar, di vê malê de, ne li gor jinan, di vê malê de mîr hene.

Bêzarê: Baş e, baş e. (*Ew û Şêrin derçûn.*)

Ehmed Axa: Divê em sibehê biçin bajêr rihel û kinc û zêran bikirin.

Lewend: Ez bi xwe nayêm, ji ber ku ne bi dilê min e. Ez ê îro ji gund biçim û di dawetê de jî hazir nabim.

Ehmed Axa: Bi aqil be û kirêtiyê neke.

Lewend: Kirêtî û şermdarî ew e ku tu ruh û canê Şêrînê diavêje nav êgir. Ji odê derket û xeyidî.


Ehmed Axa: Niç...niç...niç. (*Bi xwe re peyivî û di odê de çû û hat.*)

Perde tê girtin.

Perdeya sisiyan û ya dawî di hejmara bê de

Xebata sivil

ŞEREFXAN CİZİRİ



Bi giştî li Rojhilata Navîn û bi taybetî li Kurdistanê fikir û xebatên sivil di jiyanâ politîk û civati de zêde nayêن naskirin. Rewş û pisîkolojiya ku xelkêن Rojhilata Navîn te de dijîn û tê de jiyan e; mecal nedaye ku fikir û xebatên sivil pêşkevin. Weke tê zanîn, dîroka vê herêmê dîroka dagirkeryê, talanê, qirkirinê û mîltarîzmê ye. Ev yeka ha aliyekî meselê ye. Lê ji aliye din jî de, cara pêşî di dîroka cihanê de bajarvaniyê li vir destpekirî ye; xelkê cihanê bi alîkariya xelkê Mezopotamya û Enedolê hunera nivîsandinê û çandiniyê naskirine. Çar dînên mezin weke Cihûtiyê, Filehtiyê, Zerdeştiyê û Misilmantiyê ji vê heremê derketine. Edebiyat û zanyarî cara pêşî li vir şax da ye. Ez ji destana Gilgamêş kevintir tu nivîsandinê din li cihanê nas nakim. Li ser xwedîkirina hespan cara pêşî Mîtaniyan pirtûk nivîsandine... ûhw. Mirov dikare vê listê baş dirêj bike, lê armanca min ne ev e. Ez dixwazim bi vê yekê bala xwendevanan bikşinim ser xalekê; ew jî ev e:

Di nav xelkên Mezopotamya û Enedolê de kultur û sivilayeti, li cihanê cara pêşî li vir dêst pê kiriye. Ev rastiyekte dîrokî ye. Lê mirov dikare bi hêsanî jî bibêje; felsefa aşitiyê û xebata sivil di warê politîk de, li ve herêmê tûcarî baş nehatiye qebûlki-

rin. Kuştin weke metodekî meşrû hatîye dîtin. Xurt ew e ku bikaribe dijminê xwe bikuje! Kuştin weke riya herî baş hatîye nasandin. Kuştin bi hemû awayî xelasî bû. Ji bo ku desthilatiya xwe ya polîtik bi hemû babetî biparêzin, serdesten demê pirî caran metodên barbar bikaranîne. Ji bo ku ew bi gihana armancêن xwe, hemû metod serbest bûn. Erê hemû metod! Dixwestin bi vê yekê jî mirovan çavtirsandî bikin. Li ser civate, bandora xwe ya polîtik bi zorê bidestxînin. Weke mînak: Aşûriyan mirov digurandin, Moxolan gund û bajar dişewitandin, Osmaniyan mirov li qazoxa dixistin û bav û kalên Saddam Hisênen jî ev metod hemû bikartanîn! Di nav wêqas barbarî, çavşorî, xerabkirin û rasyonalîzekirina kuştinê de, Kurd li welatê xwe, li dijî hêzên tarî disa li ser lingan man. Xelkê Kurd hata roja îro jî jiyana xwe berdewam kir! Heger zor û militarîzmê bikarîba problemên politik û civati çareser kiribana, ewê îro li şûna xelkê Kurd kundan bixwenda. Lê li Kurdistana me, îro şalûl û bilbil dixwinin!

Fîkrêن li ser dîroka xebata sivîl, xwendiyê derbasbûnek dûr û dirêj in. Bi taybetî di qîrnê 19 an de ev fikir û dîtin hatîn sistematîzekirin. Di bin navê ne itatkirina sivîl de, bi awayên curbecur xet û lênerînên felsefi, dîtinên li ser aşitiyê û li dijî zorê helwestgirtin, ji qîrnê 19 an û pêş de, beşekî literatûra politik pêktî-

ne. Bi zêdebûna hejmara şerên dijwar, bi dû şerê cîhanê, qirkirina şes milyon cîhû û bi windakirina bîst milyon Rûs fîkrên sivîl aktuel bûn. Ev helwest bi şerê cîhana duduyan, bi kolonyalîzma hemdemîn û bombekirina Hiroshima û Nagazakî re, xurtir bû. Bi şerê Viyetnamê û bi pêşxistina berhemên teknoloji yên qirkirinê, bala mirovatiyê hêdî bi hêdî derbasî ser fîkrêن aşitiyê bû. Di vê pevgirêdanê de pêwîstbûna xebata sivîl derket pêş. Tişten ku bi keda salan hatibû avakirin, bi van şeran têk diçûn. Ev yeka ha tiştekî pir berbiçav bû...

Wek tê zanîn, di dema antîk de şerê navbera Atîna û Sparta, şerekî pir bi nav û deng e. Atîna û Sparta du eşîren Grêkiyan yên cihê cihê bûn. Ev şerê ha li xelkê Grêki tesîrek mezîn û xerab kîribû. Nivîskarê Grêki Aristofanes bi navê Lysistrate şanoyek li ser bûyera şer û aşitiyê nivîsandî ye. Mijara şanoyê bi kurtî ev e: Jinên Grêki her roj dibînin ku di şer de law û mîrên wan têne kuştin, ji ber vê yekê dixwestin ku li himber vî şerî rawestin. Lysistrate ku seroka van jinan bû dixwest wan organîze bike û dest bi greva seksê bike. Jin ji mîrên xwe re dibêjin; ya hûn ê dev ji şerkirinê berdin ya jî em ê bi we re ranakevin! Ya jîyan ya jî şer, divê hûn biryara xwe bidin! Erê şano li ser problemên aşitiyê, şer, seksê û danûstendinêن jin û mîran tê hûnandin. Herwiha fîkrêن li ser şer û aşitiyê têne minaqeşekirin. Bi baweriya

min dîtinê Arîstofanes iro jî aktuel in. Babetên berxwedana sivil ci formî bigre bila bigre, divê bê parastin û peşdexistin. Dayik û keçen Tirkan, Ereban û Farisan divê iro jî Arîstofanes bixwînin û dest bi grevên seksê bikin!

Di qirnê hîjdeyan de Marks xwest çand caran xebata sivil bi awayekî aktiv bike. Wexta ku pêlên şoreşê li Ewrupa-yê xurt bûn (1840-50), li dijî hukûmeta Alman Marks kampanyek vekiribû. Marks xelkê Alman dawetî bac (vergi, zikat) nedanê dikir. Pir caran wexta ku mecalên xebata demokratik li Ewrupa-yê kêm dibûn, Marks û tevgera karkerî, riyên nû ji polîtîkayê re diditîn. Ji bo mînak em dikarin vêna ha bibêjin; Be-riya ku Marks ji Almanyayê surgon bi-be, li gelek deveran komeleyên perwerdekirina karkeran saz kiribû. Ji aliyê şiklî de ev komelana rastarasta bi polîtikayê mijûl nedibûn. Lê di civînên xwe de li ser perwerdekirina karkeran disekinîn. Perwerdekirina karkeran bi xwe karekî şoresgerî bû. Bi kurtî mirov dikare bibêje ku; xebata sivil dikare bi hezar babetî bê meşandin. Ji xwe hêza xebata sivil jî di vê yekê de ye.

Heger gava mirov xebata leşkerî weke çemekî bibîne, wê çaxê jî xebata sivil di-be weke deryayekê!

Ji bona ku mirov bikaribe bibe xwe-diyê awirek giştî li ser xebat û berxwedana sivil, divê mirov hinekî ji aliyê dî-roka fîkrî de, li vê meselê meyze bike.

Di nivîseke wiha kin de, mirov nikare behsa karê sivil yê pratîk bike. Di vê yekê de mirov dikare pirtûk û lêkolinan peyda bike, lê bi baweriya min tiştên herî girîng ew e ku; divê mirov fantazi û zanebûna xwe li gor realîta welatê xwe bikarbîne.

Nivîskarê Emerîkî Henry David Thoreau ku di qirnê hîjdehan de jiya bû, li ser problemên şer û helwestgirtina dijî şer, metodên ne îtaetkirina sivil parast û hemwelatiyên xwe dawetî bacnedanê kir. Thoreau bi taybetî li dijî sistêma koletiyê li Emerîka, li himber perçiqandina İndianan û li himber şerê dijî Meksika derdiket. Thoreau bi mîranî li dijî neheqiyê disekinî. Mirov dikare fîkrîn li dijî şer û pêwîstbûna xebata sivil li ba nivîskarê Rûsi Leo Tolstoj jî bibîne. Di gelek nivîs û nameyên xwe de Tolstoj li ser problemên şer, zordestiyê bi awirekî Filehî disekine û ji aliyê manewî de nêzîkî vê meselê dibe. Heger hemû xelk têra xwe dîndar û Filehbana, ewê mirovan bi hev re ewqase şer nekiribana. Lê di vir de mixabin Tolstoj tiştekî girîng ji bîra dike; Dîn û dînên curbecur gelek caran rastarasta bûne sebebên bihevrezerkirinê. Lê li ali-yekî din jî Tolstoj dipirse; çima gelo Tirk û Ermenî li himber hevdû weke heywanên hov in? Li gora Tolstoj sebebên vê yeka ha welatpareziye. Tolstoj li dijî hemû babetên welatparêziyê disekine û ferqê naxîne navbera welatparêziya

xelkên serdest û xelkên bindest. Bi raya min ev dîtineke pir çewt e! Ji ber ku welatparêziya xelkên bindest bi giştî li ser xweparastinê ava dibe. Xweparastin ne bi tenê parastina ax û tixûb e, xweparastin bi awayekî taybetî parastina ziman, kultur, dîrok û hebûnên sosyal in. Di welatpareziya xelkên serdest de jî çavşorî û dagirkerî heye. Di vir de neheqî û perçiqandin heye. Ji ber vê yekê jî li himber derketina hemû babetên welatparêziyê, ne tiştekî rast û paqij e. Ma gelo mirov dikare bibêje; hemû hespêن cihanê spî ne?

Di qırnê 19 an de şexsiyetên ku bi kar û barêن sivil bi awayekî sistematik û pratîk daketin gelek in û nayêne hej-martin. Lê Mahatma Gandî û Martin Luther King xwediyê cihê taybetî ne. Mahatma Gandî bi metodêن xebata sivil, bi awayekî giştî li dij zorê derket û serokatiya tevgera serxwebûna Hindistanê kir. Hindistan bi serokatiya Gandî û bi metodêن berxwedana sivil azad bû. Metod û xebatêن Gandî gelek fireh û piralî ne. Mirov dikare ji piraliyan de nêzîkayıyî li Gandî bike. Weke Felsefi, polîtîk, mirovî ûhw. Lê ez ê li vir mînakeke biçûk bidim: Wexta ku kolonyalistên İngilîz nehiştin Hindî xwê bikirin û bifiroşin, Gandî kampanya xwê dest-pêkir. Li gor şêwrêن Gandî Hindîyan diçûn xwêya xwe ji bahrê derdixistin. Wekta ku kolonyalistên İngilîz qerfêن xwe bi kincên Hindîyan dikirin, Gandî

jî li cihên resmî kincên Hindî li xwe di-kirin. Wexta ku kolonyalist û serdestêن Hindî jiyanekê fexfexe dimeşandin, Gandî jî jiyanekê pir basît û ji luksê dûr dijiya. Teorî û pratîka Gandî hevdû temam dikir. Gandî li gor ku dijiya digot û li gor ku digot jî dijiya. Hergav ji mirov û hevalbendêن xwe re wilo digot; rastiyê bibêjin û rastiyê biparêzin!. Di xebata sivil de tirsonek nebin! Kesên tirsonek bila neyên nav xebata sivil! Tirsonekî ne karê me ye. Li dijî zordariya leşkerî, Gandî méraniya sivil derdixist pêş.

Li Amerîka jî Martîn Luther King bi metodêن berxwedana sivil, xelkên Negros (reşik) şiyar kir û ji bona jiyanek bi rûmet tekoşin da. Di xebat û gotarêن xwe de Martîn Luther King, pir caran behsa mezinbûna Gandî dikir û metodêن wî vekirî diparast. Weke tê zanîn Martîn Luther King papaz bû û ji ber vê yekê jî di ziman û dîtinêن xwe de kirasê Filetiyê li xwe dikir. Heger mirov bi awayekî baş karibe zimanê Martîn Luther King ji sembol, gotin û mînakêن Filetiye paqij bike, ew ê Gandiyekî reş derkeve pêşıya mirov.

Li Kurdistanê bi giştî tevgera xelkê Kurd, giranbûna xwe daye û dabû ser metodêن leşkerî. Ez bi tu awayî bawer nakim ku tenê an jî bi piranî metodêن leşkerî karibe xelkê Kurdistanê azad bike. Xurtbûna civakê di organîzekirina sivilî, kulturî û sosyal de ye. Divê xelkê

Kurd ji niha û pêş de, bi awayekî xurt dest bi kar û barê sivil bike; rôexistinê xwe yên politik li gor vî bingehî damezinin. Bi vê awirê divê mirovên me bêne perwerdekirin. Ji îro û pêş de li Kurdistanê divê Che Guevara û Gandî bi hev re bimeşin. Dem hene Gandî û metodêni wî pêwîst e û dem jî hene metodêni Guevaraist lazim in. Kurdistanê welatekî fireh û dilê xelkê Kurd jî pir pir fireh e. Di vî dilê fireh û germ de cih ji Guevara û ji Gandî re jî heye. Mirov divê tiştekî di vê mijarê de pir baş zanibe, ew jî ev e; xebata sivil ne pasifizm, ne tirsonekî û ne jî teslîmbûn e. Heger em baberêne xebata sivil baş nas bikin û felsefa berxwedana sivil jî analîz bikin, em ê pir vekirî bibînin ku xebata sivil mîranî ye, aktivîzm û mirovanî ye. Herwiha xebata sivil hurmet ji jiyanê re ye, demokrasî ye, wekhevî ye û xebatêke esasi ye... Weke tê zanîn di xebata leşkerî de armanca herî mezin ev e; mirov dijminen xwe fizîkî ji navê radike, lê di xebata sivil de armanca herî mezin

dijminayetî ji binî de rakirin e. Ji bo vê yekê jî destpekirina diyalogê pêwîst e. Diyalog destpekirina xebata sivil e. Di vê diyalogê de tiştek heye ku pir eşkere ye. Xelkê Kurd heqê xwe dixwaze û armanca wî jî tucaran ne kuştina leşkerekî Ereb an jî Tirk e. Weke Hozanê delal Cegerxwin dibêje; Em aştiqwaz in, em şer nexwazin. Lê heger dijminê me bibe weke rovî û li me û fenan bigere, em jî wî çaxî dev ji çek û rextêne xwe bernadin!

Ez dixwazim tiştekî din li vir ronî bikim. Wexta ku mirov behsa girîngbûna xebata sivil dike, gelek kes bawer dikin ku ev yeka ew ê bi xwe re zexeli û tirsonekiyê bîne. Ez vê dîtinê ji binî de çewt dibînim. Pratîka Martîn Luther King û Mahatma Gandî tije aktivîte ye. Mirovîn tirsonek û revok di nav hemû babe-tê xebatê de hene. Nivîskarê Fransî Albert Camus dibêje; qirnê 19 an qirnê tirsê ye. Ez hêvi dikim ku qirnê 20 an jî bibe qirnê xebata sivil û mîraniyê! □

Devjenkek bi Melayê Cizîrî re

LALEŞ QASO

L.Q: İro ji zulma zordaran
Dîlber dinale ey Mela
Zerî dane ber xenceran
Laleş birîndar e Mela

M.C: Ooof! of!
Welê meke ax û eman!
Te dil girt û da ber kérän
"Ev reng e halê dîlberan
Lew aşiqan xwîn bû ceger"

L.Q: Lîv wek kulîlka erxewan
Dalêse lîv bayê zeman
Ji husnê sedef girt ezman
Agir bi can da dîlberê!

M.C: "Qelb û ceger min bûne xwîn
Lewra ku nû derbûn birîn
Dîlber were halim bibîn"
Wê ruh ji dojeh bête der!

L.Q: Feryat û fîgan û keser
Qitîtkên xwînê dane der
Terişand wê dil û ceger
Dame ber qepta xenceran!

M.C: "Sotin li min cerg û hinav
Werdêni di hûr girtî xunav
Zulf hate ser lê kir bilav
Bayê nesîm wextê seher!"

L.Q: Bejin çinar, ling mermerê
Vekir qolana kemberê
Daye difn misk û emberê
Xwîn û elem pev hate xwar!

M.C: "Da sîne cohtê tîrxwes e
Qewsê hîlalî tûzreş e
Bi yek aw'rê bûme leş e
Xwînê di cerhan daye kef!"

L.Q: Mîna sîmê dest û tilî
Wek tîrêjên tavan gulî
Ceger bi axan helhilî
Dil bi rivînan bû volqan

M.C: "Wê beglerê pir kuştine
Enguşt bi xwînê riştine
Ma ahlê dil qet hiştine?
Sohtine mislê micmerê"

L.Q: Anî gever, por filfilî
Zulf bi ser rû da kemili
Ebrû kevan, dêm gulgulî
Xwîn beliqî dil bû cobar!

M.C: "Zor û feqîr û mubtelâ
Zahîd û sofî û Mela
Kuştine ew bi sed bela
Kes nekevît belayê zulfî"

L.Q: Sêng û ber berfa zinaran
Memik misalê hinaran
Dimeşe ew wek sultanan
Dil girt û da ber gwîzên

M.C: "Perwaneyêñ sotî kebed
Dîlber ji ber burca esed
Tîr dan ji reştûzêñ semed
Lew têk ji xwînê neqîşîn"

L.Q: Gava nerî û bû xopan
Reşandin tîr weke baran
Li dil rakir şîp û boran
Dame ber pêlîn eşqa xwe

M.C: "Dîlber çi bêhed zalim e
Carek nekir pirse li me
Lazim bi halê alim e
Lê pir didêrit xederê"

L.Q: Şev revî rojê da derê
Seyda, ji husna dîlberê!
Çerxa zemên xweda berê
Bi ava lêvên xwe gerand

M.C: "Tîrek ji qewşê malzirav
Tê dilqewî davêje nav
Xwîn herikî teşbihê av
Feryad û efxan sed esefî"

L.Q: Feryad û efxan sed esef
İslam li dor wê sef bi sef
Êriş dikin ew ref bi ref
Hêşîrî pişka ezel da!

M.C: Bayê seher, çerxa felek
Xelweniştim min dîr melek
Xap di paxafê da gelek
Bibexişîne ey heval!

L.Q: Wê kişandim di ber xwe ra
Çeng bûm nav lûlén mermîra
Min kir cejn wê da kesera
Giryâ û zûrya dîlberê!

M.C: Ooff disa ha!
Ey Zulcelal bike wefa!
Qet me nedît ji wê sefa!
Te em kuştin bi sed cefal
Tealellah tealellah!

L.Q: Nûra cemal pir kevz veda
Qelbê zahîd elem berda
Talan kirim ez şûheda
Çawa nizanîbû Pîr im?

M.C: Elîf û lam û dat û sat
Li ser canim bûn taht û lat
Allahumsellî welat
Derdê Mela derman e şer!

M.C: Ceger bi xiştan herifi
Çav di nûrê de terifi
Şûr di mejî de qurifi
Mela êdî çib'ke canim!

L.Q: Mejî revand hişte serî
Hinavêñ min tev de birî
Xwîn kir şerab û qurtkirî
Îslam te nas nekir Mela!

Têbini: Nivîsên dunik, ji dîwana Melayê
Cizîri hatine wergirtin.

M.C: Ey roniya çavêñ Mela
Axret li min tev kerbela
Kirim ekrad tealeillellah
Ax û eman û sed eman!

L.Q: Ez bûm softî û bûm moftî
Min da serî şas û keftî
Bi vî rengî jî bûm nefî
Qey te negot berde Mela!

M.C: Subhan ji remza dîlberê
Difûre ew wek emberê
Tecelli da li her derê
Emrek çûye bi avê de!

L.Q: Ku mizgeft dergahêñ me bît
Sewm û selat karê me bît
Quran li ser çongêñ me bît
Em dê bi van çib'kin Mela!

Hêsankırına alfabeyê û aqlê selim

Dr. CELADET ÇELIKER

*P*ıştı derketina kitêba min a bî navê "Çend Pirsên Alfabeşa Kurdi", hevalên ji redaksiyona kovara ARMANCÊ û berpirsiyarê kovara NÜDEMê Fırat Ceweri, rexneyên Arif Zêrevan ji min ra şandin û li ser van rexneyan ditinên min ji min pirsin. Beri her tiştî, divê ez sipasi A Zêrevan bikim ku wi xwe eşandiye, bir û rayên xwe yên di vê babetê da, bi niviski diyar dike. Ez hêvidar im ku ew kesên ku bî salan e bî pirsên alfabeyê va mijûl dibin ji ditin û rexneyen xwe bî niviski bîdin weşandin da ku hin pirs zelaltır bibin û rojekê zütir çareser bibin.

Rexne û ditinên A Zêrevani meriv dikare di du beşan de bîcivine:

1-Ditin û rexneyen teoriki yên li ser prosesa xwendinê, têkiliyên di navbera çav û mîji da û yên li ser hafizeyên ji hev cihê.

2-Rexne û ditinên li ser pîrsa "î" ya bêniqut û "?" ya bêniqut lê bikumik.

Ji ber firehiya van herdu beşan û herwesa ji ber ku min nexwest eyni tiştî di du kovarêne kurdi da bîn çapkirinê, min li ser her beşê nivisarekê nivisi û ya li ser beşa pêşî ji ARMANCE ra û ya li ser beşa diduyan ji ji NÜDEMê ra şand. Loma ji, ger xwendevan ditinên min ên bi tevayı meraq bike, divê ew herdu nivisaran ji bixwine.

Celadet Bedirxan di hejmara pêşî ya Hawarê da li ser belavkîrîna alfabeşa xwe bî vi awayi dînivise: "Ji belavkîrinê quesda me ev e ko herçî xwenda û zanayên kurdan heñe, rûpelên elfabê yek bi yek, xêz bi xêz, pîrs bi pîrs, bixwînin, qenc bala xwe bidin û her ci kîmanîyan bibînin ji me re binivîsinin, da ko em wan kîmasîyan rast bikin."

Mir Celadet, lixwehişyar bû û zanibû ku bî vê gavavêtinê deriyeki ronahiyê ji bo miletê kurd vedibû. Lê belê bî nefspîçûki û sergîraniya xwe, wi baş zanibû ku ev alfabe, ne alfabeşa heri tekûz û ya bêqisûr e. Loma ji hê dî destpêka nasandina wê da, wi ev rêzên li jorê nivisin. Mir Celadeti bî xwe ji, di alfabeşa xwe da guhartin çekirin: Ji hejmara Hawarê ya 24 an û pêva ciyê herfên "k" û "q" bî hev guhast.

Ew, ne insaneki muhafezekar û hisi, lê insaneki realist bû. Prosesa ku wê kurdên jorin tê da derbas bîbin, wî hê di wan rojan da dîdit. Jî ber vê yekê ye ku wi xwest alfabeya xwe nêziki alfabetaya türki bike; her çiqas vê kirina wi iroj ne bî dilê hin kesan be ji (ku yek ji wan ji A. Zêrevan e.). Lî ser vê nêzikkirinê Mir Celadet bî vi awayi dînivise: "Wekê tirk elfabetaya xwe belav kirin me dît ko di dengêñ hin herfan de elfabeyen me ne mîna hev in. Dengêñ hebûn ko tirkan ne bi wan herfêñ ko me nîşan kirine lê bi herfinen din nîşan kiri bûn.

Herwekî me berê jî çend caran goti bû, ji bona hêsanîkirina xwendina nîfsarêñ me, ji kurdmancêñ tirkîyê re, me dengêñ hin herfan bi hev guhartin û herçend hebû me ew çend elfabetaya xwe xist nîzingî elfabetaya tirkan. "Jî xwe, ji wan şeş destûrên ku wi ji bo danina alfabetaya xwe bingeh girtine, ya pêşin lî ser vê nêzikkirinê ye. (Jî bo tevayiya van şeş destûran, binêre Çend Pîrsêñ Alf..., r. 34-35)

Sedemêñ danina niquta lî ser "î" û kumika lî ser "I" yê.

Lî ser hilbijartına du herfêñ ji bo du dengêñ kurd "î" û "I", Mir Celadet bî vi awayi dînivise: "Lê herwekî me berê jî goti bû, di dengayîya kurdî de, dengdêrek carinan kin û carinan drêj nabit, yanî herçî dengdêrên ko kin in drêjêñ wan nîne û herçî dirêj in kinêñ wan peyda nabin.

Ber vê yekê dengdêra (e) herçend bête drêj kirin tucar nabit (ê) ji ber ko cihderkêñ wan ji hev cuda ne. Herwekî (i) jî bi drêjxwendinê nabit (i).

Dî destê me de tu herfêñ din ne ma bûn, û gora destûreke me divîya bû em herfêñ hevduanî (hevedudanî-C.Ç.) emel mekin. Ji lewra ji bona nîşankirina tofa paşin me ev (^) nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek.

Ev nîşana ha di hin elfabetâyén din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabetâyén din de dengê dengdêrân weke xwe dihêle, cihderkêñ wan naguherîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabetaya me de du karêñ wê hene: Dengê dengdêrân diguhêrîne û bilink (bilind-CÇ) dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî drêj in û tucar kin nayêñ xwendin.

Gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çekirina alfabetaya xwe me pêkanî û di pêşîya vê bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabetaya tirkan dûr mekevin.

Li hir e, di herfêñ (i) û (î) de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk (i) ya kin bi (i) ke bê niqte nîşan kirin. Heke me jî welê bikira û (i) ya kin bi (i) ke bê niqte û ya drêj bi (i) ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû ?

No, ji ber ko (i) ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di peş (pêş-CÇ) û paşê hin herfan de tevî wan dibe û ji wan derêxistana wê dikeve dişwariyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesîyan û ji bona veqetendina (i) ke bêniqte ji herfên jorîn - ko ketîye rex an nava wan- ser herfa ko berî (i) yê dihat işaretekê berdidan.

Bê şik e ko me nikarî bû em bikevin nerastîyeke welê ko ji alîyê daniyê xwe ve hatî bû nîşan kirin.

Jû pêve, herweki heta niho xuya bû, ji lewre ko dengayiyê van du ziman'an cihê ne, isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê tirkan dûr ketîye."

Ji serwextkirîna Mir Celadet em fêhm dikin ku kumik an ji bî gotîna wi, bilindek, gava tê ser dengderekê, wê diguhêre dike dengdêreka dîn û herwesa wê dirêj dide xwendinê. Bi danina bilindeka li ser herfa "ê" û ya "û" yê, Mir Celadet xwestiye ku ji herfên adeti yên alfabeleya latini "e" û "u", ku ew miqabilê du dengên kurdi ne, istifa-de bike û bî vi awayi ji bo du dengên kurdi yên dîn, ku li miqabilê wan herfên adeti tune ne, du herfên nû çêbîke. Lê belê bi danina bilindeka li ser "î" yê, wi berevajiyê vi karê li jor kiriye. Yani wi ji bo dengê "i" ya kurdi, ku li himberi wê di alfabeleya latini da herfa "i" ya adeti heye daneniye, lê herfeke ku li gor alfabeleya latini neadeti ye çêkrêye: "î". Herwesa ji bo dengê "i" ya kurdi ku li miqabilê wê hiç herfên adeti tune ne, ew rabûye wi herfa adeti ya alfabeleya latini "i" bî kar anîye.

Gelo sedemê vê yekê çiye? Sedemê vê yekê ew e ku Mir Celadet dî danina alfabeleya xwe da, li gor rêz û pergala alfabeleya türki çiye. Wek ku tê zanîn di rêza herfên alfabeleya türki da herfa "î" beriya herfa "i" tê. Lewra, wi pêşiyê ji bo dengê "i" ya kurdi tipêk daniye (i), û piştra ji, ji ber ku di destê wi da tu herfeke dîn ji bo dengê "i" ya kurdi nemaye, ew neçar maye ku bilindekekê bide ser "i" ya adeti û bî vi awayi herfeke nû çêbîke. (Ji bo izaheteke firehtir, binêre Çend Pîrs., r. 136 - 138)

Ji ber "i" ya bêniqut di destnîvisen türki da, di nav, li pêş û paşen hin herfan da wenda dibû, Mir Celadeti herfa "i" ya adeti ji bo dengê "i" ya kurdi bî kar anî. Sedenmê ewil ev e. Gava Mir Celadet li ser vê herfê pîrsê ji xwe dike, pêşin vê bersivê dide. Lê belê A Zêrevan argûmenta diduyan ya Mir Celadet, wek argûmenta ewil dide nişandan. Çi feyde ye, gelek delil hene ku nişani me didin ev ditîna A Zêrevan şaş e. Heke Mir Celadet bîxwesta ji bo her dengên kurdi yên ku ji dengên türki cihê ne, herfinen nû daniya diviya bû wi nişanekê an ji niçîkekê baniya ser herfên "a" û "u" "yê ji. Lewra ferqa di navbera "i" ya kurdi û "i" ya türki çiqas be, ferqa di navbera "a" yên herdu zîman ji ewqas e. Mir Celadet ji bo "i" û "a" ya kurdi eyni tiştî dîbêje: "a" û "i" ya kurdi ji yên türki dirêjtir in. Lê belê em û türk li miqabilê dengê "a" yê eyni herfê bî kar tinin. Ev yek ji bo herfa "u" yê zêdetir balkêş e. Chhderka "u" ya kurdi û ya türki ji

hev cihê ne. Mir Celadet li ser dengê "u"ya kurdi bî vi awayi dînivise: " Dengeki ku di navbera dengên tîrki "u" û "ü" yê da ye. Dî hiç zîmanêñ Ewropî da dengeki ku tam miqabilê wê be tuneye ." Lê belê, herçend di warê denganiyê da, ew ji hev cihê ne, disa ji em û tîrki li miqabilê dengên xwe eyni herfê dînivisin: Anglo herfa "u".

Em vegeerin ser sedemê bingehin ê ku niqutê ani ser "i" ya Hawarê. Di dawiya sala 1928 an da tîrkan dev ji alfabeşa erebi berdan û dest pê kîrin ya latini bî kar anin, ku li

2. IX. 1930

üllkesini, yüksek istik-
lâlini korn morini bîlen
Tîrki milleti, dilini de
yalancı diller boğın olı -
trügünden kirtasnalıdir.
Gazi M. Kemal

gor dengên tîrki hatibû modifiyekirin. Bîkaranina alfabeşa erebi ji serê sala 1929 an û pêva bî fermanekê hate qedexekirin. Wek ji destnîvisa M Kemal ji dixuyê, vê guher-tinê ji nişka va gelek gelemse bî xwe ra anin. Tîrkan ne tenê nişçık û dûvîk dianin ser herfa "i" yê, lê herwisa dianin ser "u", "a", "i" yê ji. Merîv dikare van tevliheviyan bî du sedeman izah bike:

1- Çi niviskar û çi ji xwendevanêñ tîrki bin, ew bêyi ku di mekteban da bî alfabeşa latini alfabetize bîbin, dest bî xwendin û nivisandına bî alfabeşa latini kîrin (Ji bo prosesa alfabetizebûyinê, li wê nivisarê binêre ku di ARMANCê da ye).

2-Ya hê muhimtir ji ew bû, ku di alfabeşa erebi da li miqabilê piraniya dengdêrên zîmanê tîrki herfên taybeti tune bûn. Lê belê di alfabeşa nû ya latini da, ji bo van dengdêran herfên xweser hatibûn danin. Wek nimune di nivisêñ bî alfabeşa erebida, dengê "i"ya tîrki kêm caran bî "ى" (wek di "اوچى" : onları), lê piri caran bî hiç herfe-kê nedîhat nişan kîrin (wek di " حاضر لامشدم " : hazırlamıştım)

Helbet ji bo hinbûna vê alfabeşa nû wext diviya bû. Wek iroj em dibinin êdi ew neslên tîr ên ku bî vê alfabeşê di prosesa hinbûna xwendin û nîvisandinê ra derbas bûne, tu sergêjayı bî wan ra çenâbe. Heçî ditîna A. Zêrevan ya ku dibê "problem bi xwe her maye", ditîneke hisi ye û ji rastiyân dû re. (Ji bo di ditîna herfan da, ew têkili-yên ku di navbera çav û mêji da hene, li nîvisara di Armancê da ye binêre)

Mala Mir Celadet hezar caran ava. Heke wi li tîrkan binêrta û kumîke bianiya ser herfa "a" yê û çend niçik bianina ser "u" yê ji , xwedê zane ka iroj halê me kurdan wê çewa bibûya. Bêşik, çawa iroj gelek kes niquta li ser "i" yê û bilindeka li ser "i" yê diparêzin, dê disa ew kes, bî hezar bihaner ew ji biparastiana.

Pîrsa niqut û kumîke çîma ewqasî gîring e ?. Mir Celadet dibê dengê "e" û "i" bî hev ra bingehê dengdêrên kurdi pêk tinin. Ev tê wê maneyê ku di denganiya kurdi da hîn deng hene, ku ji ber nisbeta wan a bîlind, ew xwedi giraniyeka mezîn in. Dengê "i" yê, piştî dengê "e" yê, ew deng e, ku ci di axaftinê û ci ji di nîvisandinê da be, zêdetirin tê bikaraninê. Tenê bî serê xwe, nisbeta dengê "i" ya kurdi bî qasi yekûna nisbetên dengê "c", "ç", "f", "g", "p", "q", "u", "ş", "x", "y" û "z" ya kurdi ye. Bî gotineke din, di xeberdan û nîvisandinê da bikaranina yazdeh dengê kurdi bî hev ra, hê nû bî qasi yek dengeki kurdi dike. Loma ji divê ev dengê ewende muhim bî awa-yeiki gelek zelal û sıvik bê nîvisandin. Lê mixabîn, em vi dengi bî du cureyan dînîvisin: "i" û "i".

Gava A. Zêrevan dibêje: "...Bilindek wekhevi û istiqrarekê di van dengdêrên bîbilindek (ê, î, û, CÇ) de çedîike. Ko yek ji van bête guhortin divêt yên di jî bêñ guhortin..." diyar nine ka mexseda wi ji wekhevi û istiqrarê çîye. Rast e Mir Celadet dibê bilindek tê ser dengdêrekê, wê diguhêre dike dengdêreke din û wê bîlind dide xwendin. Lê belê di zimanê kurdi da dengdêrên dîrêj ne tenê sisîyêñ bî kumîk in, ew pênc in û bî alfabeşa Hawarê ew bî van herfan têñ nişankîrin: a, ê, î, o, û. Wek dixuyê bêyi kumîk ji "a" û "o" dîrêj têñ xwendinê. Gava kumîka li ser "i" yê rabe , ew bîbe "i" ya adeti, wek yên hemû mîletêñ ku alfabeşa latini bî kartînin (ji xeyni ya Roman-yayî), em ê wê disa dîrêj bîxwinin. Hîngê wê hejmara dengdêrên bî kumîk dakeve duduyan (ê, û) û yên bê kumîk bîbe sisê (e, i, o). Vêca gotinêñ "wekhevi û istiqrar" ê, ji gotinêñ vala pê va, têñ ci maneyê?

Lî vir divê em bala xwendevan bîkşînin ser meseleyeke din ji. Mir Celadet bî xwe dibêje ku wi xwestiye ku alfabeşa xwe nêziki ya tîrki bike. Dî sala 1928-an da gava tîrkan alfabeşa xwe ya nû beyan kirin, di destê Mir Celadet da alfabeşeyeke latini hebû. iroj ev alfabe li ber destê me ye (Binêre, Çend Pîrsêñ Alf.Kurdi. r.28 - 32). Mixabîn ew alfabeşeyen berê yên ku Mir Celadet li ser wan xebiti bû, hê ji derneketine ronahiyê. Lê

belê dî vê alfabeşa lî ber dest, ya jî sala 1928 an da tiştek bala menv dikşine. Ew ji ew e, ku Mir Celadet jî bo dengê "î" ya kurdi tu herf danenine. Wek me berê ji behs kır, ew bî xwe dibêje dengê "e" û "î" yê bîngeha dendêrên kurdi pêk tinin. Diyar e, ku dî danina herfek jî bo dengê "î" ya kurdi da, ew di bin tesira alfabeşa türki da maye.

Rexneyêni ser "î" ya adeti

Herweki me li jor dit, li mîqabilê dengê "î" ya kurdi bî danina herfa "î" yê, Mir Celadet Bedirxan jî "î" ya adeti ya alfabeşa latini bî dûr ketiye. A Zêrevan jî gotina "î" ya adeti hız nake. Loma jî dîpîrse ka "î" ya adeti çiye. Berê xwe dide "î" ya latini û dibêje ew bî sê awayan tê nivisandin. Ew serê xwe bî kurti û dîrêjiya "î" ya latini dişine. Dîvê li vir em binin bira wi, kurti û dîrêjiya "î" ya latini, rengê vi dengi ne. Lewra cihderka wan her yek e. Dî vi wari da Mir Celadet dî destûra VI an, a jî bo damezrandına alfabeşa xwe da weha dînivise: "...herfin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşiyê têñ xwendin, lê ev ferqên ha ne ji guhêrîna cihderka dengan, lê belê ji guhêrîna rengê dengan têne pê, û ji lewre di elfabeyê de nayin nişan kirin. Ji ber ko elfabê tenê dengan nişan dike, ne rengê dengan"

Gotina herfîn latini yên adeti ji ali Mir Celadet Bedirxani va ji hatiye bî kar anin. Ew dî destûra xwe ya II an de weha dînivise: "Her çend dibe, ewçend dengê herfîn latînî ên adeti ko di zmanê din de nas in, di alfabeşa kurdi de hilanîn û neguhartin . Bi vî awayî kurd dê bikarin alfabeyâ biyaniyan û biyanî ya me bi hêsanîti fêr bibin"

Tiştê xerib ji ew e, ku A. Zêrevan, bêyi ku haya wi jê hebe, dî neqîlkirîna nivisa Mir Celadet da, ew bî xwe vê gotina "î" ya adeti, neqli nivisara xwe dike û paşê ji, bî navê parastina Mir Celadet, ew radibe dibê: "Vêca 'î' ya adeti çi ye ?"

Em nîzanın ka A. Zêrevan bî rengê dengê latini hejmara herfîn alfabeşa latini heta çendan deraniye. Lê belê rastiya hejmara herfîn di alfabeşa latini da ne 26 in. Dî vê alfabeyê da tipa "î" ya adeti ev e: i . Heke A. Zêrevan jî me bawer nake, ji neçarı, em ê disa xwe bispêrin Mir Celadetê gorbehîst. Ew weha dînivise: "Lewra ko di Elfabeyâ Latînî de tinê (26) herfîn serxwe hene û di zmanê kurdi de deng ji bîst û şeşan bêtir in, gelek herfîn hevedudanî keti bûn nav alfabeyâ min;..."

Xebera A. Zêrevan e, dî zimanênu ku bî alfabeşa latini dînivisin da, hertim "î" ya adeti dengê "î" ya kurdi nade. Jî xwe kesi iddiayeka bî vi awayî nekiriye. Lê belê gava ew ji bo parastina kumika li ser "î" yê xwe ji hemû miletênu ku alfabeşa latini bî kar tinin dûr dike û xwe dike hevalê herfa "î" ya Romanyayı û bî vê yekê ji xwe serfiraz dibine, êdi ez nikanım bî ditîna wi ra bim.

Nexwe problem, ne ku ji alfabeşa kurdi ya bî tipa "i" ya adeti tê. Problem ji alfabe ya ingilizi tê ku ne fonetik e. Lewra di alfabeşa ingilizi da çend deng bî herfekê an ji dengek bî çend herfan têne nişankırınê. Ev yek ji bo zarokên ingiliz, wextê ji bo hin-bûna xwendin û nivisdandinê dirêjtir dike.

Rast e, Mir Celadet bî danina kumika li ser "î" yê ji çend destûrên xwe bî dûr keti ye. Yê bixwazin li vi aliyê meselê binérin, dîvê şeş destûrên Mir Celadet deynin ber xwe da ku ew bibinîn ka bî çi awayi ew ji destûrên xwe bî dûr dikeve (binêre r. 134 - 136).

Denganiya (fonetika) ziman deng dîde herfan

A. Zêrevan bî awayê nezeri qebûl dike ku di xwendinê da yên ku dengan li herfan bar dikin em bî xwe ne. Lê belê gava ku dor tê kurdan, dîbê nexêr, ev yek ne raste. Ew weha dînivise" ...cardî jî mirov nikare (i) û (î) ya kurdiyê bike wekî yên tirkiyê. Çîma? Lewra heger mirov van herdu herfan bike wekî yên tirkiyê hingê dê piraniya kurdên bakûrê wan wekî yên tirkiyê bi lêv (telefîz) bikin." Ew ji bo vê argûmenta xwe du nimûnan dîde: Dî nimûna pêşin da bî bêjeya "kirin" û "kirin" ê dixwaze bêje ku herfa "i" yê, ki dixwine bîla bixwine, dê ew her miqabilê dengê "i" ya tirkî be. Lê hay ji xwe nine ku gava ew vê bêjeyê li gor denganiya tirkî dixwine, ne tenê dengê "i" yê lê herwisa dengê "k" yê ji tê guhartin. Eyni bêjeyê (kîrin) gava ew li gor denganiya kurdi bixwine, dê ew maneya kurdi zevt bike. Heke ku bibêje, nexêr ev yek çenabe, ji ber herfa "i" yê her standarda dengê "i" ya tirkî ye, dîviya bû wi nîkaribûya kitêba min bixwenda, ku bî herfîn "i" û "î" hatîye nivisandin.

Ji xwe ev 30 - 35 sal in, ku gelek kurdan nivisandîna bî vi awayi ji xwe ra sıviktir û rehettir dine. Heta iroj ji, bî kesên ku ji heqê kurdiya axaftnê dertêr ra tu sergêjayî peyda nebûne. Dîvê ez disa binim bira A Zêrevan, herçend herfîn "a" û "u" di alfabeşa me û ya tirkan da weki hev têne nivisandinê ji, gava em wan dixwinin, em den-gân zimanê xwe û gava tirkî wan dixwinin, ew ji dengêñ zimanê xwe li wê bar dikin.

Nimûneya dîduyan ji, li ser dengêñ aktorêr Mem û Zinê ye. Helbet yên ku dengêñ filmê ji bo kurdi dublaj kîrine, bî kurdi zanibûna dê ew li gor denganiya kurdi bîaxivî-yana. Çi bî "i" û çi ji bî "î" yê bête nivisandinê, gava tirkî an ji kurdeki asimilebûyi teksteke kurdi bixwine, dê ew li gor denganiya tirkî here. Gava em ji teksteka tirkî bî-dîn destê kurdeki ji Sûriyê, ku ew qet bî tirkî nîzanibe, di xwendinê da, dê ew li gor denganiya zimanê xwe bixwine. Ev tişteki geleki normal e. Lewra her miletê ku alfabeşa latini bî kar tine, wê li gor denganiya zimanê xwe bî lêv dike. Ji ber vê yekê ye

ku dî hinbûna zîmaneki nû da hîn tevliheviyên bîlêvkırinê dertên. Herçend herdu zîman ji alfabeşa latini bî kar binin, lê disa ji yê ku zîmanê nû hin dibe, hîn xisûsiyeten denganiya zîmanê xwe derbasi zîmanê nû dike. Dî terminolojiya zîmanzaniyê da, ji vê yekê ra "interference" tê gotin. Ji xwe, em kurdên li xeribiyê bî serpêhatiyên xwe bî vê yekê dihîsin. Wek nimûne, gava yeki faris an ji yeki ji Emerikaya Latini bî swêdi xeber dide, yekser meniv pê derdixe ku ew ji kuderê dînyayê hatiye Swêd.

Ji ber vê yekê ye ku çi dî hinbûna zîmaneki nû da û çi ji dî transkripsiyona zîmaneki biyani da, ji alfabeşa fonetiki ya navnetewi tê istifadekirin. Dengêni ji bo tipêni dî vê alfabeşeyê da standart in. Ev herf li hemû deverên cihanê bî yek awayi têni bîlêvkırinê.

Gelo qê tenê turk herfa "i" yê bî kar tinin?

A. Zêrevan wek keseki ku ji cinan bireve, wisa dixwaze xwe ji herfên "i" û "î" yê dûr bixine. Sedemê vê yekê ji ew e, ku ev herdu herf, tenê alfabeşa tîrki tine bira wi. Diyar e ku ew dî vê meselê da gelek hisi ye. Min hejmart, dî nîvisara xwe da bî kîmasi li 5 - 6 ciyan, ew her ima dike ku em "weki tîrkan" nekin. Heta, dî ciyekî nîvisa xwe da bî vi awayi dînivise: "Wekîtirkannekirin bi serê xwe argûmentek têra xwe xurt e ji bo ko em ya xwe biparêzin". Ez nîzanîm, heke himdarê vê alfabeşeyê yê, ku dixwest alfabeşa xwe nêziki ya tîrkan bîke iroj li jîyanê buya, dê li ser van gotinêni A. Zêrevan çi bigota.

Ka werin em bî hev ra piçeki li diroka van herdu grafeman (i - î) binêrin. Gava yunani nêziki 1000 sal Beriya Zayinê alfabeşa fenikiyan hin bûn, wan du guhartinêne mezîn dî wê alfabeşeyê da çekirin. Berê nîvisandina alfabeşa fenikiyan, ji ali rastê ber bî ali çepê va bû. Yunaniyan berê wê guhartin. Dî alfabeşa fenikiyan da li hîmber dengdêran hiç herf tunebûn. Yunaniyan ji bo dengdêran herfan çekirin û li wê alfabeşeyê zêde kirin. Yek ji wan herfan, herfa "i" ya bêniqut e, ku ew li miqabilê dengê "i" ya yunani ye. Ji wê demê û bî vir da ev herfa bêniqut (i), wek herfeke standart dî alfabeşa yunani da maye. 200 - 300 sal piştra xelkê Romayê bî riya Etrûsiyan ev alfabeşa yunaniyan nas kîrin û piştî demekê, wan niqutek danin ser herfa "i" yê, ku bû "î". Bî vi awayi me dit ku bavik û dayikêni van herdu herfan, yunani û xelkê Romayê ne. Heçi "i" ya bêniqut e, bî kîmasi ew 200 - 300 salan ji "i" ya bîniqut kevîntir e. Herçend yunani ji bo bilindxwendîna dengê "i" ya xwe niçkeke paldayı tinin ser herfa "i" yê, lê belê ev herf bî kîmasi ev 2500 sal in ku dî alfabeşa wan da wek herfeke serxwe maye.

Na διευκρινίσω στο σημείο αυτό ότι, εξαιτίας όλων αυτών των ανθρώπινων, πολιτικών και καλλιτεχνικών πολυπρισματικών διαπλοκών μας με το Σερχάτ, υπήρξα πάντα απέναντί του, θετικά προκατειλημμένος. Όπως και τώρα, εξάλλου. Συνεπώς, καθώς δεν είμαι ιστορικός της τέχνης, ούτε και κριτικός, διτί θα προσπαθήσω να διατυπώσω για τη ζωγραφική του, είναι απόρροια αυτής της φιλικής διαπλοκής μας, σαν μια ειλικρινής κατάθεση ενός ομοτέχνου του που και αυτός πελαγοδρομεί μέσα στους προβληματισμούς και τα προβλήματα της σύγχρονης τέχνης.

Ji hêla dîn va, herfa "i" yê wek herfeke alfabeşa fonetiki ya navnetewi, ji sala 1916 an û heta niha her hatiye bikaranin. Iroj ev herf, dî nav piraniya ferhengên ingilizi da, ji bo rênışandana awayê bilêvkirna bêjeyên ingilizi, dî nav parantêzên li dû bêjeyan da, tê nîvisandin.

Me çend nîmûnên ji zimanêngi ingilizi û almani li jêr danin:

İngilizi:

build (bild)

city (siti)

this is (Ës is)

Almani:

irrig (inç)

pflisch (pfırızçı)

wirklich (virkliç)

Li vir tiştê balkêş ew e ku dî sala 1983 an da, bî rêberiya Enstituya Kurdi ya Parisê pisporêñ kurmanci, tevi hin pîrsêñ dinê, li ser denganiya kurdi ji xebitin. Li gor rapora wan, dengê "i" ya "Hawarê wek ya ingilizi (di this is de) ye." Wek li jor ji dixuyê, ev deng mîqabîlê dengê herfa "i" ya alfabeşa fonetiki ya navnetewi ye. Lê gelek tişteki xerib e, ku yên iroj bî dijwari li himber bikaranina herfa "i" yê ji bo dengê "i" ya kurdi dertêñ, disa ev pispor in. Ji hêla dîn va, hin zimanzanêngi biyani hene ku ji bo telafuzkirna dengê "i" ya kurdi, herfa "i" ya alfabeşa fonetik bî kar tinin (Bînêre, Campell G. L., 1995)


Dî warê denganiya (fonetika) kurdi da xebatêñ zanîsti ya qet tune ne yan ji kêm xebatêñ ku hene ne li ber destâ ne. Bêyi bikaranina spektrogramê û hin hacêtêñ dîn,

meriv nikare bî eseyi zanîbe ka frekansa pêlên filan dengdêri çiqas e û miqabilê kijan dengê alfabetaya fonetiki ye. Bî saya filmên rontgenê meriv dikare deqiq zanîbe ka di deranina filan dengdêri da pozisyonâ di navbera zîman, dîran, gewri û şkefta dev da çawa ye.

Lî gor Mir Celadet û R Lescot dengdêrên (i, ê, e) yêng pêşki, yêng (i, u) yêng nivekî û yêng (a, o, û) ji yêng paşki ne. Heçi dengê "i" ya türki ye, ew dengeki paşki ye, ku ji gewriyê tê. Dengê "i" ya türki di alfabetaya fonetiki ya navnetewi da bî nişana herfa "m" ya berevaji tê nişan kîrin: " " (Bînire G K Pullum).

Dengê "i" ya alfabetaya fonetiki, dengeki ji nivekê ber bî pêşki va ye. Gava em van ditinêni li jor bîhîjinin hevdû û van dengan li ser "sêkûja dengdêran" deynin, tablo-yeke geleki balkêş dertê pêşberî me. Dî vê tabloyê da gotinêni "girtî" û "vekiri" rewşa ku ka çiqas dev ji hev vekiri ye, nişan didin; gotinêni "pêş" û "paş" ji, di dev da, ciyê ku deng lê çedîbe nişan dide. Lî ser xeta milê çepê, me herfîn ji bo dengêni (i, ê, e, a) ya kurdi bî ci kîrin. Ji "i" yê çendin meriv ber bî "a" yê va dici, ewçend dev ji hev vedîbe.

Girtî



Bê şik, mîn ev sêkuja dengdêran, li gor argûmenten li jor û li gor bîhistîna xwe ya van dengan daniye. Herçend ev hîzirkîrin ne xwediyê idiayeke zanîsti be ji, lê cardin qenaetekê dide meriv ku dengê dengdêra "i" ya kurdi, ji ya türki bêtir nêziki herfa "i" ya alfabetaya fonetiki ye.

Internet û hin herf

Heçi pîrsa internetê ye, ev pîseke tekniki ye û ez bî xwe di vi wari da nezan im. Lê belê wek gelek kesan ez ji carna bî internetê bili dibim. Lî ser idiaya A. Zêrevan ku dibê

hın herfên alfabeya tırki dî internetê da dernayêñ, mîn cerîband ka gelo ev yek rast e yan na. Bî riya internetê ez ketim nav hın malokêñ tîrkan û mîn ev nîvisa li jér, ji internetê girt:

"PAYLAŞIŁAMAYAN KENT: KUDÜS

...

1997 yılının ilk aylarından itibaren de Israil'ın Kudüs'e yeni bir yerleşim bölgesi inşa etmeye başması, barış görüşmelerini kesintiye uğratıp, barış ortamını bozan bir et-kide bulundu..." (Internet, maloka Xn, Zeynep Güler)

Wek ku dixuyê, hemû herfên tırki dî vê nîvisê da derketine. Lî dî nîvisêñ hînek ma-lokan da, wek ku A. Zêrevan ji destnişan dike, hînek herf dernayêñ. Ev yek pîrseki tekniki ye û bê şik çareser dîbe.

Gotina dawi: Em bî hisêñ xwe û rîka li dîj tîrkan nikarin tevliheviyêñ alfabeya xwe hel bikin. Dîvê em bîdîn ser şopa aqlê selim û bî riya xebatêñ zanîsti ji heqê van pîr-san derkevin.

Referens:

- Hawar (1987), hejmar 1-9, Stockholm
Hawar (1932), hejmar 10-11 Şam
Bedirxan Celadet (1932), Rûpelinêñ Elfabê, Şam
Bedirxan C, Lescot R (tanx ?), Kürtçe Grameri, İstanbul
Türkçe Sözlük (1983), Ankara
Pullum K G, Ladusaw A W (1996), Phonetic Symbol Guide, Chicago
Georges J (1991), Skriftens historia genom sex tusen Å
Hêvi (1983), Kovara Çandıya Kurdi, Paris
Serhad (1997), Grafikên Serhed, Salонiki
Çeliker C (1996), Çend Pîrsêñ Alafabeya Kurdi, Stockholm
Malmberg B (1983), Lärobok i fonetik, Lund
Demircan Ö (1977), Türkiye Türkçesinde Kök-Ek Bileşimleri, Ankara
Campell G L (1995), Concise, Compendium of the world's Lanuages, London

Nota Nûdemê: Ji bo ditina ferqa herdu alfabyean, em têkilî awayê nîvisandina Celadet Çeliker nebûn.

Dibêjim »nêr« e, Çeliker dibêje »bidoşe«

ARIF ZÊREVAN

zerevan@algonet.se

Bersiva Celader Çelikerî dubarekirina idiyêن pirtûka wî ne. Idiyêن pirtûka wî wekî kaya li ber bayê ketî bûn. Niqteyek tenê hêjayî minaqşeyê di pirtûka wî de hebû: têkiliya di nêvbera prosesa xwendinê û şiklê herfan de

Bi nivîsara xwe ya di »Nûdemê« de min diyar kir ka idiyêن wî yên bingehxiloxe çawa herifi ne û bi berfirehî rave kir ko guhortina herfîn kurdiyê bi yên turkiyê dê tenê zererê bide me.

Ya mayî mesela bawerî û rastbûna bi faktoran re ye.

- Digel ko teoriya kognitif iro li hemî dinyayê raser (dominant) e Celader Çeliker baweriyê pê naîne.
- Ez dibêjim ko herfa »i-yê« resmê bêjeyan xirab dike û xwendinê zehmet dike, Çeliker vajiyê wê dibêje. Li gor teoriyan »i« xwendinê zehmet dike, ya dî ceribandina di laboratowaran de ye. Min bi dirêjî argûmentên xwe nivîsandine, Çeliker dibêje »dîtina te hisî ye«. Çelikerî bêjeya »hisî« kiriye qajik û di devê xwe de dicû.
- Digel ko di prosesa xwendinê de ya mihûm bêje û parçeyên ji bêjeyan dirêjtir in, Çelikerî xwe bi werîsê herfan girê daye û xwe êxistiye zindana tîrkan. Ji ber ko di prosesa xwendinê de bêjeyen ko di hafizeya demê dirêj de kom bûyîn roleka giring dilehîzin qet feydeyê dibistanen tîrkan ji zûxwendina bi kurdî re nîne. Gava mirov tekstekê bi kurdî dixwîne mirov dikare resmê bêjeyen wê bide ber resmê bêjeyen zimanê kurdî, ne yên zimanê tîrkî. Heger di hafizeya mirovî de resmê 100 hezar bêjeyen zimanê tîrkî hebin jî feydeyê wan ji xwendina bi zimanê kurdî re nîne.

- Digel ko di standardê ISO-latîn de herfên zimanê tirkî (ğ, Ğ, ı, İ, ş, Ş) nînin û tirkan ew danîne şûna van nişandek û ligatûran (x, /, >, <, fl, fi), Çeliker dibêje di kompûtera min de derdikevin. Ew ji bîr dike ko di kompûtera wî de fontên xwisûşî ji tirkan re hatîn çekirin hene, lewra ew dikare bi wan herfan binivîse.
- Digel ko ez dibêjim heger Celadet Âlî Bedir-Xanî di mesela herfa »i« û »î-yê« de wekî tirkan bikira dê ji destûrên xwe bi dûr biketa, Çeliker dibêje no tu bendên wî xelet tefsîr dikû. Diyar e ko Çeliker hinerê dabeşkirina testekê li paragraf û komekan nizane, lewra ew nîvê komekê yê li gor dilê xwe dibijêre û nîvê herî mihûm diavêje. Wî welê li tekstra Bedir-Xanî kiriye û eynî tişt li teksta min ji kiriye. Min dûr û dirêj behsa denganiya kurdiyê û binasên wekitirkannekirinê kiriye. Çelikerî komeka dawiyê ji paragrafa min girtiye û dibêje tu hisî yî.
- Digel ko di latîniyê de »i-ya« kurt bi nişandeka kurtkirinê »breve« (˘) nişan dikin, Çeliker dibêje no.
- Digel ko »î« di standardê ISO-latîn de heye û di fransiyê de jî têt bi kar anîn, Çeliker dibêje Arif xwe dike hevalê »î-ya romaniyan.

Ji aliyê xeletencamderxistinê ve, pirtûka Çelikerî şahesereka mezin e. Heta niho min ti pirtûk wekî wê di idiyâyen xwe de bêperwa nexwendine. Ji ber, kê li kû elfabeya kurdiyê parastibe Çelikerî nêrinê wan kesan pêşûpaş kirine. Hemî teorem û premîsên mantiqê li ber idiyâyen di kitêba wî de şas û mat dibin.

Li gorî mantiqa Çelikerî premîsek û encâmekâ wiha rast e:

Premîs: Heger Celadet Âlî Bedir-Xanî gotibe »ji wan niqtan pê ve ko xasê denganiya zimanê kurdî ne, di şîkl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkan nêzîk xistin û jê nedûrketin« hingê mirov mecbûr e hemî herfên elfabeya kurdiyê bike wekî yên elfabeya tirkiyê.

Encam: Mirov mecbûr e hemî herfên elfabeya kurdiyê bike wekî yên tirkiyê.

Minaqeşeya elfabeyê bi Celadet Çelikerî re bûye wekî kesê ko mirov çiqes jê re bibêje »nêr« e, ew her bibêje »bidoşe«. Xwidê arîkarê wî be. □

Ahmet Aras:

"Evdalê Zeynikê lîrîzma kurdî gîhandiye dereceya herî bilind"

Hevpeyvin: MUSTAFA ALADAG

Ahmet Aras di sala 1944'an de hatiye dinyayê. Di sala 1970'ê de fakulteya Aekonomî qedandiye. Di salên 1965-66'an de ji ber sebebên siyasi hatiye girtin. Pişti cûntaya 12'ê adarê demekê li Swêdê maye. Aras paşê vegeriyaye Tirkiyeyê û di 12'ê ilona 1980'ê de dîsan hatiye girtin. Di gelek kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine weşandin. Destanên Kerr û Kulik û Siyamend û Xecê derxistine. Pirtûka wî ya dawî Evdalê Zeynikê ye. Me ji bo xwendevanên Nûdemê Ahmet Aras li Îzmirê dît û pê re sohbet kir.

Mustafa Aladag: *Heya niha sê pirtûkên te hatine çapkirin. Her sê jî li ser zargotinê ne. Çima zargotin?*

Ahmet Aras: Zargotina kurdî pir dewlemend e. Ez gundî bûm û jiyana min di nav wê dewlemendiyê de derbas bû. Di biçüktî de hewesa min pir li ser zargotinê hebû. Dema ku ez berefemî bûm, min ferq kir ku tu kesî bala xwe nedaye zargotina kurdî. Wê çaxê min destpêkir û lê geriyam. Ango gundîtiya min ji vî karî re bi kêt hat.

– *Her ku diçe zargotin winda dibe?*


– Erê lê... Min jî xwest heta ku ji destê min bê, zargotinên me ji windabûnê xelas bikim.

– *Tu di zargotinên kurdî de jî li ser Evdalê Zeynikê bi taybetî disekinin. Evdalê Zeynikê ji bo te çima wisa girîng e?*

– Bi rastî têkiliyên min û zargotinê bi wesita Evdalê Zeynikê destpêkir. Di biçüktî de min ji gelek dengbêjan kilamên wî guhdaî kiribû û ji gelek kesan efsaneyên wî bihîstibûn. Ji kilamên wî û stîla wî re pir hewesa min dihat. Wê çaxê kila-



Ahmet Aras



Bergê pirtûka A. Aras

mên Evdal di radyoya Yêrivanê de jî dihatin gotin. Sala ku min lise qedand, di sala 1961'ê de ez bi Evla Begê Silêman Begê re hevnas bûm. Evdal Beg wî çaxî di bûyera 55'an de li Erziromê sirgon bû û salêن wî jî 81 bûn. Ez caran diçûm dîtina wî û me xeber dida. Rojekê di nav gotinêن wî de navê Evdalê Zeynikê derbas bû. Hema wî navî bala min kışandibû û min jê pirsî bû. Min gotibû "Apo mîna ku tu bahsa na-sekî xwe dikî. Haya te ji Evdalê Zeynikê heye?" Evla Begê Gotibû:"Erê lê... Min him Evdal dît û him jî bi wî re rîwîtî kir." Li ser pirsa min Evla Begê xeberdana xwe domand û got: "Evdal hatibû mala apê min Evdilmecît Beg. Ez jî 17-18 salî bûm. Apê min ji wî hez dikir, qedrê wî digirt. Derna çûyîna wî ez li hespê xwe si-war bûbûm û me bi hev re dabû rê. Em çân û li gundekî Intabê bûbûn mîvan. Çawa ku hatina Evdalbihîstin, Gundiyân mala me tiye kiribûn û li dora Evdal kom bûbûn. Gundiyân ji wî hêvî kiribûn ku Evdal ji wan re bistirê. Salên Evdal wî çaxî nêzîkî sedî bûn, lê hîn ew li ser xwe bû, siheta wî baş bû. Evdal got: "Heyran dev ji min berdin, dengê min êdî dernayê, ez nikarim bistirêm." Gundiyân pir lava kiri-bûn û gotibûn:" Ci dibe hema bi hemdê xwe bibêje, em dixwazin dengê te bibihîzin!" "Wî ku xwe ji gundiyan xelas nekiribû, destpêkiribû, bi hemdê xwe, bi dengê nizim stra bû. Hinekî bi vî tehî stra bû, paşê hatibû eşqê, dengê xwe berdabû û kiribû qêrîn. Bi qêrîniyê re bêhna wî çikiyabû û deng di qirika wî de xitimîbû. Li

ser wê ïcar Evdal mîna zarokekî biçûk rûniştibû û bûbû kurekura wî giriyanabû. Gundî pir posîde bûbûn, pir li ber xwe ketibûn, bi wî de lava kiribûn, li ber dilê wî dabûn û ew haş kiribûn.”

Bi vê gotina Evdal Begê re, herwekî çira li ser serê min pêket, min di dilê xwe de qerar dayê ku jiyana Evdal derxim ronahiyê. Ji wê rojê şûn de êdî ez rastî kîjan dengbêjî, yan jî kîjan mirovê bi emr dihatim, min ji wan pirsa Evdal dikir. Ez li Serhedê geriyam û çûm gelek deveran. Di dawiyê de min jiyana wî derxist ronahiyê. Evdal ne ji bo min tenê, ji bo hemû kurdan girîng e. Bi hezaran dengbêj hatine û çûne. Di edebiyata kurdan ya gelêri de tu dengî mîna wî rêçek ewqas kûr li dû xwe nehiştiye. Wî tesîreke mezin li ser gel kiriye. Wî derd û kulên dilê xwe anîye ziman, ji bo perişanî û belengaziya xwe kiriye zarîn û figan. Lê wî di eyîn wextê de derd û kulên kurdan anîye ziman. Anglo qedera wî bi ya gel ve tevketiye û bûne yek.

– *Evdal kî ye? Jiyana Evdal çawa derbas bûye?*

– Evdal Memanî ye, eşîra wî jî Pazukî ye. Ela Meman berê koçer bûye. Ew ji we-latê jêr hatine û li navbera Patnos û Xelatê bi cih bûne. Malbata Evdal di zemanê kalkê wî de hatiye û li gundê Cemalvîrdî bi cih bûye. Cemalvîrdî li perê deşta Se-regolê, di quntara çiyayê Qertewinê li alîyê bakur e. Sala çêbûna Evdal ne diyar e, lê ew di serê 1800’î de li gundê Cemalverdiyê hatiye dinê. Di sala 1913’an de li gun-dê Qanciya mirî ye. Li gorî neviyê wî yê mezin Emerê zeynikê, Evdal 110 sal, li go-ra kurê neviyê wî Hecî Beşar 105 sal, li gorî kurê neviyê wî yê din Heder Berke jî Evdal 115 sal emir kirî ye.

– *Di ser jiyana Evdalê Zeynikê re nêzîkî sed sal derbas bûne, lê gel Evdalê Zeynikê ji bîra nekirî ye. Lê edetek gelê me yê nivîskî jî tuneye, yanî li ser Evdal çavkaniyeke ni-vîskî jî tune ye. Ew tiştêن Evdal ewqas bi gel daye hezkirin û ji windabûnê daye xelas-kin li gorî fikra te çî ne?*

– Li gorî gotinêwan wan kesan ku Evdal dîtine, dengê wî pir xweş û gumreh bûye. Qayde û meqamê wî jî taybetî bûne. Wî gelek bûyerên civakî û ferdî li gorî stîla xwe mîna destanan anîye ziman. Ev yek. Ya duyemîn jî jiyana wî ya efsanevî ye. Tiştêن nedîti û nebihîstî hatine serê wî. Di serî de bûye paşayê dengbêjên Kurdistanê yê herî bi nav û deng. Jiyana wî li bilindahiya çiyayêne mezin bûye, paşê ji serê çiyan ketiye binê bîra bêbinî. Çavên wî kor bûne, desteng bûye û bi zikata xelkê îdara xwe kiriye. Lê çi dibe bîra bibe, wî tucarî baweriya xwe, hêviya xwe winda ne-kiriye. Wê demê Evdal bûye dengê belengaz û bindestan. Di kilarneke xwe de Evdal wiha dibêje:

Wey kalyê wey koryê
Welle Temo lawo mirin çêtir e ji feqîrtiyê

.....
Temo lawo feqîrî ne tu çek e,
Xwedê li milê bavê te kirî ye.
Lê li milê tu mîrê camêr neke.

Temo ne kurê wî bi xwe bû. Evdal qundaxa Temo li kîleka rê dîtiye û bîriye xwedî kîriye, mezîn kîriye. Wexta çavên wî kor dîbin û feqîr dibe ew Temo ji xwe re dike sembol. Sembola bêkesiyê, belengazî û feqîriyê. Wexta Evdal kor dibe, zarokêñ gund an jî rîncberêñ gund rastî qulingekî baskşikestî têñ û wî dîbin didin Evdal. Ew, wê demê qulingê baskşikestî ji xwe re dike sembolê xilasiyê û azadiyê. Bi quling re dibe heval û bi şev û roj ji quling re kilaman dibêje. Piştî ku çavêñ wî vedi bin, baskê qulingê wî jî silamet dibe, quling difire û diçe. Mîna van gelek tiştîn balkêş in din jî di serê wî re derbas dîbin. Gelek keç û bûk dîbin evîndarêñ wî, dilê wî ji dikeve qîz û bûkan. Evdal van hemû bûyerêñ balkêş dike klamêñ xwe. Ew bûyerêñ efsanevî bi klamêñ wî li her derêñ Kurdistanê bela dîbin û ew bi wî tehri, ji aliyê gel pir tê heskirin û nayê jîbirkirin. Mîna gelek klamêñ wî yên din ku tîro jî klama wî ya "Xozanê" tê gotin, tesîreke wisa li mirov dike dil û hinavê mirovan dihelîne. Ji aliyê hostetiya edebî de jî klamêñ wî pir balkêş in. Dîsa Evdal di klameke xwe de wiha dibêje:

Min ê li diharê zozanê Silê
şalûr hatibû mîvanê Gulê
ji sibê hetanî êvarê tewtew dikir.
Bi donzdeh awazan jê re digot lebê-belê
awirê çavê vê teresê, teres bavê
fenanî topek ji topê kurd Elo paşa
Mirov deyne çiyayê qerej-daxê
Bigre bavê Birca vê Mûsilê.

Bi rastî jî horanekî wiha li tu derê dînyayê ji bîra nabe.

— Birêz Aras di xeberdanêñ me yên sexsi de te bûyera Evdalê Zeynikê di zargotina kurdî de bi girîngiya wê dû MEM û ZîNê re dinirxand. Aliyê din, di hevpeyvînek xwe de te Evdal wek Homerosê kurdan bi nav kiribû. Ev ji aliyê Yaşar Kemal ve ji hatibû gotin...

– Ez naxwazin li ser vê meselê zêde tiştekî bibêjim, lê di edebiyata kurdî de Evdal fenomenike pir girîng e. Edebiyatvanên biyani jî vê rastiyê tînin ziman. Ez bawer dikim wê di pêşerojê de pisporêne edebiyatê dê fenomena Evdal bi her awayî binir-xînin. Min hêja qala hinek tiştan kir. Xêncî wan di stranê kurdî de lîrîzmeke pir kûr heye. Bi wê stîla strana xwe Evdal lîrîzma kurdî gîhandiye derecaya helî bilind. Yaşer Kemal jî gotibû Evdalê Zeynikê “Homerosê Kurdan” e. Ev ne tiştekî çewt e. Homeros desranêñ kevin yên Yewnaniyan berhev kirine û ew gotine. Evdal jî ne tenê dengbêj bûye, ew di cînî demê de destanbêj jî bûye. Wî destanêñ kurd yên kevn li gorî qayde û meqamên xwe bi kilamkî gotiye. Îca bi meqamên Evdal re ew destanan jî alî gel de bêtir hatin hezkirin. Ji aliyê din de jî, piraniya kilamên Evdal wek destanan in.

– *Evdal bi gelek dengbêjên bi nav û deng re ketiye lecê jî?*

– Erê lê... Di nav dengbêjan de edetek wisa jî hebûye. Niha jî ew edet berdawam e. Ew kesên ku dibin dengbêj, diçin bi dengbêjên din re dikevin lecê û bi wî tehri xwe ispat dikin. Evdal jî ku dest bi dengbêjiyê dike, diçe bi gelek dengbêjan re dikeve lecê û her tim biser dikeve. Bi navê Gulê dengbêjeka Surmeli Mehmet Paşa hebûye. Gulê bi eslê xwe File (Ermenî) bûye û keçekte azip bûye. Wê heta wê çaxê jî tu dengbêjî re nav nehiştiye, di lecê de ji gişkan biriye. Wê ehd kiriye û gotiye: “Kî ku di dengbêjiyê de zora min bibe, ez ê bi wî re bizewicim”. Ew gotina Gulê çûye guhê Evdal jî. Evdal hema nedîrî bûye evîndarê Gulê, di dilê xwe de qerar da-ye, gotiye: “Ez ê herim ser, pê re têkevîm lecê û zora wê bibim”

Rojekê Evdal xeberê hildide ku Surmeli Memed Paşa û Gulê çûne Xamûrê da-wetê. Evdal ji gundê xwe bi rê dikeve, diçe wir û bi Gulê re dikeve lecê. Leca wan sê roj û sê şevan dom dike û Gulê dest li ber wî datîne, dibe: “Belê ez li ser gotina xwe me. Te zora min bir, herge ku tu bixwazî ez ê te bistînim. Lî tu li ser dînê xwe û ez li ser dînê xwe.” Evdal Gulê nastîne. Êdî çawa bûye nizanim, Evdal fikra xwe ya ewil diguherîne, dibe: “Xwedê mirazê te bi dilê te bike. Ez mîrikêkî zewicî me, tu di riya xwe de, ez di riya xwe de.”

Leca Evdal Şêx Silê jî bûyereke balkêş e. Evdal dengbêjê Surmeli Memed Paşa bûye, Şêx Silê jî dengbêjê Tahirxanê Qelenyê ye. Beg û paşayêñ wî zimanî li kide-rê, kijan dengbêjên serdest hebûne, ew birine û kirine dengbêjên xwe. Serdestiya dengbêjan ji wan re bûye rûmet, nav û serbilindî. Herkes bi serdestiya dengbêjê xwe, xwe dipesinîne. Her wusa Tahirxan û Mehmet Paşa jî bi dengbêjên xwe, xwe pesinîne û li ser wê meselê jî, ji hev re name şandine. Pişt re Evdal rabûye çûye İranê û bi Şêx Silê re ketiye lecê. Leca wan jî di dîwana Tahirxanê Qelenyê de heft roj û heft şevan dom kiriye û di dawiyê de şêx Silê li ber Evdal dest daniye.

– *Tu van tiştan mîna efsaneyen qebûl naki?*

– Na, na, ew ne efsane ne. Rast in. Lê rastiyê nedîti û nebîhistî ne. Ji ber vê yekê jî wekî efsaneyen di nav gel de belav bûne. Em bînin ser mesela korbûn û vebûna çavêن Evdal. Çavêن wî kor bûne, heft salan nedîtiye û paşê çavêن wî vebûne. Ev rast e. Di nav gel de wisa tê gotin ku piştî korbûnê Evdal ji hêla xwe re gotiye-straye, ji şêx û ewliyan rica kiriye û li ser wê, piştî heft salan çavêن wî ji nişkê ve vebûne. Ev efsane ye. Lê rastiya meselê wiha ye. Çavêن wî qatarak bûne û wê çaxê jî derfetê silametkirina qatarakê hebû ye. Ji Îranê hekîmên çavan hatine perda qataraka çavêن wî hildane, derman kirine û çavêن wî vebûne. Min ev rastiyên han ji çav-kaniyên ewle bi dest xwe xistin. Min bi şeş-heft merivên ku Evdal dîtibûn û pê re hevalî kiribûn re xeber dabû. Yek ji wan jî nebiyê wî yê mezin Emerê Zeynikê bû. Wî gellek kilamên kalkê xwe ji min re gotin. Ew bi xwe jî dengbêj bû û bi kilam û meqamê xwe ji kalkê xwe girtibû.

– *Çüyîna Evdal ya Xozanê bi Surmeli Mehmed Paşa re, ma ew jî ne bûyereke pir diramatik e?*

– Belê... Wê demê li hêla Edenê, li Xozanê turkmen li pêsiya dewleta Osmanî ketine asebünê. Dewlet leşkerekî giran dişne ser Xozanê û ji Surmeli Mehmet paşa jî alîkariyê dixwaze. Mehmed bi 400 siwarên bijarte re diçe Xozanê û Evdal bi xwe re dibe. Leşkerê Mehmed paşa ewîlî nakeve şer. Leşkerê Osmanî ku serhiladanê di-temirşne, ji turkmenan gelek kes têne kuştin û bi qasî pêncî hezaran jî têne sirgon-kirin. Wê demê nexweşiya qolerayê derdikeve, ji nêvî zêdetir leşkerê Osmanî qir dibin, ji wî çarsed siwarên Mehmed paşa jî tenê şest- heftê kes difilitin. Ev bûyerek gelek diramatik e.

– *Yên xelasbûyî yek jê jî Evdal e?*

– Erê, Evdal xelasbû ye û hetiye mala xwe. Dadaloglu hozanê Qozanoglu bûye, Evdal ji dengbêjê Surmeli Mehmed paşa bûye. Hatine himber hev. Lê haya wan ji hev tunebûye. Evdal aliye serkeftiye, lê tucarî pesnê aliye xwe nedaye. Tenê diramatîkbûyîna bûyerê anîye ziman. Hozanê Mehmet Paşa dimire.

– *Mehmed paşayê ku herdem alîkariya Evdal kiriye?*

– Çawa jiyana wî bi jiyana Mehmed paşa ve hatiye girêdan. Navê wî bi navê Mehmed paşa re, navê Mehmed paşa jî bi navê wî re hatiye gotin. Mehmed Paşa dimire, Evdal feqîr dibe, kor dibe û pir perîşan dibe.

– *Evdalê Zeynikê di hinek kilamên xwe de ji rewşa xwe ya belengaziyê gazinan dike "mirin çêtir e ji halê feqîrtiyê" dibêje. Gelek nivîskar, hozan û hunermendên kurdan di nav rewşeye xerab de ji nav me koç dikin, diçin. Berî bi çend rojan jî, Keremê kor di rewşeye xerab de mir. Eyşe Şan bêkes mir. Tu di derheqa vê mijarê de ci dibêji?*

– Ez ci bêjim. Ev jî realîta me ye. Gelê kurd wiha ye. Em ne qedrê xwe ne jî qedrê hozan, dengbêj û hunermendên xwe dizanin. Ew çîma wisa ne, ew jî tiştekî din e. Mirov ku qedrê xwe nizanibe, xelk jî qedrê mirov nizanin.

– Birêz Aras, çîma Evdal timamê kilamên xwe li ser navê Temo dibêje? Ü jî aliye din jî ji quling re kilaman dibêje?...

– Temo wisa bêkes bûye, ku ji xwe re ew kiriye sembol. Sembola bêkesiyê, sembola feqîriyê. Temo bi destê wî girtiye, û ew diyar bi diyar gerandiye. Yek ev. Yek jî qulingeki baskşikesû. Ji quling re kilaman dibêje. Quling jî di nav hemû gelên rojhilata navîn de, di edebiyatê de mîna sembolekê hatiye bikaranîn. Qulingbiharê ji beriyê têñ û ber bi bakur de diçin. Hatina qulangan mîzgîniya biharê ye, ya azadî û serbestiyê ye. Quling di ser çiyan re difirin, di ser çeman re derbas dîbin, li kû têkevin tengasiyê ji wir difirin û derdikevin firaqetiyê. Quling bi vî şeklî, ji Evdal re bûye sembola azadiya serbestiyê. Ku baskê qulîngê dişkê Evdal dibêje: "Ew jî mîna min ji refê xwe qetiyaye. Wê azadî windakiriye, baskê wê jî şikestiye, ez jî kor bûme." Wisa li ser navê qulîng kilam gotiye.

Ku Evdal kor dibe, feqîr dibe, bê qedir dibe, wê demê ew pir li ber xwe dikeve. Li ser wê rewşa xwe kilaman dibêje. Di Evdal de guherandinek çêdibe. Ew li ser bêkesî û feqîriyê dibêje. Loma Temo û qulîng ji xwe re dike sembol. Evdal bi wî karî dibe hozanê feqîran, belengazan û bêkesan. Dibe hevalê wan, dibe nûnerê wan.

– *Di pirtûka te de ji bîstî zêdetir kilamên Evdal bene. Tu ji ku dizanî ku ev kilamên Evdal in?*

– Min berê jî got, Evdal di stilekî de kilam gotiye. Di meqamekî tayberî de kilam gotiye. Ne tenê bi meqamekî lê bi çend meqaman kilam gotiye. Min li neviyê wî yê mezin guhdarî kir. Wî kilamên kalkê xwe ji min re gotin. Min di 1966'an de li wî guhdarî kir. Emerê Zeynikê. Ew kilamên ku wî digotin kilamên Evdal bûn. Yek ev. Yeke din jî di hinek kilaman de zatî navê wî derbas dibe. Di hinek kilaman de ew bi xwe di nava wan bûyeran de bûye. Mîna kilama Xozanê. Ya şerê çerkezan û kurêñ Mehmed paşa. Yek jî di hinek kilaman de navê xwe dibêje. Evdal, Evdal, Evdal im.... Mesela di kilama Hekîmo de. Yek jî ew bûyeren wê demê bûne an lê bûye şahid an jî bihîstiye li ser kilam gotiye. Mîna kilama MIHEMEDÊ ELÎ BE-GE.

– *Yanî di wan bûyeran de li wir bû ye, wisa kilam gotî ye?*

– Ne tenê ew. Mînak neviyekî wî gotiye ew kilam ya kalkê min e, yê din jî gotiye erê, min wisa ew kilam nivisiye. Pîvanêñ min ev bûn.

– *Te di 1961'ê de dest bi lêkolînê kiriye lê pirtûk di dawiya 1996'an de hate çapkirin.*

Ew xebat çima wisa dereng gihîşt xwedevanan?

— Li ser vê meselê ez roj û danekî bêjim dîsa jî têrê nake. Wê çaxa ku min dest bi légerînê kir, astengên min pir bûn. Di nav mirovên xwendevan de kes hay jî girîngiya zargotina kurdî ne bû. Gelekan jî qerfê xwe dikirin, digotin: “Tu çi ketî pey van lê lê û lo lo yan, tu ê çi ji van derxî?” Dema ku ez diçûm gundan û min ji wan re merama xwe digot, gelek ji wan şas û metel diman, digotin: “Kurmancî û nivîsandin!... Tu çawa xwe ji bo vî tişî diwestîni?”

Bi piranî jî gundi û dengbêj ditirsîyan û zanînên xwe nedigotin. Di aliye din de jî ez dibin eqîbeta dewletê de bûm û mîna firaran, herwekî bi dizî min pîrsyari dikir. Pişti derbeya leşkerî ya 1971’ê gava ez derketim derveyî welêt, ew tişîn ku heta-nî wê çaxê min berhev kiribûn, winda bûbûn û hatibûn şewitandin. Pişti 1979’an ku ez vege riya welat min careke din destpêkir û temam kir. Ancax me taze da çapkirin.

— *Dema te li ser zargotina kurdî légerîn dikirin bawer nakim di nav Întelektuelên kurdan de haya zêde kesan jê hebû?*

— Belê, wê çaxê kes ne di ferqa girîngiya zargotina kurdî de bû, a niha jî di ferqê de nîn in.

Zargotin hîmê kultura kurdî ye. Ger zargotin neyê zanîn, derfeta pêşdeçûyîna edebiyat, ziman û mîzîka kurdî jî tune. Niha him li hundir him li dervayî welêt gelek rîexistinê çandî û Înstutî hatine darnezrandin. Tu yek ji wan guh nade zargotinê. Gişk ji bo siyaseta xwe ya rojane sloganan diavêjin.

— *Di légerîna zargotina kurdî de heya niha çi astengî derketine pêsiya te?*

Astengî pir bûn. Herî pêşin insanê me bi qedrê xwe, bi qedrê kultura xwe nizanî bû. Ne di ferqa wî tişî de bû. Ev yek. Wexta min bi gundi û dengbêjan re xeber dida, wan bawer nedikirin ku tiştek bi kurdî dikare were nivîsandin. Yanî tiştekî wisa ketübû hişê insanên me.

— *Wan bawer nedikirin ku mirov dikare bi kurdî binivîsîne?*

— Na, bawer nedikirin. Kurdi mîna “ZIMANÊ CUCIKAN” dizanî bûn. Beweriya wan bi wan tune bû. Ez şas û metel mabûm. Min digot ez ê van binivîsim, ev ê lazim bibin. Ev hebûnen me yên gelek girîng in. Şas diman. Ji aliye din de jî tirs hebû.

— *Ji hêzên dewletê ditirsîyan?*

— Erê erê. Yanî ker nebûn, wek politîka dihesibandin. Ez di pirtukê de bahs dikim, gelek tişîn wisa hatin serê min. Min bi rojan rîwîtî dikir. Dengbêjîn ku min didixwestin jî min re tiştekî bibêjin. Min digot ha ez ê binivîsim. Difikirin. Wê Ehmed van binivîse, dewlet jî wê bi pêsiya me bigire. Dewletê jî bi pêsiya mi-

rov digirt. Wan nedixwestin navê wan bi navê min re were gotin. Ji her kesî re di-gotin...

– *Lê ji te re nedigotin...*

– Erê, ji min re nedigotin. Min ji Şakiroyê dengbêj re digor; were em dengê te qeyd bikin. Digot na. Paşê bi salan şunde min li Izmirê 5-6 sal berê pê re hevpeyvi-nek çêkir. Digot: “Heyran, mirov newêribû nêzîkî te bibûya.”

– *Di wê demê de li pêşîya te astêngê teknîkî hebûn?*

– Hebûn. Îmkanên min yên aborî ji tune bûn. Bi rastî perê riya min ji tune bûn. Ez ji Elaşgirê (Zêtka) li qemyonekê siwar dibûm, wê çaxê otobus ji tune bûn, diçû-me Agiriyê. Ji wir diçûme Beyazidê. Ez li hespê xwe siwar dibûm û digeriyam. Hesab bike, teyba min tune bû. Di van tiştan de teyb pir girîng e. Ez di sala 1969'an de bi Yaşar Kemal re axivîm, ji min re gotibû: “Ev kar bê teyb nabe. Ji xwe re teybekê bistîne, yan ji yek bila ji te re bistîne” Mirovên ku me jê agahdarî hilda, tes-pîtkirina wan ji pir zor bû. Tespîr dike, carna du sal şûn de dibînî. Ew ji ji te re tiş-tekî nabêje.

– *Şerîen wê çaxê an yên niha?*

– Vê gavê ji zor e. Ez niha dixwazim ji bo “DEWRÊŞE EVDİ” biçim deşta Sirû-cê, Wêranşehrê. Lê ez ditirsim. Dewlet rehetiyê nade mirovan. Min gelek kes di dewsa xwe de şandin gelek cîhan.

– Pêşveçûna teknolojiyê, xasma di warê ragihandinê de li ser zargotina kurdî çi tesîrîn pozitîv û negatif dike? Lewra em di qirnê ragihandinê de dijîn...

– Pêşdaçuyîna teknolojiyê roj bi roj zargotinê ji holê radike. Di biçûktî de min ji çîrokbêj û destanbêjan gelek çîrok û destan guhdarî kiribûn. Destanbêjan ew destanê kurdan yên kevn 3-4 şevan digotin ancax xilas dikirin. Her çîrok û destan şeş-heft şax bûn û çîrokbêjan her şevekê şaxek digotin. Ev destana KERR Û KULLIK ya ku min nivîsiye belkî ji pêncî parekî yekê destanê ye. Mirovan ji min re salix dabûn, digotin Siloyê Gulê ji Milazgirê gundê Dignugê destana KERR Û KULLIK şeş-heft şevan dibêje ancax xilas dike. Min wê çaxê 3 rojan rîwîti kir û ez çûme Dignugê. Me kir û nekir ji devê Silo kelîmeyek dernexist. Êdî ji ber softiyê bû ji tîrsa dewletê bû nizanim.

– *Lê ragihandin tiştîn pozitîv li ser zargotinê nake?*

– Dike. Em bêjin rojname, radyo û televiziyon ji bo zargotinê werine xebitandin tesîreke pozitîv dike.

– *Pirtûka Memed Uzun “Rojek ji rojên evdalê Zeynikê” li ser jiyana Evdal e. Lê di navbera pirtükên we de gelek cûdahî hene. Tu di vê mijarê de çi difikirî?*

– Ez ewqasî bêjîm: Di pirtûka Mehmet Uzun de tenê navê “Evdal” û “Zeynikê”

rast in. Ew tiştên din giş xeyalî ne. Ez ji Mehmet Uzun hez dikim, xortekî zîrek e, xwezil wî piştî pirtûka min pirtûkeke wusa binivîsanda.

– *Zargotin li Kurdistanê pir girtîng e. Zargotina kurdî pir dewlemend e. Lî li hêla Serhedê zargotin hê bêtir pêş ve çûye. Li gor te sedemên wê çi ne?*

– Belê rast e. Zargotin li Serhedê bêtir bi pêşve çûye. Gellek bûyerên dîrokî hene, li welatê jêr derbas bûne, lê ew li Serhedê bi ziman ketine. Welatê jêr ne tenê di zargotinê de, her wusa di kulturê de bi gelempêri li paş e. Li gor min sedema yeke-mîn tesîra ereban e. Tesîra ereban ne tenê li olê kiriye. Li kulturê jî kiriye. Di pîr-sek di nav gel de tê gotin: “Kê ku jê dûr e, gul û nûr e”. Ev jî ew mesele ye. Serhed ji ereban çiqas dûr e ewqas jî gul û nûr e. Hesab bike bi vê tesîre kurdan bi sed salan êrîş birine ser birayêن xwe yên yezidî, ew ji cîh û warêن wan derxistine, pine pi-neyî kirin. Wê tesîra ereban ya kevneperek li welatê jêr rewşa feodalîyê jî zexim kiriye. Feodalîzim li Serhedê jî hebû, lê ewqas zexim nebû. Yek jî li Serhedê bi her tehrî pîrrengî û pirdengî hebûye.

– *Piştî çapkirina vê pirtûka te, di çapemeniya tirkî de, di rojnameya Milliyet û Radikalê de bi te re hevpeyîn hatin çêkirin. Ev cara yekemîn e ku çapemeniya tirk (ya burjuva) ewqası li ser kultura kurdî sekînî, bi nivîskarekî kurd re hevpeyîn çêkir. Li gora te, ev ji bo çi ye?*

– Di van salêن dawî de pîrsîrêka kurdan ku bû meseleyeke navneteweyî, herkes rewşa kurdan meraq dike. Bi taybetî herkes kultura kurdan meraq dike. Êdî kes zê-de guh nade gotinê politîk. Lewra ew tê zanîn. Lî hebûnê kulturi zêde nayêن za-nîn. Ji gişka zêdetir jî tirk bi xwe dixwazin bizanibin ka di warê kulturê de ci tiştên kurdan hene. Çendekê berê li Stenbolê min bi komek rojnamevan û nîvîskarêñ tir-kan re sohbet dikir. Yekî ji wan li ser masê pirtûka KERR Û KULIK dît. Pîrsî, got, tîrkiya te jî heye? Min got, na. Camêr xwe pir aciz kir, xeyidî. Got: “Birê min hûn çîma wiha dîkin! De em bi hev re dijîn, nazîstêñ me xelkê dixapînin, dibêjin ziman û çanda kurdan tune ye. Bi vî tehrî ji problemêñ me, her ku diçin jî girantir dibin. Wan berhemê çanda kurdî wergerîne tirkî, bira xelk bixwîne, hin bê ku xwe ji to-mika nazîst û faşîstan xîlas bike. Hûn dê jî wê çaxê bibînin wê çareseriyê çêbibe.”

Camêr rast digot. Nivîskar û demokratîn tirkan her çiqas kêm bin jî, di mesela kurdî de dixwazin dengê rastiyê bîghînin guhê xelkê. Ez eleqeya çapemeniya tirk wiha şîrove dikim. □

Çend şîîr ji FERÎT EDGÜ

ji türkî: ABİDİN AZAD




Foto: Taner Şehri (ji kovara ADAM öykü)

Ferit Edgü di sala 1936'an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Wî li Stenbol û Parisê Akademiya hunerên bedew xwendîye. Ew ji sala 1977'an û vir ve direktorê Weşanxaneya ADA ye. Digel nivisandina şîîr, çîrok, roman û gelek babetên din, ew bêtir bi romana xwe *Demsalek li Hekaryayê* navdar e. Ferit Edgûyê ku hê jî li Tirkîiyeyê dijî, iro yek ji nivîskarên Tirkîiyeyê yê bijarte ye.

Bêhespî

Min jî xwest ji vir birevim. Lê nehiştin. Dawiyê de min xwe di nav ên ez bernedidam -hîn rasttir ên nikarîbûn ji vir birevin de -dit.

Niha tu, ji bo jî vir herî ji min desrûrê dixwazî?

Ger bipirsin ez ê çawa hesabê vê bidim?

Lê illa te rev xistibe serê xwe, ew cihê ye. Wê gavê ez ê jî bi te re werim. Bi vî awayî di nav me de hesabê dan û standinê namîne.

Na, hespê min tune, nikarim te bistînim terkiya xwe.

Çeka min heye, erê, lê hespê min tune.

Hespê min heba ji xwe heta îro min...

Hilşiyayî

Gundê hilşiyayî. Mirovên hatine kuştin, hesp, kûçik.

- Ma ev ji Xwedê natırsin? ez qâriyam.

Li bende mam.

Dengvedana dengê min tune.

- Vir cihekî çawa ye Xwedêyo! min bi ser ve kir

- Çi karê Xwedê li serê vî çiyayî heye? gundiyyê li ba min yê ku min navê wî nizanîbû, bersiv da. Em li vir karê xwe di nav hev de dibînin.

em bêdeng bûn.


Dû re ji dûr kûçikek reyiya

Deng

- Kî miriye? dengekî got.
- Kê kuştiye? dengekî din got.
- Çend kes mirine? dengê sisiyan got.
- Kengî ew kuştine? dengekî nenas got.
- Yê dikujin jî wê bimirin, dengekî nas got.
- Sê jî zarok, dengekî cihê got.
- Pênc jî jin, eynî dengî got.
- Em diçin ku, dengekî pîr pîrsî .
- Mîna tu nizanî nepeyive, dengekî xort got.
- Welleh nizane, dengê dawiyê got.

Ji ber ku ligel wî, ew şaxê çiyê ê ku berî çavê xwe bigire dîtibû jî mir pacâ xanî jî mir kûçikê direyiya jî mir ava kaniyê ya diherikî jî mir ew spîndarên li ber bê dihejiyan jî mirin berfa diheliya jî mir û dawî roj jî mir-

Wendakarina şevekê



ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ

Îvê şevê nêzik dibû. Reben dest pê kiribû dora-liyên xwe bide hev, fincan û xwelîdankan ji odeya daniştin û razanê bibe mitbaxê. Apartmana wî yek ji 12 apartmanên vî xaniyê nêzikî navenda bajêr bû. Heye ku baştir be mirov bi navê apartmanik behsa cîhê wî bike çimkî yeke biçûk bû, tê de tenê odayeke ji bo daniştin û razanê, nîvmitbaxek û serşokeke bi dûş hebûn. Da bêhna dûyê cixareyan ji hundir derfîne, wî deriyê balkonê ji piçekî vekir. Her çiqas ew îşev bi dîtina sê hevalên xwe dilşad bûbû jî hesteke xemê xwe di dilê wî de bi cîh kiribû. Heger kesekî di cîh de ji wî pirs kiribûya ka sedema dilxemgîniya wî ci bû, Reben dê nikaribûya bersîveke rêk û pêk bida. Bi kurtî, ramanên di serê wî de di wê bîstê de tevlihev bûbûn, tiştine di ew sê-çar saetên borîn de hatinî gotin hişen wî mijûl kiribûn. Ji ber ku ew kurd bû, bêguman e ku mijûlbûna hişen wî û nebexteweriya wî ya wê kurtekatê sedema xwe rewşa kurdan bû, kurdên li welêt û yên li bajarê ew lê. Bêyî ku karê xwe bi serî bike ew çû balkonê û cixareyek vêxist. Ba li derve sar bû û mij xwe girtibû ser bajêr. Ji ser taxê tenê dengê otomobilên her bîstekê carê derbas dibûnî dihat.

Di vê şeva destpêka biharê de Reben hewl da wek ronakbîrekî Ewropaya Navend

bi şêweyeke felsefi li xuristê binihêre, heta di hişen xwe de tevdêra lihevhanîna rê-zêni yekem yên helbestekê ji kir, helbesteke li ser dîmena li pêş çavên wî: Kîliseya bi lampayêن taybetî hatî rohnkirin, otomobilên çîravêketî yên li ser taxa şil diçûnî-di-hatinî û mirovîn destvala ji nêçirvaniya keçan, serî di ber de, ber bi malêñ xwe di-çûnî, lê rêz nedihatîn ser hev, hişen wî nedikaribûn hemî tişt û kesen di dîmenê de bigihînin hev. Ew li hundir vege riya, deftereke ji kaxezêñ spî ji ser refekî rakir, çû li paş maseyê danişt û dest bi nivîsandinê kir. Wî bi xwe ji nedizanibû ew ê çi berhemê biafirîne lê xewa wî nedihat û dilê wî nivîsandin dixwazt. Nivîsara wî wisa dest pê kir:

“Mêvan 1: Gelê kurd ji bo serxwebûnê hîn ne amade ye. Di nav kurdan de kesen ronakbîr, bi taybetî ronakbîren siyasi û rexnegir hindik in. Kesê ronakbîr pê-wîst e bi şêweyeke objektîv bikaribe li ser civata xwe, gelê xwe û rîexistinêni siyasi bi-nivîsine. Di rewşa kurdan ya îroj de va yeka herma-hema ne pêkan e. Li milê din, endamên neteweya kurd hîn hevûdin bi şêweyeke rêk û pêk nedinasin, nikarin ji hevûdin baş fêhm bikin û partiyêñ wan nikaribûne xwe û daxwazêñ xwe bikin yek. Hindek ji me bi raman û fikra xwe hîn di sedsala nozdehemîn de ne. Hinêñ din bi siyaset û bawriyêñ xwe hîn di nîvî sedsala bîstemîn de ne. Çendekêñ din di warêzanîstî û siyasetê de pêş ve çûne lê kesek li wan xwedî dernakeve,...

Mêvan 2: Tu pirt şasî. Li Kurdistanê gel serî hildaye. Ordiyêñ dijmin li ber tê-koşeran di tirs û xofê de ne. Serxwebûn nêzik bûye lê haya te ji gelê te tune. Heger hebûya te tiştêñ wisa nedigotin. Îroj li welêt bi hezaran mirov derdikevine meşane, bêyi tirs azadî û serxwebûnê dixwazine,...

Mêvan 3: Bi sloganan Kurdistan rizgar nabe. Kurdistan bêyi piştgiriya welatine cîhanê nikare rizgar bibe. Heger tew rizgar bibe ji nikare bidomîne. Ka li cîhanê di rewşa îroj de çend welat hene ku amade ne pişt Kurdistanêke serbixwe bigirin?! Welatek di rewşa cîhanê ya îroj de nikare bi serê xwe bijî. Ha binihêr çi bi Alban-yaya Hoce hat,...

Mêvan 1: Divêt em nifşen nû fêri siyaseteke kurdperweriye gelempêr bikin. Bila bi zimanê xwe bifikirin, bi zimanê xwe bixwînin, bi zimanê xwe binivîsinin û bila fêr bibin ji hevûdin fêhm bikin, bila niştimanperweriye wan di ulbîkekê de hêvan bigire da ku di pêşerojê de bikaribin bi hev re û li gel hev eyñî daxwazêñ neteweyî bikin,...

Mêvan 2: Nifşê îroj ji bo serxwebûnê amade ye lê yên wek te ji têkoşinê direvin û li rewşa gelê xwe xwedî dernakevin,...

Mazûvan: Hûn ê çayê, qehveyê, lê bîreyê vexwin?”

Bi nîvisandina rêza dawîn re, "hûnê çayê, qehweyê, lê bîreyê vexwin?" Reben bi şeweyeke esebî, wek kesekî pirr xeyidî be, pelika kaxezê ji xûşkên wê çirrand, çirçirrin kir, rabû ser xwe, çû mitabaxê û besên kaxiza hatî kujtin avêtin nav satila gemarê. Peyvîn li ser kaxezê ketin nav pelikên çayê, qalikên pîvazê û rûpelîne roj-namene bi tirkî.

Li mitbaxê wî bêhemdê xwe av berda misîn û xwazt çayêke nû çêbike lê ber ku misîn bide ser êgir bi gavêن beza vege riya ser maseya xwe û dîsa dest bi nîvisandinê kir:

"Di salona ku tê de şeveke kurdan cîh digirtî de dora sed zaro, pirraniya wan sê-mehîn ta dehsalîn, li gel mezinan beşdare ahengê bûbûn. Mêvanekî rôxistina ku şev amade kiribû axiftina xwe li paş mîkrefonê pêşkêş dikir. Ji ber ku mîvîn nuha êdî baş dizanibû ku kurd cepikan ji wan kesan re lêdixin, yên dibêjin, 'rizgarbûna Kurdistanê nêzik e,' wî di axiftina xwe de sê-çar caran gotinêni bi vê xwebêjê hanîn ser zimên. Wî herweha hêvî dikir ku belkî li dû bihîstina van gotinan yên di salonê de piçekî guh bidin axiftina wî lê îcar bi ya wî nebû. Tevî ku çend kurdan jê re li cepikan xistin jî, pirraniya yên di salonê de haya wan ji xwebêjên peyvîn mîvîn nebû. Her yekî ji wan hewl dida ku dengê xwe ji yê mîvanê li paş mîkrefonê û kesen li doraliyêن xwe bilindtir bike da ku dengê xwe bigihîne yên li gel wî daniştiñî. Li besên salonê yên cuda zarokan didan şopa hev,... Li dû ku mîvîn axiftina xwe ya bi zimanê ji bo kurdan biyanî kuta kir wî sê caran li ser hev got, bi kurdî got: 'Bijî Kûrdîstan. Bijî Kûrdîstan. Bijî Kûrdîstan.' Nuha ku beşdaran dizanibûn axiftina wî bi seri bûye, û li dû ku wan 'bijî Kûrdîstan' sê caran li ser hev bihîstin hemîyan bi heyecan ji mîvîn re dan cepikan. Heta zaro jî ji bo nîvdeqeyekê ji lîztiñ û reva xwe eware bûn û li cepikan xistin.

"Li dû mîvîn dengbêjek tev orkêstirayeke ji çar kesan derket ser sekuyê. Îcar ber-pirsiyarê teknîkê karê xwe baş bi rê ve biribû. Tenê nîvsâetek ji bo bicîhkirina mîkrefonan û eyarkirina aletên mûzîkê pêwîst bû. Li dû vê nîvsâeta tiji qirecir salon bi meqamê mûzîkeke germ û dengê dengbêj yê xweş avis bû lê zarokan dest ji rev û lîztiñ xwe bernedan. Jin û peyayêن dengê axiftina xwe li dû destpêkirina dengbêj piçekî nizimtir kiribûn dirêj nekir wan jî car din şora xwe domandin û îcar hewl dan ku dengêن xwe, ne tenê ji yê dengbêj, lê herweha ji yên aletên mûzîkê jî bilindtir bikin. Dema dor hat stirana duyemîn dora nîvî kesen beşdar, te digot qey haya wan ji hev hebû, ji şûnêن xwe rabûn û berên xwe dan avrêjê. Li dû vegera ji avrêjê, li şûna ku li sendeliyêن xwe vege riya, wan li paş salonê û li herdu aliyêن wê zo bi zo dest pê kirin siyaset û rewşa li Kurdistanê analîz bikin, yan li ser kesen din

bi xirabî biaxifin. Yê li aletên mûzîkê dixistinî serên xwe ber bi jêr daxistibûn da ku tiştên li pêş çavêن wan cîh digirtinî nebînin, lê bêhna dengbêj weqa teng bûbû ku wî stirana xwe ya duyemîn di nîvî de qurçifand, şûna xwe xweş kir, mîkrefon ber bi devê xwe kişand û dest bi stiraneke neteweyî û şoressgêrî kir. Tevî ku gotinên destpêkê li ser kujtinê, rijandina xwînê û wêrankirina welêt bûn ji mûzîka stiranê ya girtina dîlanê bû. Ji nişkan ve bi dehan kes ji cîhêن xwe bi rê ketin û bi lez xwe gîhandin pêşıya salonê. Govend şen bû û beşdaran salon ji bin ve hejandin, helbete bi lingêن xwe. Baş diyar bû ku dengbêj negihîştibû armanca xwe çîmkî li şûna ku beşdar bi encama xwebêjên peyvîn di stiranê de dilxemgîn bibin û aramî bête holê, meqamê mûzîkê yê geş ew di nav dîlaneke zîz de serxweş kiribûn. Bi ken û dilşadî ew di govenda ku nuha bûbû yeke sêrêz de dihejiyan û dizivirîn. Dengbêj dil kir biqîre û bibêje ku va stirana wî ji bo guhlêdanê bû, ne dîlanê, lê ji dest nehat. Dû re, ji ber ku zarokan kaxezêن xwaztina stiranan yek li dû ya din didan dengbêj, wî rîzêن stiranê li hev xistin. Bi encama vê yekê wî çavêن xwe qurç kirin bi hêviya ku rîzêن wenda wîne bîra xwe. Dema wî çavêن xwe vekirin wî mîkrefona xwe li ber devê xwe nedît. Zarokeke şeş-heft salîn li paş mîkrefona wî nîvşermok stirana wî digot. Dengbêj keniya, dû re giriya, rabû ser xwe û tenbûra xwe du caran li erdê xist, şikand û ji ser sehneyê wenda bû."

Li dû nîvîsandina hevoka dawîn pêñûsa di dest Reben de nema xwazt bilive. Nêxwazt bilive ji ber ku mîjîyê nîvîskêr nema dixwazt vê çîrokê bidomîne. Wî nîvîsara xwe li ser maseyê hîşt, çû avrêjê, bi niyeta ku li dû rijandina avekê biçe razê. Li vegerê, wî bêhemdê xwe xîje defterê kir, pelên bi nîvîs jê cirrandin û di destekî xwe de guvaştin ser hev. Nîvîsara wî ber ku ronahiya rojê bibîne bi destê wî bi xwe hat kujtin. Dema wî çîra vemirand û xwe li ser textê xwe ramedand hêstirine germ ji çavên wî ber bi jêr rijîyan. Li gel wê ji ew di kûraniya dilê xwe de razî bû ku wî bi xwe nîvîsara xwe kujt li şûna ku hindekên din cezayê mirinê bidin wê. Ber di xew keve wî di dilê xwe de hêvî kir ku şevêن wisa bêşûd di jiyanâ wî de ne gellek bin. □

Xewna Pîremêr

SABAH KARA

Deriyê salan vekir
kete hundur
Dest û ruwê xwe şûşt
ji toz û xweliya salan
Nanê xwe xwar
Xwe pal da dîwêr
Li jina xwe ya salan nihêrt
(Çawa civandibû vê sebrê
Mîna pisika Wanê?)
Dûxana cixarê
dorûberê wî girt
Pelikê çavên wî
çûn ser hev
Dengê şal û xelxalan
bilind bû
Dengê reqsê
Ji Elhemraya
Endilûsê

14.04.1997, Essen

Demek ji demêñ general

Mase mase bû lêbelê
General bûbû gûgirêfkek
Li ser masê

Di dema nûjen de mirov
Bûn gergedan
Beraz
Zirkêtik
Lêbelê
Gûgirêfkin kêm mabûn jê
Vaye ew jî temam bûn


General karê xwe dikir
Pîsî digerand
Li ser masê

Televizyon
Gûgirêfkan nişan dida
Berê xwe dabûn
Gundekî Kurdistanê

14. 04. 1997, Essen

SABAH KARA

Çend şîr ji FERHAD SHAKELY



Ferhad Shakely Ji Kurdistana Başûr e. Di 1951'an de hatiye dunyayê. Li Bexdâdê Üniversite temam kîriye. Nuha li Swêdê li bajarê Uppsala-ye mamostetiyê dike.

Demekê bi navê *Svensk Kurdisk Journal* (1985-1989) kovareke bi Swêdî derdixist. Her weha di navbera salêni 1985-1996'an de kovara *Mamostay Kurd* derxist.

Berhemên wî:

-Kurdistan Le Dilî Min da ye (helbest), Invandrars Förlaget, Borås/Swêd, 1985, 87 r. Kurdî (Soranî) (Lat.)

-*Nigari To Le Dîwari Zîndanekem Heldekolim* (helbest), Kulturföreningen Sverige-Kurdistan, Stockholm,

1994, r. 92 r. Kurdî (Soranî) (Ar.)

- Bonî Tarîki* (kurteçirok), Weşanên Apec, Stockholm, 1997, 123 r. Kurdî (Soranî) (Ar.)
 - Jê* (helbest), Swêd, 1985, 160 r. Kurdî (Soranî) (Ar.)
 - Şiney Koseran* (çirok bo zarakan), Prometheus Förlag, Swêd, 1986, 82 r. Kurdî (Soranî) (Ar.), (Li gel Seyid Abdullay Semedî)
 - Projey Küdetayêkî nihêni*, Bexdad, 1973
 - Rûbaretişkêk le hetawî sûrewe*, Beyrût, 1977
 - Hevraz*, Uppsala, 1981
 - Kurdish Nationalism in Mam u Zin of Ahmadi Khani*, (Ing.), Swêd, 1983
- Ü herweha gelek pirtûk jî ji zimanêni cuda wergerandiye Kurdî.

Nîgaristan

De xewnê da
Şar be şar û dê be dê
Le dûm dêy,
Wilatanim lê dekeyte şewistan.
De xewnê da
Nîgaristanêkî bêsinûr û bêkeraney,
Derawanî soma û tîşk i.
Be bêdarî
Wekû dar û dewen
Wéraneşarî wêlbûnim
Şararayışt dekey.

ê be dê: gund bi gund / le dûm dêy: li dû min têy / bêkerane: bêqerax, bê rex / derawan: ava ku dinje
ciyeki / soma: ronîya çavan / tîşk: ronî, ronahî / be bêdarî: bi hişyarî, (raneketin) / dewen: sinc / wêl-
bûn: winda bûn, riya xwe wenda kirin / şararayışt dekey: tu bajêr dixemilîni

Hawraz

Bangit dekem,
Deng le gerûma
Hawarî minareyekî kon e, delerêtewe.
Eme nirkey ziryanî dûrît e
Salgarim dekate zistan û keweroj...
Hajey şabalî peydabûnit
Zewînêk le berpêma radexar;
pan û por.
Lem temistaney nakesî da
Meger her dengim le kewşenî
Tenhayîm birwate der.

Le dirzî bêkesîmewe
Çawîm birîwete şineşinî seraperdey
razxaneket.
Arezûyekî bêreng delawênmewe,
Minitim hawraz.

le gerûma: di gewriya min de / delerêtewe: diheje, dilerize / nirke: dengê bayê xurt / ziryan: bahoz /

dûrît: dûriya te / salgar: salan / keweroj: ewraxî, ewrayî / haje: dengê avê, bayê / şabal: balêñ mezin, baskêñ mezin / pan û port: pan û fire / temistan: / mijistan, welatê mijê / kewşen: herêm, navçe / ten-hayim: tenêtîya min / dirz: derz / şineşin: hereketa bayê / razxane: nihêñxane, nependîxane / dela-wênmewe: dil radigrim / minitim hawraz: ez hevsirrê te me

Kêwî dil

Kêwî dilim

Be tişkî aşnayît roşnkewe,

Dil û giyan

Dekeme berdebazî rêgeket.

Way, ke bêtoyî ci salanêkî şewezeng e,

Wey ke şarı giyan,

Bê yadî to,

Çi gorê, ci goristanêkî bêdeng e.

kêw: çiya / aşna: nas, yê ku tê nasîn / roşnkewe: ronîbike / berdebaz: buhurk, bor / şewezeng: şeva reş û tarî

Yadit

Yadit wek gewalehewrêkî sipî

Be asmanî tarîkî dilma radebûrê,

Regekanim, yek be yek,

Le şepolî guławê serşar debin.

gewalehewr: perçê ewr / dilma: di dilê min de / regekanim: rehên min / şepol: pêl / serşar bûn: tijî bûn

Şewger

Em diley şewgerî min

Le tişkî rojê degeçê,

Em sere babirdeye, rengnenas e

Gül debînê

Rengî sûr dadegerê.

babirde: babirî, yê ku bayê birî

Girê

Xanimêkî guldemî, çawpîrozeyî
Le pirsey xoy, le gwê gorî serwetakî xoya
Dadenîşê,
Girêy dilekey le lay kê bikatewe,
Çî bika be dest
Barî xem û mergesatewe?

Hezar sal e,
Hezaran sal e
Be girî ewînê desûtê,
Razenihênekey temenî be kê bilê!

girê: girêk / guldem: devgul / serwetak: servekîrî / mergesat: sekrat

(Hemû şîir ji »Nîgarî To Le Diwari Zîndanekem Heldekolim«, 1994, hatine girtin)

Amadekar û tîpguhêzî: **M. Lewendî**

"Êş mirov dide fikirandin, xwedîfikirbûn mirov zana dike, bi zanebûnê mirov dikare tehamûla jiyanê bike" *

KOSTAS LAXAS

Ev xortê bi edeb, bi salan, min ew di cîhên pêşangehan de, di salonên civînên hunerî û festivalên ciwanan yên partîyan û xwepêşandanê politiki de didit. Her wisa ew, di her meha nîsanê de, di çalakîyên ji bo salvegera qirkirina ermenîyan û yên di gulanê de ji bo bîranîna pondîyan de cîhê xwe digirt. Gelek caran di van aktivîteyan de çavêن me bi hev diket. Ev xortê han, her gav ji bo min wek mirovekî nas û xwedî berpirsiyari bû. Ew digel xwegihandin û pêşdebirina xwe ya zanyarî û hunerî, wek bajarvanekî, bi bûyerên girîng yên piştî tevgera Jon Tirkân û şerîn Balkanê, ku di navbera salên 1912- 13'an de li herêma giştî ya jeopolitîkî qewimî bû, eleqedar dibû.

Min ew naskir bêî ku ez wî zanibim.

Her wisa bê lez û bez, ji dûr ve û bi dilgiranî, bi vî xortî re, meyleke nêzîkbûnê ya ji bo dostanîyê di nav me de peyda bû. Heta wê roja ku me rûbirû dîtinêن xwe ji hev re eşkere kiribû, gelek hîsîn me yên di derheqên hev de ji wext re mabûn. Lê êdî em behsa daxwaz û evîna xwe ya hevbeş, li ser huner û cîyêن meslekî, tiştêن ku di zanîngehê de têن xwendin kar û xebatêن min: Galeriya "KOXLÎAS" ku di dest-pêkê de, li wê derê, li zemîna kuça Mîtropolîtu İosif 24 li qûncika Tsîmîskî û li paş ji, Navenda Çandî ya Vellîdîo, dema ku ev xortê penaber yên bê cîh û war êdî bûbû xwedî kar li beşa Wêne û Hunerên Pratîk a Akademîya Hunerên beşa zanîngeha Salanîkê.

Ez behsa hevalê xwe yên heskirî, resamê kurd, Serhed, dikim. Ew ê ku bi zanebûn xwest bibe hemwelatiyê Yewnan, ew ê ku ji alîyê saziyêن dewleta tîrkan ve hate qewitandin. Ew ê ku di binya bîst salîya xwe de, di sala 1984'an de, derbasî Yewnanîstanê bûbû û wek penaberekî politîk xwe sipartibû bajarekî mîvanperwer: Salanîka

ku ji xwe herdem warê penaber û nefşyan bû.

Ez hewcedarî bi dayîna van agahdarîyên di derheqê kok û nijada, rewsa jîyan û rîya ku Serhad daye ber xwe, dibînim; ji ber ku ez bawer dikim ev yeka han, tesîrek xurt li ser huner û berhemên wî kirîye. Ji aliyekî ve jî, bêyi ku bikeve nav dafika şaxê folklorî yên sivik, têkiliyên xwe bi kanîya hêjayîyên xwe yên destpêkê re xwirt dike.

Ez divê li vir bibêjîm ku ji ber têkiliyên me yên pîralî, yên însanî, politîkî û hunerî, ez her gav li himberî Serhad xwedî nîyetekê pozitîf bûm. Ev hizra min her berdewam e. Her wekî ku tê zanîn, ez ne dîrokvan û ne jî rexnegirê hunerê me. Her ci tiştên ku ez li ser wêneyên wî dibêjîm, encama van têkiliyên me yên dosta-nîyê ne. Wek gotinên ji dil, ji aliyê hunermendekî wek wî, ku ew bi xwe jî di nava deryaya pirsgirêkên hunerê a hevdem de dimeşe.

Mijara sereke ya hunera Serhad, ku niha wêne û grafikên xwe li Navenda çandî ya Beledîya Stavrûpolis a Salanîkê pêşkêş dike, herwekî li ber çavan e jî, mirov in. Belê rast e, ji nuh ve avakirin, ji nuh ve şîrovekirina li gora estetîk û daxwazên hunermend. Divê bê gotin ku, gava ku Serhad rismê rûyê mirovan çêdiike, bêyi ku bîlezîne, war û nijada van mirovan jî derdixe holê. Her wisa jî, dema ku rismê manzereyê çê dike, urf û adeta mirovên li cih û warên xwe runiştî dertê holê. Ger kêm caran wêneyên wî bêyi figurên mirovan bin jî, ez di wê bawerîyê de me ku mirov, bi hizra Serhad ya berhemî û politîkî ve hişk girêdayîye. Ji ber vê yekê, her ci hunerê Serhad e, bi hîmê xwe yê exlaqî bi rastîya jiyanê, têkoşerî û dîrokê ve girêdayîye. Her wiha ew, wek şîroveyekî tevahî yê çand û hêjahîyên cuda bi xwe re tîne. Çewa ku bîranîna tevahî ya gelekî wek gelê kurd şîdyaye û nayê perçê kirin, di nav sedsalen dûr û dirêj de bi rik, adet û kevneşopên xwe parastîye, stranên gelêri yên anomîm û qabiliyetên hunerî yên ferdî, di hemû warên ifadekirina hunerî de, ci ferdî, ci gelêri xwe afirandî ye.

Serhad, wek wêneker û grafiker, xwedîyê armanc û rastîyeke xwerû ye. Di berhemên wî de, raste rast, rikîtiya jiyanê û mirovên ku bi nijada xwe serbilind in, hene. Bi daxwaza xwe, di wext û salên xérnexwaz de, di kemînê de disekinin û bêdengîyeke zelal di rûyên hemwelatiyên wî de û di karekterê jiyanâ wan de tê xwiya kirin. Çawa ku van faziletên mirovacî yên kevnare, yên welatî, bi berhemên ji destê wî dertên, bi ifadeya ferdî ya qabiliyeta hunera wî, xwirtir dibe û derbasî me dibe.

Na, Serhad ne wênekarekî muhafezekar e. Li cem wî agahîyên herheqê bazara hunerî a navnetewî ya hevdem kêm nîne. Lîbelê qet nebe ji bo niha, ez bawer dikim ku ew dê hêza xwe ya hunerî biparêze û xwedi bike; da bi qabiliyeta xwe ya

hunerî mil bide xwestinê têkoşerî yên hemwelatîyên xwe yên ji bo wenatekî ser-bixwe. Ji dûr ve be ji, bi hunerê xwe vê têkoşînê teşwîq bike.

Di navbera sal û deman de rê û şopa jiyana neteweyî ya gelekî an bi rastî ji di berhemên çandî de tê neqîşandin, nexwe bêşik Serhad, endamekî neveqetandî yê hizra tevahî yê gelê kurd e. Bêyi ku qet ew warê ku lê hatîye dinyayê ji bîra bike. Li wir, li bakurê Kurdistanê, li Terwanê ev xortê hêja wek yek ji donzdeh zarokên malbata xwe ya bi bereket, di sala 1964'an de cara pêşîn ronahîya jiyana xwe dît. Li gel war guhertina mecbûrî û penaberî ku di salên din de hatin serê wî, da ku karibe ji Salanîkê xewnê welatê xwe yê dûr bibîne û têkoşînê zehmet yên hemwelatîyên wî li vir, li Yewnanîstanê dilê wî germ bike.

Rahîma jiyanê cîyê ku eslê te ji wê derê ye: Kurdistan.

Ez hesûdiya te dikim Serhad, ku tu xewn û daxwazên xwe bi ser bedena çanda herdu gelan ve girêdidî, wek yewnanan û kurdan.

Ji ber vê yekê, sernivîsa vê rexna xwe pêşkêşî te dikim, ku wek dilopêن pak yên jiyanê ji gelên dûr yên Rojhilata jor tê. “Êş mirov dide fikrandin, xwedîfikirbûn mirov zana dike, bi zanebûnê mirov dikare tehamula jiyanê bike”

Tu van tiştan hemûyî dizanî, tu li ser van bûyî şareza, ji ber ku te ev hemû di canê xwe de hîs kir. □

**Ji berhema tiyatro ya Jhon Patrik "Heyva Tebaxê"*

**Kostas Laxas, nivîskar û wêneçêkerekî yunanî ye.

Serhad Bapîr: "Kurd dikarin bi hunerê jiyana xwe ya hisî û ruhî xurttir bikin"

Serhad di sala 1964'an de li Tetwanê, li bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê. Ew di sala 1984'an de ji welêt koçber dibe û li Yunanistanê bi cih dibe. Li Yunanistanê, di navbera salên 1987-1992'an de, li unîversiteya Aristoteles beşa resim û hunerên pratik dixwîne. Serhadê ku niha li Salonikê mamostetiya resim dike, beşdarî gelek pêşangehan büye. Pêşangeha wî ya dawi, îsal (1997) li Salonikê çebû. Me ji hem bi hinceta pêşangehê, hem ji bi armanca danasına Serhad û tabloyen wî, pê re sohbet kir û herweha em di dawiya vê hevpeyvînê de kataloga wî diweşînin.

Nûdem: Te kengî dest bi çêkirina resim kir? Ya ku tu ber bi cîhana resim ve kişand çi bû?

Serhad: Ji biçûktiya xwe de meyleke min li ser resim hebû. Tê bîra min di 7-8 saliya xwe de, dema ku ez diçüm dibistanê, min ji dersa resimê gelek hez dikir. Li gor xwe min resim çêdikir. Herdu kekêن min ên mezin dema ku dibistana navîn û lîsey dixwendin, carcaran resimên baş çêdikirin. Min li wan dinêri, bala xwe dida wan û ji xwe re resim çêdikir.

Mîna malbateke feqîr, ji bo standina pêñûsên rengîn û boyaxan ewqas îmkanêni me tune bûn. Ci dikete destê me, me bi wan ji xwe re resim çêdikir. Bavê min çêkirina resim wek tiştekî beredayî dihesiband, bi me re hêrs dibû û ji me dixwest da em zêdetir bala xwe bidin dersên xwe. Di salên din de êdî min li gor îmkanêni xwe zêdetir bi pêñûs û bi boyaxêni erzan resim çêdikir.

Li Tetwanê dor salên 1976-77'an de çend resamên kurd hebûn. Wan digel resamtiyê, tabloyen dikanan ji bi herfîn xweşik çêdikirin. Cara pêşîn min li wê derê, ew tabloyen resim dîtin. Ew resimên Yılmaz Güney, resimên gund û gundiyan kurdan bûn.

Dema wek penaber ez derketim derveyî welêt û ez ketim Akademiya Bilind a Hunerên Baş, hêdî bi hêdî, sistematîk û metodîk ez bi resim mijûl bûm.

– *Ji bo te resim ci ye? Ci maneyê dide jiyana te?*

– Mirov dikare bibêje ku, resim wek huner, şîrovekirina jiyanê ye. Hunermend bi boyaxan an ji bi hacetêni din xwe ifade dike, hîsên xwe yên li ser tiştan yan ji bû-yeran tîne ziman. Çawa ku helbestvanek; şérîn û xweşî, nexweşî û xerabî herwisa



Serhad Bapir

dijitî û rikitiya jiyanê bi gotin û hevokên zimanekî dixwaze bihone û birêse, şrove bike û helbesta xwe derîne holê; resamek jî vî karê han bi kornir, hibir û bi boyaxan çêdike. Wênekar (resam) li gora xwe, bi realist yan jî ne bi realistî û bi awayekî din wext û dorhêla ku ew bi xwe jî tê de dijî şrove dike. Ev nayê wê maneyê ku hingî ku hunermend bi babetên dervayî van tiştan re jî mijil nabin. Rast e, gelek celebêن resaman hene. Dema mirov li dîroka resim û hunerê dinere; mirov bi dehan tevgerên ji hev cûda dibîne. Ev tevger, bi taybetî di sedsal me de, carna xwedî manifesto bûne. Wan ekol û tevgerên ha bi awayê ku resim çêdikirin û avadikirin, li bûyerên civakê û dîrokê dinêrin; di nav xwe de têkilî û cûdayetiyêن wan hebûn.

Îca ji bo mirov ji resim fêm bike, divê hinek zanebûna mirov li ser resim û dîroka wê hebe. Lê hezkirina ji resim ne karekî ewqas zehmet e. Kesêن ku haya wan ji dîroka hunerê tunene jî, karin bi vî yan jî bi wî awayî hej ji resim bikin, rahijin tabloyekê û bi dîwarên xwe ve daleqşinîn. Hunermend bi çêkirina resiman: dixwaze li gor xwe bi awayekî bersiva pirsgirêkên civara xwe û pirsgirêkên ku ew bi xwe jî pê mijûl dibe bide. Ji bo wênekarekî kurd ev tişt hîn girîngtit e. Ji bo wî pirs li gel xwe gihadina xwe ya zanyarı, xwirt û geşkirina jiyana manewî ya netewa wî ye. Wêne wek beşek huner û çandê rolekî di vî warî de dileyize. Jiyana manewî ya gelekî di huner û di kultura wî gelî de tê xwiyakirin. Hunermend wexta wêneyan çê-

dike; hîsên xwe yên li ser tiştan bi zanebûna hunerî dixemilîne û berhem derdixe holê. Ji bo me kurdan resim ne ewqas hunerekî kevn e (ku em berhemên winda yên kurdên kevnare daynin alikî). Dînê îslamê rê nedaye çêkirina rismê însanan û herwiha navê pût li berhemên heykelî kirîye. Heykel û resim hatine perçekirin, xerakirin û qedexekirin. Ez dibêjîm; minyatûrên ku hene ji, gelên rojhilat çêkirine. Îslamê tenê motifên diakozmetik bi pêşve biriye û ev ji zêdetir li mizgeft û medresan de bi kar anîye. Hêvidar im ku zana û ronekbîrên kurd wê karibin; heykel, minyatur û berhemên din, ku bi destê kurdên kevnar hatine çêkirin, yan ji ji aliye hinekî din ji bo kurdên kevnar hatine çêkirin di nav muze û koleksiyonên dewletan de tespît bikin û derînin ronahiya rojê.

Ku em iro motîv û rengên xalî û xalîcan, mîmariya qesr û avayiyêن kurdan û heykelên ku ji bela misilmanan û ji desdirêjiya dewletên dagirkir filitîne deynin alikî; tiştêkî din ji bav û kalêن me ji bo resamê me nema ye. Muzîkvanêن kurd dikarin pişta xwe bidin ser deryaya muzîka gelêri û kevneşopiya kurdî. Ji bo helbestvan û romannîvîsêن me ji berhemên şairêن me yên klasîk hene ku ew dikarin li ser edebiyateke nuh biafirînin. Lê resamê kurd sêwî ne. Ew mecbûr in bêî ku wek gelên Ewropa û yên deverên din pişta xwe bidin berhemên nîşen berê; divê ew bi xwe rîyan li ber xwe vekin û bimeşin.

Mirov dikare bêje ku pir pir ev 50 sal in ku kurd li gor îmkanêن xwe bi resim mijûl dibin. Kurd iro zêdetir hewcedariya wan bi hunerê, herwisa bi resimê heye. Bi riya hunerê karin jiyanâ xwe ya hîsi û ruhî xwirt bikin û dîsa karin bi riya hunerê, xwe bi gelên dînyayê bidin naskirin û hezkirin. Ji helbestvan û romannîvîsekî kurd bi kurdî nivîsin tê xwestin. Ji bo resamekî kurd ne wisa ye. Bi kîjan babeta resim mijûl dibe bila bibe, ci resim dike bila bike, dema ku bêje; "ez resamekî kurd im" nasnama xwe eşkere dike. Ji aliye din de huner hewa û ba dixwaze da nefesê bistîne, serbestiyê dixwaze, divê di nav çarçovêن hişk yên ideolojiyêن partiyêن kurdan deNEYE fetisandin. Kes divê dîrektifan nede hunermend. Hunermed baştır bi karênen xwe dizanin û ci dixwazin dê wê çê bikin. Yek wê resimên realist, yên êş, birîn û berxwedanê çêbike, yên din wê bibe abstîre û yekî din ji dibe bi awayê surrealîstî resimên xwe çêbike. Xweska resamên me yên navdar hebûna ku hunerhezêن dînyayê ew naskiribûna û serê me ji bi berhemên wan bilind bûbûya.

- *Tu dikarî bahsa hunera xwe û metoda çêkirina resmên xwe bikî?*
- Ez bi gelek cûreyêن resim re mijûl bûme. Di warê teknîki de, ez bi boyaxêن bi rûn, aqueralla, komir, hibra çînî û yên din wêneyêن xwe çedikim. Wek tema ez bêtir figurêن mirovan, manzereyêن sirûstê yên gund û bajaran û tiştê din çedikim. Herwisa ez grafikan ji çê dikim. Grafîk wek heykeltîraşî beşekî hunerê tê pejiran-

din. Rewşa gel li welatê me tesîrek mezin li hunerê min kiriye. Herçiqas têkiliyên wêne û grafikên min bi realîzmê re hene ji, lê naturalist in. Bi gotineke din, neji-bergirtin lê qopikirina tiştan e, şirovekirin û ji nuh de avakirina tiştan e.

Ez bawer dikim ku girafik ji bo kurdan tiştekî nuh e. Ez grafikên xwe li ser texte (dar), li ser darê sinayî (yasenî yên din) û li ser lînolîom (sentetik e) dikolim. Çekirina wan wisa ye: Pêşî mirov li ser textekî bi pênûsê resmê tiştekî çedike, paşê bi hinêk karêن taybetî, cihêن ku divê spî bimînin, dikole, diqewêre an go kûr dike. resimê ku hatiye çekirin, êdî wek muhreke bilind tê xwiyakirin. Dûvre bageranekî plastik ê hişk tîne û bi hibra çapxanê di ser re dibim û tînim. Heta ew cihê bilind baş bihibir bibe. Cihê ku hatiye kûrkirin, bi hibrê nabe. Paşê mirov xatekê radike (ya baştır kaxiza japonî ku bi dest tê çekirin) hinekî nerm datîne ser darê bi hibir û bi pişta kevçiyê çayê wê kaxiza ha bêyî bileqîne, hîdî hêdî di dewisîne, heta ku ew hibra ku li ser darê ye, baş derbasî ser kaxizê bibe. Berhemê grafik ne yê li ser darê, lê ev tiştê ku li ser kaxizê hatiye çankirin e. Grafik bi çend tengan be divê ewqas dar bêن kolandin û li pey hev li ser eynî kaxizê werin çapkirin. Girafiker dikare deh- bîst û zêdetir car vê grafika xwe çap bike. Paşê ji li binê heryekî 1/10 an ji 1/20 an û zêdetir dînivîsîne û îmza xwe diavêjiyê. Grafik ne mîna resiman e, ji eynî berhemê zêdetir kes dikarin li ba wan hebin. İca grafikên bi asit ji bi awakî din têن çêkirin, van li ser metal (sifir, çînko, tûnc uhw) têن kolandin. Mirov asîta nîtrik bi kar tîne û di dawiyê de ji di piresa destan de tê çapkirin.

– *Jiyana surgunê ci tesîr li hunera te kiriye?*

– Çawa ku min berê ji got, bi tevahî rewşa welêt tesîr li hunera min kiriye. Ez zêdetir ji bo kurdan resim çedikim. Ev nayê vê maneyê ku hunerhezên ji gelên din ji hunerên min fam nakin. Huner îtro tiştekî navneteweyî ye. Lî dîsa ji, ji hunerê her gelî bêhna kultur û dîroka wî gelî tê û divê jê bê ji. Divê pêşî tiştekî neteweyî hebe da ku paşê bi yên netewên din re bide û bistîne û bibe navneteweyî. Rast e, di warê resim de ji îtro bi riya dezgehêن agahdarî haya mirov ji hemû tiştan çedibe û bivê nevê tişt li mirov tesîr dikin. Lî em divê ji bîr nekin ku “her dar li ser koka xwe şîn dibe”

Jiyana surgunê jiyaneke kambax e. Xewn û xeyalêن min ji li ser Kurdistanê diçin û têن. Hezkirin û evîna xwe ya ji bo jin û mîrêن serbilind û herwiha nerazîbûna xwe ya ji bo rewşa Kurdistanê ez bi riya resimên xwe tînim ziman.

Rast e, realîzma Kurdistanê di warê resim de ji mirov ber bi resimên realist û sembolîk de dikşîne. Xweska realîzma xerab ya Kurdistanê were guhertin û êdî resim ji, hunermend û nivîskarêن me ji bi her beş û babetê huner û edebiyatê re têne bi pîvana estetik û kalîteyê mijûl bibin. □

Kataloga SERHAD BAPÎR

Pêvek

Ji dawiyê de, rûpel 7-30

Kataloga SERHAD BAPÎR

Pêvek

Ji dawiyê de, rûpel 7-30



Γυναίκα σε χωριό που θα καταστραφεί, 1994, ξυλογραφία 36X17,5 εκ.

Jina li nav gundê ku ê were wêrankirin, grafikê li ser dar, 36X17,5 cm.



Χωρικός 1, 1989, ξυλογραφία 28X21 εκ.

Gundî 1, 1989, graffîkê liser dar 28X21 cm.



Οικογένεια, 1991, έγχρωμη ξυλογραφία 43,5X16,5 εκ.

Malbat, 1991. grafikē rengin liser dar 43,5X16,5 cm.



Υπηρέτης, 1992, έγχρωμο λινόλιον 20,5X24,5 εκ.

Xulam, 1992, grafikê rengîn liser lînolîom 20,5X24,5 cm.



Ταπείνωση 1, 1992, έγχρωμο, λινόλιουμ 28,5X25,5 εκ.

Tadeyî 1, 1992, grafîkê rengîn liser lînolîom 28,5X25,5 cm.




Ταπείνωση 2, 1992, χάραξη σε γιασενίτι 26X30,5 εκ.

Tadeyî 2, 1992, grafikê liser darê yasenît 26X30,5 cm.



Πάνω: Ταπείνωση 3, 1991, χάραξη σε γιασενίτι 14,5X32,5 εκ.
Li jor: Tatevî 3, 1991, grafikê rengîn lisér yasenît 14,5X32,5 cm.

Κάτω: Χελέπτσε, 1991, έγχρωμη ξυλογραφία 21X30,5 εκ.
Li jér: Helebçə, 1991, grafikê rengîn li ser dar 21X30,5 cm.




Παράπονο, 1994, χάραξη σε γιασενίτι 31X21 εκ.

Gazind, 1994, grafikê rengîn liser yasenît 31X21 cm.



Επίκληση, 1994, χάραξη σε γιασενίτι 31X21 εκ.

Daxwaz, 1994, grafîkê rengîn liser yasenît 31X21 cm.



Η Σοσίν, 1994, έγχρωμη ξυλογραφία 35X32,5 εκ.

Sosin, 1994, grafikê rengîn liser dar 35X32,5 cm.



Μορφή, 1991, έγχρωμη ξυλογραφία 29X29 εκ.

Suret, 1991, grafikê rengîn liser dar 29X29 cm.



Γυναίκα 1, 1990, έγχρωμη ξυλογραφία 31X19 εκ.

Jin 1, 1990, grafîkê rengîn liser dar 31X19 cm.




Η Σαλίχε, 1989, έγχρωμη ξυλογραφία 25,5X16 εκ.

Salîhe, 1989, grafikē rengin liser dar 25,5X16 cm.



Γερόντισσα, 1994, χάραξη σε γιασενίτι 20X12 εκ.

Jinika pîr, 1994, grafikê rengîn liser yasenît 20X12 cm.



Νίκη, 1994, χάραξη σε γιασενίτι 26X20 εκ.

Serketin, 1994, grafîkê rengîn liser yasenît 26X20 cm.



Χωρικός 2, 1989, λινόλιουμ, επιζωγραφισμένο 23X17 εκ.

Gundī 2, 1989, grafikē liser līnolīom, 23X17 cm.



Η Ζοζάν και Χεζάλ, 1996, έγχρωμη ξυλογραφία 18X11 εκ.

Zozan û Xezal, 1996, grafîkê rengîn liser dar 18X11 cm.





Μάνα και παιδί, 1994, χάραξη σε γιασενίτι 20X12 εκ.

Dê û zaruk, 1994, grafikê rengîn liser yasenit 20x12 cm.



Κραυγή 1, 1989, λινόλιον 30X16,5 εκ.

Hewar 1, 1989, grafikê rengîn li ser lînolîom 30X16,5 cm.



Πάνω: Χελέππτσε, 1989, έγχρωμο λινόλιουμ 12,5X22 εκ.

Li jor: Helebçe, 1989, grafikê rengîn liser lînolîom 12,5X22 cm.


Κάτω: Ισμαΐλ Μπεσίκτσι 1990, λινόλιουμ 14X21 εκ.

Li jêr: İsmail Beşikçi, 1990, grafikê liser lînolîom 14X21 cm.



Γυναίκα 2, 1991 λινόλιουμ 22,5X17,5 εκ.

Jin 2, 1991, grafikē liser linoljum 22,5X17,5 cm.



Κραυγή 2, 1990, ξυλογραφία 24X16 εκ.

Hewar 2, 1990, grafikē liser dar 24X16 cm.



Γυναίκα 3, 1991, λινόλιον, 24X21 εκ.

Jin 3, 1991, kolandina liser linoliom 24X21 cm.



Μάνα και παιδιά, 1989, οξυγραφία 18X18 εκ.

Dê û zaruk, 1989, grafikê bi asît 18X18 cm.

Kovareke nû

kovara huneri, çandî û siyasi ya kurdêñ anatoliya navîn

bîrmebûn

Bihar / Havîn 1997

Aksaray Kürtleri

Tevn/Tesî

Orta Anadolu

Kürtlerinde hali sanatu

Belge

Sefki Aşiretinin

Iskan öyküsü

Orta Anadolu

Alevilerinde,

Kürtçe Ayet ve Beyitler

Edetêñ Zewac / Dawatê

Yarenî / Henek

Horasan Kürtleri

2



Ji aliye kurdêñ Anatoliya Navîn kovara Bîrmebûnê wek kovara huneri, çandî û lêkolînî derdikeve. Hejmara 2'an, bi mijarêñ balkêş hatîye dagirtin. Ji navnişanêñ jêrin hûn dikarin Bîrmebûnê peyda bikin.

Navnişan:

Li Almanyayê

Karl str. 2, 35576 WZ

Deutschland

Telefaks: +49 6441-52 615

Li Swêdê

Apec

Box 3318, 163 03 Spånga-Sverige

Telefaks: + 46 8 761 24 90

Ji şivan û gavanan heta mîrê mîran divêt kurd bizanin
ku birayên hev in; ji da û babekî çêbûne. Xûna wan
yek, namûsa wan yek, teesiba wan yek e, jiyan û mirina
wan yek e.

Îhsan Nûrî (Ronahî, 1945)

Kuro eyb e, şerm e, fehît e. An hînî zimanê xwe bi-
bin, an mebêjin em kurd in. Bê ziman kurdîtî ji we
re ne tu rûmet e, ji me re rûreşîke giran e.

Celadet Alî Bedir-Xan (Hawar, 1941)

Miletekî dîl ko zimanê xwe winda nekiriye, wek
girtiyek e ko mifta zindana xwe bi xwe re hilaniye.
Zimanê me gelek kevn e, zimanekî dewlemend, spehî û
fireh e. Lê em zimanê xwe rind nizanin. Me ew hêj nas
nekiriye. Berî her tiştî divêt em hînê zimanê xwe bibin
da ko bikarin wî nas bikin û bidin naskirin.

Kamiran Alî Bedir-Xan (Hawar, 1932)